



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artuklûyê
Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ YÊN KURMANCÎ YÊN DEVOKA TORÊ

Sinan GÜLTEKİN

15711013

Şêwirmend

Doç. Alkr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn/2019

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artuklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ YÊN
KURMANCÎ YÊN DEVOKA TORÊ**

Sinan GÜLTEKİN

15711013

Şêwirmend

Doç. Alkr. Mustafa ASLAN

Mêrdîn/2019

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Hevokên Temamker ên Berkarî yên Kurmancî yên Devoka Torê**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

31/01/2019

Sinan GÜLTEKİN



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

TOR AĞZININ KURMANCI NESNE GÖREVİNDEKİ YAN CÜMLECİKLERİ

Sinan GÜLTEKİN

15711013

Danışman

Yard. Doç. Mustafa ASLAN

Mardin/2019

KABUL VE ONAY

Sinan GÜLTEKİN tarafından hazırlanan “Hevokên Temamker ên Berkarî Yên Kurmancî Yên Devoka Torê” adındaki çalışma 01/03/2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

[İmza]



[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

[İmza]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

[İmza]



[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

Dr. Öğr. Üyesi. Mustafa ASLAN

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLEER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ YÊN KURMANCÎ YÊN DEVOKA TORÊ

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 77 sayfalık kısmına ilişkin 21/05/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından *TURNITIN* adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak bulunmuş olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dâhil % 1

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimeden daha az örtüşme içeren metin baskımları hariç açıklamalar

Açıklamalar: Mardin Artuklu Üniversitesi *TURNITIN* adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Sinan Gültekin

Öğrenci No: 15711013

Programı: Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Statüsü: Yüksek Lisans

22.05.2019


Tarih ve İmza



Danışman Onayı

Dr.öpr. Üyesi Mustafa ASLAN


A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK


PÊŞGOTIN

Mijara vê xebatê hevokên temamker ên berkarî yê kurmancî yê devoka Torê ne. Hevokên temamker hêmaneke girîng a rêzimana kurmancî ne. Hevokên temamker ên berkarî weke hêmaneke risteyê ye. Him ji aliyê wateyê ve him jî ji aliyê binyadê ve risteye temam dike. Xebatên derbareyê vê mijarê de kêmtir in. Nemaze xebatên ku bi hûrgilî li ser taybetiyên devokî radiwestin kêmtir in. Her ku di warê rêzimanî de xebatên nûjen û zanistî divên, hêj bi dilrehetî yek nikare bibêje xebatên pir û birêkûpêk li ser dezgeha rêzimina kurmancî hene. Lewma valahiyek di vê qadê de heye. Bi armanca ku ev valahî, hinekî be jî, bê dagirtin ev xebata ku bi nêrîneke nûjen li ser mijarê disekine hate amadekirin.

Di vê xebatê de cure, wate, binyad û entegrasyona (biyekbûn) hevokên temamker ên berkarî yê devoka Torê hat nirxandin. Nemaze ev xebat li ser bikaranîna hevokên temamker ên berkarî yê devoka Torê hat amadekirin û mînakên ji xebatên sahayî hatin wergirtin. Xebatên Talmy Givon ên li ser sîntaksê (hevoksazî) û gotarên derbareyê vê mijarê de bûne kereste û çavkaniyên bingehîn. Ji bilî van çavkaniyan, xebatên ku li ser devoka Torê ji bo mastir (lisansa bilind) û doktorayê hatine amadekirin bûne çavkaniyên girîng bo vê lêkolînê. Armanca vê xebatê analîzkirineke nûjen û berfireh a li ser hevokên temamker ên berkarî yê devoka Torê ye.

Di vê lêkolînê de destpêkek û sê beş hene. Di destpêkê de pêşî xebat hatiye danasîn. Nav, sînor, armanc, girîngî, rêbaz, kereste, çavkanî, dijarî û beşên xebatê hatine danasîn. Piştî agahiyên danasînê, li ser agahî û taybetmendiyên herêm û devoka Torê hatiye rawestîn. Piştî danasîna devokê, cureyên riste û hevokên temamker hatine pêşkêşkirin. Di dawiya vê beşê de jî li ser hin têgihên girîng ên ku di xebatê de gelek caran dûbare dibin hatiye rawestîn û ev têgih bi pênase û mînakan hatine ravekirin.

Di beşa yekem de cureyên lêkerên ku dikarin hevokên temamker ên berkarî bistînin hatine analîzkirin. Li gor cureyên van lêkeran, mînak hatine dayin û cûdahiyên van lêkeran hatine tesbîtkirin.

Di beşa duyem de li ser hevokên temamker ên berkarî û entegrasyona (biyekbûn) wan a morfolojîk (şêwezanî) û hev-referantiya (hev-nimînende) wan hatiye rawestîn.

Hevokên temamker ên berkarî bi awayên cûda rawe û qertafan distînîn û li gorî vê cûdahiyê di entegrasyon (biyekbûn) û hev-referantiyê (hev-nimînende) de jî taybetiyên ne-wekhev darîçav dibin.

Di beşa sêyem de lêkerên ku dikarin hevokên temamker ên berkarî bistînin û entegrasyona (biyekbûn) wan a sîmantîk (wateyî) hatine danasîn. Di vê beşê de bêtir li ser mijarên weke kontrol, serkeftin, niyet, hev-demî, hev-referantî (hev-nimînendeyî), temas (têkilî), cureyên vegotinê, tercîh û hwd. hatiye rawestîn. Di beşa encamê de gelek şîrove û tehlîl hatine rêzkirin. Ev şîrove û tehlîl encamên ravekirina hevok û mînakên in.

Ez hêvîdar im ciwanên kurd dê bêtir xebatan bikin, dîsa hêvîdar im ew ê xebatên baştir û serkeftîtir derkevin ser dezgeha rêzimana kurdî/kurmancî. Ji bo alikariya Mamoste Mustafa ASLAN spasdar im. Herwiha keda Mamoste Mikail BÛLBÛL di vê lêkolînê de zehf e, lewma spasdarê cenabê wî me. Ji bo mînakên ku di xebatê de hatine bikaranîn ez spasdarê heval, xwişk, bira û xwendekarên xwe me.

Sinan GÛLTEKÎN

Mêrdîn/2019

KURTE

Di vê xebatê de hevokên temamker ên berkarî yên devoka Torê, wate, entegrasyon (biyekbûn) û cureyên wan hatiye vekolan. Bi awayekî hûrgilî rewşên hevokên temamker ên berkarî yên devoka Torê, bi mînakên meydanî û bi nêrîneke ezmûnî hatine ravekirin. Di beşa yekem de bi taybetî lêkerên ku dikarin hevokên temamker ên berkarî bigirin hatine ravekirin. Li ser sê cur lêker hatiye rawestî û ev sê cure lêker ev in: lêkerên modal, lêkerên pêhisîn-pêzanîn-vegotinê (PPV) û lêkerên manîpûlatîf (dançêker). Ev cure lêker li gorî taybetiyên xwe bi hevokên temamker ên berkarî re tîbî bikaranîn. Di beşa duyem de jî ji aliyê entegrasyona morfolojîk (biyekbûna binyadî) ve hevokên temamker ên berkarî hatine lêkolîn. Hevokên temamker ên berkarî ji aliyê morfolojiyê (şêwezanî) ve dibin sê beş: hevokên temamker ên berkarî yên subjontîf (raweya daxwazî, subjunctive), hevokên temamker ên berkarî yên îndîkatîf (raweyên pêşker) û hevokên temamker ên berkarî yên navdêrandî (nominalized). Li gorî bikaranîna di risteyê de hevokên temamker ên berkarî yên subjontîf pirtir girêdayî hevoka bingehîn in. Bi piranî bi lêkerên modal û manîpûlatîf re tîbî bikaranîn. Hevokên temamker ên berkarî yên îndîkatîf pirtir weke hevokên serbixwe dikarin tevbigerin, lewma li gorî yên subjontîf serbesttir in. Hevokên temamker ên berkarî yên îndîkatîf bi lêkerên PPVyê (pêhisîn-pêzanîn-vegotin) re tîbî bikaranîn. Hevokên temamker ên berkarî yên navdêrandî yên ku herî kêmtîbî bikaranîn in. Pirtir weke navdêran tevdigerin û qertafên navdêrî digirin.

Di beşa sêyem de li ser entegrasyona sîmantîk (biyekbûna wateyî) a hevokên temamker ên berkarî hatiye rawestî. Li ser mijarên weke hev-referantî, serkeftin, niyet, kontrola karayî, temas, hev-demî, cureyên vegotinê, ketina bikeran hatiye vekolan. Lêkerên ku dikarin hevokên temamker ên berkarî bistînin (modal, PPV, manîpûlatîf) û hevokên temamker ên berkarî yên ku bi wan re tîbî bikaranîn beş bi beş hatine vegotin. Pirtir ji aliyê wate û entegrasyonê ve cûdahî û hevbeşiyên hevokên temamker ên berkarî hatine eşkerekirin.

Bêjeyên Sereke: Riste, hevokên temamker ên berkarî, lêkerên modal/PPV/manîpûlatîf/ entegrasyona morfolojîk, entegrasyona sîmantîk, devoka Torê.

ÖZET

Bu çalışmada nesne olarak kullanılan yan cümlecikler, anlamları, entegrasyonu ve çeşitleri araştırılmıştır. Nesne görevinde kullanılan yan cümlelerin kullanımları, Tur-Abidin ağzına özgü örneklerle, ayrıntılı bir şekilde ve deneysel bir bakış açısıyla analiz edilmiştir. Birinci bölümde, nesne görevinde kullanılan yan cümleleri alabilen fiiller incelenmiştir. Üç çeşit fiil üzerinde durulmuştur: modal fiiller, duyuşsal-bilişsel-aktarımsal fiiller ve manipulatif fiiller. Bu tür fiiller, kendi özelliklerine göre nesne olarak kullanılan farklı yan cümle türleriyle beraber kullanılır. İkinci bölümde ise morfolojik açıdan nesne olarak kullanılan yan cümlelerin entegrasyonu araştırılmıştır. Nesne olarak kullanılan yan cümleler morfolojik açıdan üçe ayrılır: subjunktif yan cümleler, indikatif yan cümleler ve adlaşmış yan cümleler. Cümledeki kullanımına bakıldığında subjunktif yan cümlelerin diğer nesne olarak kullanılan yan cümlelere göre temel cümleye daha çok bağlı olduğu fark edilmektedir. Nesne olarak kullanılan subjunktif yan cümleler daha çok modal ve manipulatif fiillerle kullanılır. Nesne olarak kullanılan indikatif yan cümleler, daha özgür ve bağımsız cümleler gibi hareket etmektedir. Bu yüzden indikatif olan yan cümleler subjunktif olanlara göre daha bağımsız davranmaktadır. İndikatif yan cümleler duyuşsal-bilişsel-aktarımsal fiiller ile kullanılır. Nesne olarak kullanılan ad-eylem yan cümleler ise daha az kullanılmaktadır. Ad-eylem olan yan cümleler daha çok isim gibi görünmektedir ve isim eklerini alır.

Üçüncü bölümde, nesne olarak kullanılan yan cümlelerin semantik entegrasyonu (anlamsal bütünlüğü) üzerinde durulmuştur. Hem-referanslık, başarı, niyet, öznenin kontrolü, temas, hem-zemanlık, aktarım çeşitleri, öznelerin düşmesi gibi konular incelenmiştir. Nesne olarak kullanılan yan cümleleri alabilen fiiller (modal, manipulatif, duyuşsal-bilişsel-aktarımsal) ve aldıkları yan cümleler bölüm bölüm anlatılmıştır. Daha çok nesne olarak kullanılan yan cümlelerin anlam ve entegrasyon açısından farklılık ve benzerlikleri tespit edilmiştir.

Anahtar Kelimeler : cümle, nesne olarak kullanılan yan cümle, modal/manipulatif/dyuşsal-bilişsel-aktarımsal fiiller, morfolojik entegrasyon, semantik entegrasyon, Tur-Abidin ağzı.

ABSTRACT

In this study, the complement clauses, and the meaning, kinds and integration of them are analyzed. The complement clauses, their usages, and typological perspective are analyzed with details, by giving the examples of Tor-Abidin dialect. In the first chapter, especially, verbs that can take complement clauses are studied. There are three kinds of verbs that can take complement clauses: modal verbs, PCU verbs, and manipulative verbs. These kinds of verbs are used with complement clauses according to their features.

In the second chapter, the morphological integration of complement clauses is analyzed. According to morphological features, complement clauses are divided into three sections: subjunctive complement clauses, indicative complement clauses, and nominalized complement clauses. The integration of subjunctive complement clauses with main clause is stronger than other's. Subjunctive complement clauses are used with modal and manipulative verbs. On the other hand, indicative complement clauses behave like independent clauses. Therefore they are more free than subjunctive complement clauses. Indicative complement clauses are used with PCU verbs. Nominalized complement clauses are the least common complement clauses in regard to their usage. Generally, they behave like nouns and take nominal affixes.

In the third chapter the semantical integration of complement clauses is examined. The subjects like co-referentiality, success, intend, agentive control, contact, co-temporality, utterance types, co-deletion are discussed. The verbs that can take complement clauses (modal, PCU, manipulative verbs) are examined section by section. Mostly, complement clauses, their differences and similarities according to their meaning and integration is presented.

Key Words: Clause, complement clauses, modal/PCU/manipulative verbs, morphological integration, semantical integration, Tor-Abidin dialect.

KURTEBÊJE Û SÎMBOL

*	: nerêzimanî (ungrammatical)
Bin.	: bingihanek
c.	: cild (volume)
ç.	: çap
ed.	: edîtor
h.g.	: heman gotar
h.b.	: heman berhem
HEV. TEM.	: hevokên temamker
hwd.	: her weku din
jim.	: jimarek
no.	: nomber
PCU	: Perceptin Cognition Utterances
pp.	: paper
PPV	: pêhisîn, pêzanîn, vegotin (perception, cognition, utterance)
r.	: rûpel
s.	: sal
vol.	: volume
wer.	: werger (translator)

NAVEROK

PÊŞGOTIN.....	I
KURTE.....	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
KURTEBÊJE Û SÎMBOL.....	VI
NAVEROK.....	VII
DESTPÊK.....	1
1. Metodolojî.....	1
1.1. Mijar û Sînorê Xebatê.....	2
1.2. Armanc û Girîngiya Xebatê.....	2
1.3. Rêbaza Lêkolînê.....	3
1.4. Materyal û Keresteyên Xebatê.....	4
1.5. Dijwariyên Xebatê.....	4
1.6. Çavkaniyên Xebatê.....	4
2. Bingeh û Têgihên Xebatê.....	5
2.1. Devoka Torê.....	5
2.1.1. Cihê Devoka Torê di Kurmancî de.....	7
2.1.2. Taybetmendiyên Rêzimanî yên Devoka Torê.....	7
2.1.3. Xebatên ku li ser Devoka Torê Hatine Amadekirin.....	9
2.2. Cureyên Riste û Hevoka.....	11
2.2.1. Risteyên Aloy ku bi Hevokên Temamker ên Berkarî Ava Dibin.....	12
2.2.2. Risteyên Aloy ên ku Hevokên Temamker ên Berkarî Distînin.....	15
2.3. Hin Têgihên Girîng.....	16
2.3.1. Cînavên Kesî.....	16
2.3.2. Ergatîfî.....	16
2.3.3. Lêkerên Dariştî.....	17

2.3.4. Lêkerên Têper û yên Netêper.....	17
2.3.5. Rolên Rêzimanî (Grammatical Roles).....	17
2.3.5.1. Pêveber.....	17
2.3.5.2. Biker.....	18
2.3.5.3. Berkar.....	18
2.3.6. Rolên Wateyî (Semantic Roles).....	18
2.3.6.1. Kara (Agent).....	18
2.3.6.2. Bandorgir (Patient).....	19
2.3.6.3. Datîf (Dative).....	19
BEŞA YEKÊ.....	20
1. CUREYÊN LÊKERÊN KU HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ DISTÎNIN..	20
1.1. Lêkerên Modal (Modal Verbs).....	20
1.1.1. Helwesta Modal (Modal Attitude).....	23
1.1.1.1. Helwesta Modal a Erênî.....	23
1.1.1.2. Helwesta Modal a Neyînî.....	23
1.1.2. Xuyang (Aspectuality).....	23
1.1.2.1. Destpêkirin.....	25
1.1.2.2. Domdarî.....	25
1.1.2.3. Biserketin.....	25
1.1.2.4. Qedandin.....	26
1.1.2.5. Biserneketin.....	26
1.2. Lêkerên Pêhisîn-Pêzanîn-Vegotinê (Lêkerên “PPV”yê, PCU Verbs).....	27
1.2.1. Lêkerên Pêhisînê (Perception Verbs).....	28
1.2.1.1. Pêhisîna Rasterast.....	29
1.2.1.2. Pêhisîna Nerasterast.....	29
1.2.2. Lêkerên Pêzanînê (Cognition Verbs).....	30
1.2.3. Lêkerên Vegotinê (Utterance Verbs).....	32
1.2.3.1. Veguhastina Rasterast.....	32
1.2.3.2. Veguhastina Nerasterast.....	33
1.2.4. Lêkerên Faktîf.....	34
1.2.4.1. Lêkerên Faktîf ên Erênî.....	34

1.2.4.2. Lêkerên Faktîf ên Neyînî.....	35
1.2.5. Lêkerên Nefaktîf.....	35
1.2.5.1. Lêkerên Nefaktîf ên Erênî.....	36
1.2.5.2. Lêkerên Nefaktîf ên Neyînî.....	36
1.2.6. Lêkerên Epîstemîk (Epistemic Verbs).....	36
1.2.7. Lêkerên Deontîk (Deontic Verbs).....	37
1.3. Lêkerên Manîpûlatîf (Manipulative Verbs).....	37
1.3.1. Manîpûlasyona Serkeftî.....	39
1.3.2. Astengkirina Serkeftî.....	40
1.3.3. Manîpûlasyona Teşebûsî.....	40
1.3.4. Astengkirina Teşebûsî.....	40
BEŞA DIDUYAN.....	43
2. BIYEKBÛNA BINYADÎ DI HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ DE.....	43
2.1. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Raweya Daxwazî (Subjunctive).....	43
2.1.1. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Subjunctive û Lêkerên Modal.....	44
2.1.2. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Subjunctive û Lêkerên Manîpûlatîf.....	45
2.1.3. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Subjunctive û Ketina Qerfata <i>bi-yê</i>	46
2.2. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Raweyên Pêşkerî (Indicative).....	47
2.2.1. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Raweyên Pêşkerî û Hev-Referantî.....	48
2.3. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Navdêrandî (Nominalized).....	48
BEŞA SISÊYAN.....	50
3. BIYEKBÛNA WATEYÎ YA HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ.....	50
3.1. Biyekbûna Wateyî ya Hevokên Temamker yên Manîpûlatîf.....	50
3.1.1. Manîpûlasyona Serkeftî û Neytkirî.....	51
3.1.2. Hev-Demî û Serkeftin.....	51
3.1.3. Serkeftin û Kontrola Karayî.....	52
3.1.4. Niyet û Kontrola Karayî.....	53

3.1.5. Kontrola Karayî û Entegrasyona Demkî.....	54
3.1.6 .Temasa Rasterast û Entegrasyona Mekan-Demkî.....	55
3.1.7. Temasa Rasterast û Serkeftin.....	55
3.1.8. Tirûş, Çewisandin û Serkeftin.....	56
3.1.9. Axaftina Manîpûlatîf.....	57
3.2. Biyekbûna Wateyî ya Hevokên Temamker yê PPVyê.....	58
3.2.1. Tercîhkirin û Rasteqînî.....	58
3.2.2. Pêzanîn û Vegotin.....	59
3.2.3. Vegotina Rasterast û Ya Nerasterast.....	60
3.2.4. Sedemiya Serkeftî û Hev-Demî.....	61
3.2.5. Entegrasyona Referantî.....	61
3.3. Biyekbûna Wateyî ya Hevokên Temamker yê Modal.....	62
3.3.1. Lihevkirina Referantî û Entegrasyona Bûyerê.....	62
3.3.2. Serkeftîn û Sernekeftin.....	63
3.3.3. Niyet û Serkeftin.....	64
3.3.4. Banekî, Zanîn, Çawa û Hev-Referantî.....	65
3.3.5. Ketina Bikeran û Hevokên Temamker ên Berkarî.....	66
ENCAM.....	68
ÇAVKANÎ.....	72
PÊVEK: FERHENGOK.....	76

DESTPÊK

Xebata amedebûyî, weke mijar li ser hevokên temamker ên berkarî yê devoka Torê, entegrasyon û cureyên wan disekine. Di nav xebatên kurdî yê rêzimanî de lêkolînên sîntaksî (hevoksazî) û herêmî hindik in. Herwiha bi tevahî xebatên rêzimanî yê kurdî kê in. Ji ber van sedeman me xwest ku di warê rêzimana kurdî û taybetmendiyên herêmî de xebateke taybet bê amadekirin. Ji bo vê armancê me li çavkaniyên ku li ser vê mijar û herêmê hatine amadekirin nihêrt. Me gelek mînakên xwe ji çavkanî û axaftinên herêmî wergirtin. Bi vê xebatê me hewl da ku ev valahiya rêzimanî ji holê bê rakirin. Bi taybetî, hin pirsên girîng ji vê lêkolînê re bûne bingeş: Gelo hevokên temamker ên berkarî çi ne? Çi cure lêker hevokên temamker ên berkarî distînin? Morfolojiya (şêwezanî) hevokên temamker ên berkarî çawa ye? Çi cûdahî di navbera cureyên hevokên temamker ên berkarî de hene? Entegrasyon û wateya hevokên temamker ên berkarî li gorî kîjan şert û mercan diguhere? Bikaranîna hevokên kurdî/kurmancî li gorî axaftina herêmî diguhere an naguhere? Helbet, bikaranîna ziman û axaftina rojane li gorî herêmê diguhere. Di vê xebatê de jî em ê bibînin ku hin guhertinên herêmî hene. Lê, bi rastî, guhertineke mezin û cihê tune ye. Hin taybetmendiyên herêmî di axaftinan de der têne holê, jixwe em di xebatê de li ser van cihêwaziyan radiwestin. Herwiha, qadeke wilo ji aliyê xebatên sîntaksî (hevoksazî) û herêmî ve vala, bi xebateke bi vî rengî, hindik jî be, ew ê bê dagirtin.

1. Metodoloji

Di vê binbeşa destpêkê de em ê li ser azîniyên xebatê bisekinin. Azîniyên weke analîtîk (tehlîlî), empîrîk (ezmûnî), çavdêrî û deskriptîf (pênasîner) di vê xebatê de hatine bikaranîn. Ev azînî di berhevkirin û ravekirinên mînakên de hatine bikaranîn. Herwiha di bin vê binbeşê de me behsa mijar û sînorê xebatê kiriye. Mijara xebatê hevokên temamker ên berkarî yê devoka Torê ye. Ev mijar bi devoka Torê ve hatiye sînorkirin. Ji ber ku ev mijar bi qasî ku em dizanin nehatiye lêkolîn, valahiyek heye di vî warê de. Armanca ev e ku bi vê xebatê em vê valahiyê têk bibin. Lewma ev xebat û mijara xebatê girîng in. Ji bo vê xebatê du çavkanî û jêderkên sereke hene: Yek jê jêderkên herêmî ne. Ev jêderk metnên sahayî û çavdêriyên şexsî ne. Çavkaniyên herî girîng xebatên ku li ser hevoksaziyê disekin in û mijara me eleqeder dikin xebata Talmy Givon a bi navê *Syntaxê* (Hevoksazî) ye û yê din jî gotar û tezên lisansa bilind û doktorayê ne ku ji aliyê lêkolînerên kurd ve hatine amadekirin in. Di

warê mînak û tehlîlan de me sûd ji van xebatan wergirt. Di amadekirin û lêkolîna vê xebatê de me hin zehmetî jî kişandin. Zehmetiya herî mezin kêmbûna çavkaniyan bû. Çavkaniyên ku bingeha xebatê bûn pirtir bi zimanê biyanî ne. Lewma sûdwergirtina ji wan zehmet bû. Lê dîsa jî heta ku ji destê me hat, me hewl da ku xebateke birêkûpêk pêk bînin.

1.1. Mijar û Sînorê Xebatê

Ji aliyê pratîk ve, xebata amadebûyî li ser hevokên temamker ên berkarî yên devoka Torê, biyekbûn (integration, entegrasyon) û bikaranîna wan disekine. Her çend hevokên temamker curbicur dikarin bîn hejmartin jî di vê vekolînê de du cur hevokên temamker hatine qebûl kirin. Yek jê hevoka temamker a bend û ya din jî hevoka temamker a berkarî ye. Hevokên temamker ên bend ji aliyê wateyê ve risteyê temam dikin. Lê ji aliyê sîntaksî (hevoksazî) û rêzimanî ve bikaranîna wan bi hevoka bingehîn re ne pêwîst e. Lê hevoka temamker a berkarî ne wilo tevdigere. Beravajiyê hevoka temamker a bend, hevoka temamker a berkarî hevoka bingehîn him ji aliyê wateyê ve him jî ji aliyê sîntaksî (hevoksazî) û rêzimanî ve temam dike. Ango hêmaneke pêwîst e ku divê bi hevoka bingehîn re bê bikaranîn. Gava ku neyê bikaranîn riste kêr dimîne û dibe negramatîk e. Xebat piştî ku cûdahiyê dixê navbera van her dû cure hevokan, bala xwe dide hevokên temamker ên berkarî.

Xebat ji aliyê mijar û herêmê ve hatiye sînorkirin. Xebat li ser mijareke sîntaksî (hevoksazî) disekine. Mijara xebatê ya bingehîn hevokên temamker e. Lê her hevok, xebatê eleqeder nake. Xebat li ser hevokên temamker ên berkarî û cureyên wan radiweste. Ji aliyê mijarê ve sînorê xebatê ev e. Herwiha ji aliyê ziman ve jî xebat hatiye sînorkirin. Xebat bi dîyalekta jorîn a kurdî û devoka Torê ve hatiye sînorkirin. Di vê xebatê de weke mijar taybetmendî û bikaranîna hevokên temamker ên berkarî yên devoka Torê hatiye hilbijartin.

1.2. Armanç û Girîngiya Xebatê

Di vê lêkolînê de, mijareke sîntaktîk (hevoksazî) li gorî taybetmendiyan devokî hatiye lêkolîn. Me xwest xebateke ku bi hûrgilî li ser sîntaksa (hevoksazî) herêmî raweste bê amadekirin. Herwiha li ser taybetmendiyan devokî hatiye rawestîn. Armanca vê lêkolînê ew e ku bi riya vê xebatê û bi nêrîneke rêzimanî û berfireh hevokên temamker ên berkarî yên devoka Torê, entegrasyon û cureyên wan bi awayekî baldarî bê analîzkirin û hêmanên ku

bandorê li cûdahiya bikaranîn û entegrasyona (biyekbûn) wan dikin bîn tesbîtkirin. Di pêvajoya lêkolînên xwe de me dît ku di warê sîntaksî (hevoksazî) de valahiyeke mezin heye di rêzimana kurmancî de. Ango mirov dikare bibêje ku xebatên rasterast li ser hevokên temamker ên berkarî yên devoka Torê, cure û entegrasyona wan disekinin tune ne. Bi qasî ku em dizanin heta niha di asta zanistî de ti lêkolînên ku rasterast li ser vê mijarê disekinin tune ne.

Di vê lêkolînê de bi awayeke hûrgilî li ser hevokên temamker ên berkarî yên devoka Torê hatiye rawestîn. Di xebatê de him taybetmendiyên sîmantîkî (wateyî) him morfolojîk (şewêzanî) him jî sîntaktîk (hevoksazî) hatine şîrovekirin. Zimanzanên biyanî, li ser kurdî hin lêkolîn kirine, xebatên wan bi zimanên biyanî ne. Ango di vê qada rêzimana kurdî de xebatên ku bi zimanê kurdî ne, kêm in. Lê, lêkolîna me li ser rêzimana kurdî ye û bi kurdî ye. Ji ber vê yekê, mijar û analîzkirina vê lêkolînê girîng e. Ji ber van sedeman gava ku em li xebat, mijar û devoka hilbijartî dinêrin em dikarin bibêjin ku lêkolîneke girîng hatiye amadekirin.

1.3. Rêbaza Lêkolînê

Ev xebat, bi rêbazeke analîtîk (tehlîlî) hatiye amadekirin. Xebatên analîtîk (tehlîlî) mînak û agahiyan analîz û şîrove dikin. Di xebata me de jî gelek mînak û bikaranîn hatine mûqayesekirin û analîzkirin. Herwiha ev xebat bi şeweyeke empîrîk (ezmûnî) hatiye amadekirin. Di xebatên empîrîk (ezmûnî) de mînak tîrî çavdêrîkirin û ji wan çavdêriyan hin encam tîrî derxistin. Ji ber vê, mînakên xebatê, bi çavdêrî û qeydkirinê hatine berhevkirin. Tehlîl û rave li ser van mînan hatine pêşkêşkirin û di dawiyê de jî lêkolîneke empîrîk (ezmûnî) derketiye holê. Em dikarin bibêjin ku ev lêkolîn, ji rêbaza deskriptîf (pênasîner) jî sîd wergirtiye. Xebatên deskriptîf (pênasîner) gelek qayde û agahiyan pêşkêş dikin.

Di vê xebatê de jî qayde û agahiyên derbareyê sîntaksa (hevoksazî) kurmancî de pêşî hatine pêşkêşkirin dûv re hatine analîzkirin. Mînakên ku tehlîlbûne ji hevokên herêmî pêk tîrî. Hemû mînak bi çavdêrî û qeydkirinê hatine berhevkirin. Zimanê vê xebatê kurmanciya standart e ku li bakurê welat tîrî bikaranîn, lê mînakên ku hatine dayîn li gorî axaftina devoka Torê ne û ji axêverên vê devokê hatine wergirtin.

1.4. Materyal û Keresteyên Xebatê

Di lêkolînê de keresteyên devokî ji du jêderkên sereke ne. Yek jê çavdêrî û notên şexsî ne. Me ji bo xebatê gelek mînak û nîşe wergirtin. Piranîya van çavdêrîyan ji çend salên mamostetiya ku me li herêma Torê kir pêk hatin û ji vê xebatê re bûne nîşeyên girîng. Mînakên devokî ji axaftina rojane hatine wergirtin. Ev mînak hin ji wan nivîskî ne, hin ji wan devkî ne. Me ev mînak, ji ber nivîs û axaftinê qeydkirine.

Jêderka duyem jî metnên xebatên sahayî ne. Gelek ji van xebatên sahayî ji ber berhevkirina dengên hatine nivîsîn. Ev xebatên sahayî, bi piranî çîrok in û ji bo projeyên lîsansa bilind hatine berhevkirin. Weke ku ji jêderka jî xwuya ye, mînakên me mînakên devokî ne.

1.5. Dijwariyên Xebatê

Weke tê zanîn ji ber bandor û polîtîkayên siyasî lêkolîna bi kurdî û li ser zimanê kurdî zehmet e. Lêkolînerên ku li ser kurdî xebatan dikin vê zehmetiyê didin ber çavên xwe. Ev zehmetiya herî pêşî ye. Zehmetiyeke din kêmbûna çavkanî, kereste û materyalên kurdî ye. Xebatên kurdî yê rêzimanî kêmtir in. Gava ku yek lêkolînan bike divê kêmtir zêde bi zimanên biyanî jî bizane.

Çavkaniyên ku me ji wan îstîfade kiriye bi piranî biyanî ne û xwendina wan helbet zehmettir e. Çend çavkanî û lêkolînên kurdî hebin jî bi gelemperî şêwe û rêbaza wan heman e. Lewma afirandîna û amadekirina lêkolîneke cûda muşkil e. Çavkanî û kevneşopî di warê lêkolînê de hêj ne birêkûpêk in û kêmtir in. Ji ber van sedeman lêkolîna li ser zimanê kurdî/kurmancî him dijwar e him jî dibe ku yek şaşîtiyan bike.

1.6. Çavkaniyên Xebatê

Di vê xebatê de ji ber ku nêrîneke tehlîlî û fonksîyonel (kargîni) weke bingeh hatiye qebûl kirin, di serî de ji xebata Talmy Givon a bi navê *Syntax: An Introduction* (Sîntaks: Destpêkek) ku ji dû cildan pêk tê sîd hatiye wergirtin. Ji xeynê vê xebatê jî ji gelek çavkaniyên din sîd hatiye wergirtin. Piranîya van çavkanîyan gotar, projeyên lîsansa bilind a bêtez û tezên lîsansa bilind û doktorayê ne. Weke mînak teza Mikail Bilbil a bi navê *Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan Di Devoka Mêrdînê De* gelekî feyz jê hat girtin. Di xebatê

de Bilbil him behsa devoka Torê him jî behsa hevokên tamamker dike. Lewma teza wî mijara me eleqeder dike û ji bo vê lokînê gelekî bû alîkar.

Piranîya metnên meydanî ku mînak ji wan hatine girtin jî ji ber dengên arşîvkirî hatine nivîsîn û loma jî dema metin û dengan hevdû negirtine, dengên arşîvkirî referans hatine qebûlkin. Mînakên ku referansên wan nehatine dîyarkirin hemû, yên kes û xwendekarên ku axêverên devoka Torê ne. Ango mînak ji devê axêverên herêmê hatine girtin.

2. Bingeh û Têgihên Xebatê

Di vê binbeşê de pêşî em ê devok û herêma Torê bidin nasin. Piştî vê, taybetmendiya rêzimanî yên devoka Torê ew ê bîna ravekin. Herwiha xebatên ku li ser vê devokê hatine amadekirin ew ê bîna danasîn. Piştî agahiyên di derbareyê devoka Torê de hatine dayin, di vê binbeşê de têgih û termen rêzimanî yên ku ji bo xebata me girîng in ew ê bîna danasîn. Bi vê danasîna mijara bingehîna dê baştir bê fêmkirin. Di dewama vê beşê de em ê li ser cureyên hevok û risteyan rawestin. Ji aliyê tîplojiyê (curezanî) ve riste û hevok ew ê bîna danasîn. Piştî re jî têgihên girîng ên ku di xebatê de hatine bikaranîn ew ê bîna nasandin. Em ê pêşî bi taybetmendiya devoka Torê dest pê bikin.


2.1. Devoka Torê

Ji bo navê Torê anga *Tur-Abidin* du rîwayet hene. Rîwayeta yekem ev e: Peyva *Turê* bi erebî û siryanî “Çiya” ye. *Abid* jî ew kesê ku di riya Xwedê de ye û ibadetê jê re dike. Ji ber ku gelek ol û bawerî li vê herêmê hebûne jê re gotine *Tur’ul-Abidin* yanî “Çiyayê Abidan” (Tan 2011: 100). Rîwayeta duyem jî ev e: Di zemanê Rom û Asuriyan de herbek di navbera wan de qewimîye. Rom bi ser ketine û êsîrên ku bi dest xistine li vê herêmê bicîh kirine. Jixwe bi erebî êsîr tê wateya “abd”, lewma ji vê herêmê re gotine *Tur’ul-Abdin* anga “Çiyayê Êsîran” (Tan 2011: 101). Bi kurdî îro em ji vê herêmê re dibêjin *Torê* û ji yên ku li vir dijîn re dibêjin *Torî* (Tan 2011: 101). Li vê herêmê sisê zimanên girîng hene: kurdî, erebî û siryanî (Tan 2011: 347). Helbet bi hezar salan ev netewe ciran mane, zimanê wan bandor li hev kirine, hev guhertine. Li ser vê mijarê hin lêkolîn jî hatine amadekirin. Yek jê xebata M. Chyet (1995) e bi navê *Neo-Aramaic and Kurdish. An language and culture in the Near East* (Aramiya Nû û Kurdî. Ziman û çandek ji Rojhilata Nêzîk). Di vê xebatê de hev-bandora kurdî

û siryankî hatiye lêkolîn. Herwiha xebata Geoffrey Haigh û Yaron Matras (2002) ya bi navê *Kurdish linguistics: a brief overview* (Zimanzaniya Kurdî: Nêrîneke kurt) li ser pevguhertina kurdî û zimanên ciranê kurdî disekine. Herêma Torê sînore erdnîgarî yê xebata me ye.

Devoka Tûr-Abîdîn ango devoka Torê li navçeyên Nisêbîn, Midyad, Kercews, Kerboran û Hezexê tê axaftin. Ji bo tesbîtkirina sînoren devokê xebatên zanistî divên. Li gor çavdêrî û tecrûbeyên şexsî em dikarin bibêjin ku îzoglosa devoka Torê wilo ye: li rojhilat; Cizîrê û Çiyayê Gabarê, li rojava; mentîqa Mihelmiyên Midyadê, li başûr; mentîqa Qamişlo, Nisêbîn û deşta Hezexê û li bakûr; Hesankeyf û çemê Dicleyê pêk tê (Tan 2011). Her çiqas Mikail Bilbil (2017: 9) navçeya Stewrê jî dixê nav sînoren vê devokê, em bawer dikin ku ev navçe nakeve nav sînoren Torê. Dibe ku çend hevbeşî hebin di navbera axêverên her du herêman de lê yek nikare bibêje Stewrê Tor e. Navçeyên ku bi devoka Torê diaxivin ne homojen in ango ne yek-şêwe ne. Lê yên herî homojen Hezex, Kerboran û Kercewsê xwuya dikin (Haig&Opengin 2015: 48). Navçeyên weke Midyad, Nisêbîn û Qamişlo hin herêmên wan bi vê devokê daxivin, lê hinek naaxivin. Ev nexşeya jêr ji hêla Halil İbrahim Baran ve hatiye çêkirin û weke pêvek di dawîya pirtûka Altan Tan (2011) da cih digire:

Nexşeyê: Nexşeya Herêma Tor Abîdîn



2.1.1. Cihê Devoka Torê di Kurmancî de

Li gorî dengnasî (phonology), morfosîntaks (morphosyntax) û leksîkon (lexicon, ferhengî) kurmancî xwedî pênc devokan e: Devoka başûr-rojhilat, pirtir bi navê devoka Badinî tê zanîn. Li derdora Colemerg û Duhokê tê axaftin. Devoka başûr, li derdora Mêrdîn, Êlih, Şirnex, Amed û Hesekê tê axaftin. Devoka bakûr, pirtir bi navê devoka Serhedê tê zanîn. Li herêma Muş, Agirî, Erzerom û Wanê tê axaftin. Devoka başûr-rojava, li derdora Semsûr, Dilok, Heleb û Rihayê tê axaftin. Devoka bakûr-rojava, li herêma Mereş, Meletî û Sewasê tê axaftin. (Haigh&Opengin 2014: 147). Li gorî vê dabeşkirinê, devoka Torê ji aliyê taybetmendiyan xwe ve dikeve nav sînore devoka başûr. Devoka Torê li herêma Mêrdîn, Kercews (Êlih) û Hezexê (Şirnex) tê axaftin.

Herwiha dabeşkirina devokên kurmancî li gorî kesan diguhere. Weke mînak Kadri Yıldırım li gorî herêman devokên kurmancî dabeş kiriye. Li gorî Yıldırım pênc devokên kurmancî hene: botanî, hekarî, aşteyî, badînanî û bayezidî (Yıldırım 2012: 25-26).

2.1.2. Taybetmendiyan Rêzimanî yan Devoka Torê

Em dikarin bi kurtasî taybetmendî û cûdahiyên rêzimanî yan devoka Torê wilo rêz bikin:

1. Gireya neyînî (*na-*) di kurmanciya standart de gava ku lêker dariştî be dikeve navbera gireya dariştinê û koka lêker. Di devoka Torê de gireya neyîniyê dema ku lêker dariştî be, berî pêşgira dariştinê (*ve-, ra-, hil-, da-,*) tê:

Mînak; *na-ra-zê m, na-ve-xwim, na-ra-bim*

2. Herwiha gireya dema niha ya domdariyê (*di-*) di kurmanciya standart de gava ku lêker dariştî be dikeve navbera gireya dariştinê û koka lêker. Lê pêşgira dema niha ya domdariyê (*di-*) dema ku lêker dariştî be, di devoka Torê de nayê nava peyvê, weke gireya neyîniyê tê pêşgira pêşgirên dariştinê (Haig&Opengin 2015: 55).

Mînak; *di-ra-zê m, di-ve-xwim, di-rû-nê m*

3. Di devoka Tor-Abîdîn de kopula (pêgir) ji bo kesê duyem *-î* û ya ji bo kesê sêyem ji devla *-eyê, -a* tê bikaranîn (Haig&Opengin 2015: 65).

Mînak; *tu baş î/a, ew baş a*

Ji ber van kêşanên cûda yên lêkeran û kopulayê (pêgir) rengvedana fonolojîk (dengî) jî diguhere. Loma jî dengên *a* û *ê* di devoka Tor-Abîdîn de zêdetir in. Ev yek di xebatên îstatîstîkî yên li ser dengan de jî xwuya ye (Bilbil 2017: 10):

Tor Abîdîn **a** %10, 68 **ê** % 9, 03 (Kartal 2013: 28)

Omerî **a** %8, 92 **ê** % 6, 34 (Akbaş 2013: 30)

Zêdebûna bikaranîna *ayê* ji ber şeweya kişandina lêker û kopulayê ye. Herwiha gava ku yek li rêjeyên jorê binêre dibîne ku bikaranîna *ê* di devoka Torê de jî ji bikaranîna devokê din pirtir e. Du sedemên vê hene: Yek jê ev e: *Di kurmancî da lêkerên ku bi “-andin”ê diqedin, di dema niha û dema bê da û di nerênîyên van deman de, di raweya fermanî de, bi piranî dengê a’yê diguhere dibe î. Lê li herêma Torê dibe “ê”* (Altunışık 2015: 14-15):

Mînak; *dikelînim* → *dikelênim*
 bikişîne → *bikişênim*

Sedema duyem jî di devoka Torê de gava ku navdêr weke berkarê tên bikaranîn, dengê *ayê* dibe *ê*, angû forma oblîk (tewandî) a navdêran tê bikaranîn. Lewma bikaranîna rêjeya dengê *ê* yê zêde ye.

Mînak; *xanî-xênî, çem-çê, bajar-bajêr, şivan-şivên*

4. Weke ku me li jorê jî got, devoka Torê ji alîyê peyvîziyê ve nêzîkî devokên din e. Tenê di hinek bikaranînan de cûdahî hene. Cûdahîyeke berbiçav ew e ku dema lêkera *gotinê* berkareka nerasterast ya datîf distîne berkar piştî pêveberê tê. Lê di kurmanciya standart de berkara datîf berî pêveberê tê. Bikaranîna lêkerên bi vî awayî wilo ye:

Mînak; *Min gote te.*

Weke ku di mînaka jorê de jî xwuya dike berkara nerasterast (*te*) piştî lêkerê (*gote*) hatiye bikaranîn. Ev mînak di kurmanciya standart de wilo ye: *Min ji te re got.* Di kurmanciya standart de berkara nerasterast (*ji te re*) berî lêkerê (*got*) hatiye bikaranîn.

Herwiha di bikaranîna lêkera *hezkirinê* de jî cûdahî heye. Di devoka Torê de berkar ne berî lêkera *hezkirinê* tê, lê berkar dikeve navbera navdêr (*hez*) û lêkera alîkar (*kirin*).

Mînak; *Ez hij ji te dikim.*

Weke ku di mînaka jorê de xwuya ye berkar (*te*) piştî navdêr û berî lêkera alîkar (*kirin*) hatiye bikaranîn. Ango berkar dikeve navbera her du hêmanên lêkera hevedûdanî. Ev mînak di kurmanciya standart de wilo ye: *Min ji te hez kir.* Di kurmanciya standart de berkar (*te*) berî hêmanên lêkera hevedûdanî (*hez kirin*) tê.

5. Mijara cûdahiyêke din jî pêşgireya dema bê (*bi-*) ye. Di devoka Torê de pêşgira dema bê ji bo dema bê nayê bikaranîn:

Mînak; *ez ê çim, ez ê şitexilim, ez ê şênim.*

Weke ku di mînaka jorê de xwuya dike şeweyên lêkerên dema bê yên devoka Torê bêyî pêşgira *bi-yê* ne û kurt in. Di kurmanciya standart de ev lêker bi şiklên *bi-yê* re tên bikaranîn. Weke mînak em dikarin wilo binivîsin: *Ez ê bi-çim, ez ê bi-şitexilim, ez ê bi-şênim.* Ev pêşgir, di devoka Torê de ji bo raweyên fermanî û daxwazî tê bikaranîn:

Mînak; *bi-ştexile, bi-mire, bi-çe.*

6. Bikaranîna gireya *-kêyê*.

Di devoka Torê de gava ku cînavên kesî tên bikaranîn paşgira *-kêyê* distînin.

Mînak; *Wînakê wilo kiriya. Wênakê got...*

Weke ku di mînaka jorê de xwuya dike şeweyên bikaranîna cînavên kesî yên devoka Torê ji bikaranîna standart cihê ye. Cînavên kesî bi paşgira *-kêyê* re tên bikaranîn. Di kurmanciya standart de ev cînav ne bi vî rengî tên bikaranîn (Güneri 2018: 157). Weke mînak em dikarin wilo binivîsin: *Wî wilo kiriye. Wê got...*

2.1.3. Xebatên ku li ser Devoka Torê Hatine Amadekirin

Eger em behsa xebatên li ser devoka Torê bikin, em dibînin ku di vî warî da xebatên taybet tune ne. Her çend hin xebatên kevin hebin ku bi devoka Torê re têkildar in û ji bo xebatên zimanî girîng in jî mijarên rêzimanî di wan de nîn in. Lê dîsa jî çend xebatên der bareyê Torê de hatine amadekirin hene. Du xebatên Hugo Makas (1897) devoka Mêrdînê têkildar dikin ku yek jê rasterast li ser devoka Mêrdînê ye û navê xebatê ev e: *Dialekte Aus Der Gegend Von Märdîn* (Diyalektên Herêma Mêrdînê) û gelek tekstên herêma Mêrdînê tê de

cih digirin ku wergera wan jî tê de heye. Herwiha di dawîya wê xebatê de ferheng jî cih digire. Xebata Makas (1900) a din jî *Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gäwar; Jezidengebete* (Ji Dîyalekta Diyarbekirê Mînakek; Helbestek ji Gewerê; Diayên Êzîdiyan) her çend rasterast ne li ser devoka Torê be jî, di asta fonolojîk (dengnasî) û leksîkolojîk (ferhengî) de berawirdkirina hin taybetiyên devoka Mêrdîn û Dîyarbekirê tê de cih girtine. Ev her dû xebat di yek pirtûkê de hatine komkirin û di 1979an da li Amsterdamê dîsa hatine çapkirin (Makas 1979).

Xebateka din jî ya Eugen Prym û Albert Socin bi navê *Erzählungen Und Lieder im Dialekte Des Tûr Abdin*, (Vegotin û Kilamên Dîyalekta Tûr-Abidîn, 1886) e û li Petersburgê hatiye çapkirin. Di vê xebatê de gelek çîrok û kilam cih digirin ku rengvedana axaftina devera Mêrdînê pir tê de cih digire. Lê ne xebateke rêzimanî ye, folklorîk e û ji ber ku tekstên wê demê hatine qeydkirin, gelekî girîng e.

Dîsa du xebatên Helmut Ritter jî hene ku di 1968-9 û 1976an da çap bûne û li ser devoka Tor-Abîdîn in (Bilbil 2017: 12). Xebata wî ya pêşî di sala 1968an de bi vî navî ye: *Kurmānci-Texte aus dem Tûr'abdin, I. Kārboran* (Metnên Kurmancî ji Herêma Tûr-Abidîn, 1. Kerboran). Xebata duyem jî di sala 1976an de bi navê *Kurmānci-Texte aus dem Tûr'abdin, II. Yeziden* (Metnên Kurmancî j Herêma Tûr-Abidîn, 2. Êzîdî) hatiye çapkirin. Ev xebat tenê ji ber ku li ser devoka Torê disekinî di vir de navên wan hatiye vegotin. Ji bo mijar û xebata me têkiliyeke rasterast bi van xebatan re tune ye.

Dema em bala xwe bidin herêm û devokên ku li derdora Torê tînin axaftin em dibînin ku li rojhilatê Torê, devoka Botê; li rojavayê Torê, devoka Omeriyan û Mihelmiyan; li bakûrê Torê, devoka Xerzan û Amedê heye. Li başûrê Torê, jî devoka Şingalê heye. Eger em hinekî din berfireh behsa van devokên derdorê Torê bikin û ji devoka Botanê dest pê bikin em dikarin bibêjin ku ew devok li bajar û bajarokên weke Zaxo, Şirnex, Sêrt û Bidlîsê bi temamî yan jî qismî tê axaftin. Hin heremên Şirnexê û Torê sînordaşê hev in ku di navbera devoka Tor-Abîdîn û devoka Botan de Çemê Dîjle û Çîyayê Gabarê hene û van her du devokan ji hev vediqetînin. Devoka Berfîratî jî li bajar û bajarokên weke Riha, Semsûr, Meletî, Mereş, Intab, Kobanî û Efrînê tê axaftin ku ji vana Riha û Mêrdîn sînordaşê hev in. Devoka Berfîratî li rojhilat digihêje heta Pîrsûsê û li rojhilatê wê jî bajarokê Wêranşarê heye ku ew jî di navbeyna van her du devokan de dimîne ku bêtir nêzîkî devoka Mêrdînê ye (Bilbil 2017: 12-13).

Nexşe 2.¹



2.2. Cureyên Riste û Hevokan

Riste ji aliyê sîntaksî (hevoksazî) ve curbicur in. Risteyên ku xwediyê pêveberekê ne û darezekê tenê di hewînîna risteyên sade (simple clause) ne (Bilbil & Baran 2008: 101). Ev pênasê li gorî kes û teoriyan tê guhertin. Weke mînak; li gorî Malmîsanîj risteyên sade tenê ji biker û pêveberê pêk tên (2015: 283). Herwiha li gorî Bayiz Omer Ehmed (2002: 42) risteya sade ew riste ye ku tenê yek lêker tê de heye. Risteyên ku ne sade ne, aloz in. Risteyên aloz (complex clause) du an zêdetir lêkeran/darazan di hewînîna. Risteyên aloz ji yê sade têkelhevîtir in. Ango bêtir hêman û daraz di wan de hene. Li gorî Melissa Bowerman (1979: 285) risteyên aloz ji têkelhevîna risteyên sade derketine meydanê. Dema ku em li têkilîya hêmanên risteyên aloz dinêrin, em dibînin ku gelek rewşên cûda di wan de hene. Hevokên bingehîn (main clause), hevokên serbixwe (coordinate clause), hevokên tamamker (complement clause) di van têkilîyên risteyên aloz de ava dibin. Weke encam em dikarin vê pîvanê bi kar bînin: Eger tenê lêkerê di risteyê de hebe ew dê weke risteya sade, eger ji lêkerê zêdetir hebin ew dê weke risteya aloz bê qebûlîkirin. Pîvana me bêtir bala xwe dide bikaranîna lêkeran. Yanî eger em lîkî risteyeke weke *Ez çûm malê* binêrin em dibînin ku lêkerê tenê hatiye bikaranîn, ew jî *çûn* e. Lewma ev riste, risteyeke sade ye. Lê em li mînakeke weke *Ez dixwazim razê* binêrin encameke cûda diseride. Di vê risteyê de du lêker

¹ Ev nexşe ji vê xebatê (Bilbil 2017: 12) hatiye girtin.

hene: *xwestin û razan*. Ji ber vê, ev riste risteyeke aloz e. Ji ber ku hevokên tamamker ên berkarî di hevokên aloz de tèn bikaranîn em ê ji vir û pê de pirtir li ser risteyên aloz bisekinin. Em dikarin risteyên aloz wiha dabeş bikin:

2.2.1. Risteyên Aloz ên ku bi Hevokên Bend Ava Dibin

Risteyên ku ji hevokeke bingehîn (main clause) û hevokeke bend (subordinate clause) pêk tèn ji aliyê binyadî ve aloz in. Di van risteyan de du hevok hene. Yek jê hevoka bingehîn e, ya din hevoka bend e. Hevoka bingehîn (main clause) lêkera girîngtir dihewîne. Ji aliyê wateyê ve, maneya ku girîngtir û pêşektir e diyar dike. Ji aliyê hevokî ve, bi piranî berî hevoka bend tê. Hevoka bend, pirtir piştî hevoka bingehîn tê. Agahiyên zêdetir di derbareyê hevoka bingehîn de dide. Ji aliyê wateyê ve hevoka bingehîn tamam dike (Endley 2010: 919). Di mînaka jêrê de her du hevok hatine diyarkirin:

(1) <i>Ez hatim</i>	<i>go</i>	<i>te bikûjim.</i>
Hevoka bingehîn	Bingihanek	Hevoka bend

Weke di mînaka jorê de xwuya ye, risteya *Ez hatim go te bikûjim* ji du hevokan pêk tê. *Ez hatim* hevoka bingehîn e û *te bikûjim* jî hevoka bend e. *Go* jî weke bingihanekê hatiye bikaranîn û her du hevok gihandine hevdû. Dema em ji aliyê wateyê ve lê binêrin em dibînin ku hevoka bend, armanca hevoka bingehîn diyar dike. Eger em hinek mînakên din bidin:

(2)

- a. “*Wê bibine deverkî nan û av bidin deqena nemrê.*” (Derin 2013: 7)
- b. “*Ferşekî dênine ser devê tenûrê deqena tê de Edlê nebînê.*” (Altunışık 2015: 22)
- c. “*Go wele evd hat go tecawîzî mi kî.*” (Bulgan 2013: 11)
- d. “*Ez ê çime zozanan ji bo go şîr têkevê guhanê mi.*” (Bilgiç 2014: 22)

(3) <i>Go</i>	<i>ti berî min hatî</i>	<i>li hêviya min bimêne</i>
Bingihanek	Hevoka bend	Hevoka bingehîn

Weke di mînaka jorê de xwuya dike risteya *Go ti berî min hatî li hêviya min bimêne* ji du hevokan pêk tê. *Li hêviya min bimêne* hevoka bingehîn e û *ti berî min hatî* jî hevoka bend e. *Go* jî weke bingihanekê hatiye bikaranîn û her du hevok gihandine hevdû. Dema em ji aliyê wateyê ve lê binêrin em dibînin ku hevoka bend, merca hevoka bingehîn diyar dike. Ango pêkhatina hevoka bingehîn girêdayî pêkhatine hevoka bend e. Eger em hinek mînakên din bidin dê çêtir bê fêmkirin.

(4)

a. *Go ev zilam were em nayên.*

b. *Eger ew hat haya min pê xe.*

c. *Go ti ji kesi re nebêjî ez ê ji te re bêjim.*

Dema em li xebatên sahayî dinêrin, eşkere ye ku hevokên bend ên mercî gelek caran berî hevoka bingehîn tên bikaranîn. Eger em hinek mînak ji xebatên sahayî bidin:

(5)

a. “*Ya winê cehnûyê kûjin ya naxwe qîma min naye.*” (Kaya 2013: 23)

b. “*Go kê ji we girt ez ya wî ma.*” (Derin 2013: 6)

c. “*Go te di wê kêlîkê de bibînê ê te bikûjê.*” (Arslan 2013: 8)

d. “*Heke Xwedê keç da te heta hûn sax in wê xweyî kê.*” (Altunışık 2015: 9)

e. “*Eger ez herme Mekehê cem mala bavê xwe wê ji bavê mi re bî kêmayî.*”

(Bulgan 2013:13)

f. “*Go ti têr bide mi ez ê mehîna xwe dime te.*” (Bilgiç 2014: 15)

g. “*Heta ez wilo nebêjim wûn derî navekin.*” (Bilgiç 2014: 22)

(6) <i>Ez hij te nakim</i>	<i>ji ber go</i>	<i>ti serhişk î.</i>
Hevoka bingehîn	Bingihanek	Hevoka bend

Gava ku em li mînaka banî binêrin em dibînin ku riste ji sê hêmanan pêk hatiye. Hevoka bingehîn, bingihanek û hevoka bend. Hevoka bend, sedema pêkhatina hevoka bingehîn diyar dike. Bingihanek jî wan girêdide. Çend mînakên din:

(7)

- a. *Zad îsal bêbereket bûn ji ber go baran hindik bariya.*
- b. *Hevalê min bes tê mala me ji ber go min dilê wî şikehand.*
- c. *Serê min êşiha ji ber go ti zahf diştexilî.*

Di xebatên sahayî de zêdebûna hevokên bend ên armancî û mercî balê dikişînin. Ango hevokên bend ên sedemî li gorî hevokên bend ên armancî û mercî kêmtir in. Eger em çend mînakan ji xebatên sahayî bidin:

(8)

- a. *“Gemiya mi xera bûye ez we herdoka nikarim bibim.”* (Derin 2013: 8)
- b. *“Kêfa Biro dihat ku Heso bawer kirîye.”* (Altunışık 2015: 2)
- c. *“Go ev ji min re lazim bû min ev kiriye.”* (Bulgan 2013: 11)

(9) <i>Keçika</i>	<i>go</i>	<i>ez ecibandîbûm</i>	<i>zewicî.</i>
Biker	Bingihanek	Hevoka pêwendiyê	Hevoka bingehîn

Gava ku em li mînaka jorê dimeyîzînin em dibînin ku riste ji du darazan pêk tê. Ango riste ji du hevokan pêk tê. Hevoka yekem hevoka pêwendiyê ye. Hevoka duyem hevoka bingehîn e. Hevoka pêwendiyê weke rengdêra bikera hevoka bingehîn hatiye bikaranîn û di asta hevokî de ye (Bilbil 2017: 23). Di mînaka jorê de hevoka pêwendiyê bikera hevoka bingehîn diwesifîne. Lê hevokên pêwendiyê ne pêwist in ku bikerê tenê biwesifînin, herwiha dikarin hêmanên din jî biwesifînin. Em dikarin risteyên jêrê weke mînak bidin:

(10)

- a. *“Ew zîlamê go digo çil keçikê ez ê bihevdu ra ênim wî digirin.”* (Derin 2013: 7)
- b. *“Tiştê go Xwedê kiriye betal nabe.”* (Kaya 2013: 23)

- c. "Teyrikê ku dikûjê jî bi serê çiqilê dara ve dike." (Altunışık 2015: 9)
- d. "Herin ewê go win bi wa difesinin bere bën." (Bulgan 2013: 13)
- e. "Werîsê go ji dest wa ketî behemdî wa bi xwe ve şidand." (Bilgiç 2014: 20)
- f. "Wexta ku zewiciye hatiye Serê Avê." (Derin 2014: 2)
- g. "Wele ew zîlamê te girtiye ew bavê min e." (Güneş 2013: 22)

2.2.2. Risteyên Aloz ên ku Hevokên Temamker ên Berkarî Distînin

Hevokên tamamker ên berkarî, weke hêmaneke tamamker a risteyê ye. Ango hevokên tamamker ên berkarî weke berkara risteyê tevdigerin, ji aliyê wate û binyadê ve hevoka bingehîn tamam dikin (Givon 2001a: 39). Hevokên tamamker ên berkarî weke hêmaneke pêwîst a hevokê tên bikaranîn. Rola wan di risteyê de berkarî ye ku hevoka bingehîn tamam dikin (Noonan 1985: 43). Ku em mînakên bidin:

(11)

- a. *Wê sêv xwest.*
- b. *Wê xwest go sêvê bixwe.*
- c. *Wê ev zanîbû.*
- d. *Wê zanîbû go ti hatiye.*

Gava ku em li mînakên jorê binêrin, em dikarin wilo şîrove bikin: Di risteya (11.a)yê de *sêv* berkar e. Lekera *xwestinê* tenê kişandî ye, lewma jî risteyeke sade ye. Di risteya (11.b)yê de *sêvê bixwe* berkar e. Du lêker (*xwestin û xwarin*) hene û hatine kişandin, lewma ev riste, risteyeke aloz e. *Sêvê bixwe* hevoka tamamker e ku weke berkara lêkera *xwestinê* hatiye bikaranîn. Di risteya (11.c)yê de *ev* berkar e. Lêkerê tenê (*zanîn*) heye û kişandî ye, lewma jî risteyeke sade ye. Di risteya (11.d)yê de *ti hatiye* berkar e. Du lêker (*zanîn û hatin*) hene û hatine kişandin, ji ber vê ev riste, risteyeke aloz e. *Ti hatiye* hevoka tamamker e û weke berkara *zanînê* hatiye bikaranîn. Weke ku li jorê jî xwuya dike hevokên tamamker ên berkarî yên kurmancî bi piranî kêşayî ne (Matras 2002: 61). Behsa hevokên tamamker ew ê bi hûrgilî bê vegotin, ji ber wê em ê di vir de mijarê biqedînin. Em ê di beşên xebatê yên din de behsa cureyên hevokên tamamker ên berkarî û bikaranîna wan bikin.

2.3. Hin Têgihên Girîng

Di vê binbeşê de em ê têgihên ku ji bo xebatê girîng in û pir hatine dûbarekirin bidin nasîn. Ji bo fêmkirineke baştir me pêwîstî bi vê beşê dît. Lewma termên rêzimanî ku mijara me eleqeder dikin hatine danasîn. Herwiha ji bo ku têgih baş bê fêmkirin mînak hatine dayîn. Têgihên weke cînav, lêkerên dariştî, lêkerên têper û yên netêper, ergatîfî, biker, berkar, pêveber, kara, bandorgir û datîf hatine danasîn.

2.3.1. Cînavên Kesî

Cînav ew cure peyv in ku di cihê navdêran de tên bikaranîn. Cînavên ku cihê kesan digirin cînavên kesî ne. Cînavên kesî, li gorî şert û mercên ergatîfî û ravekê dibin du beş: cînavên xwerû û yên tewandî. Cînavên xwerû di risteyên ku pêvebera wan navdêr û netêper de weke bikerê tên bikaranîn (Gundogdu 2015: 387) . Cînavên kesî yên xwerû ev in: ez, tu, ew, em, hûn, ew. Cînavên kesî yên tewandî bêtir di ravekan de û bi lêkerên têper ve weke biker tên bikaranîn. Cînavên kesî yên tewandî ev in: min, te, wî/wê, me, we, wan (Jügel 2014: 130). Herwiha cînavên kesî di bikaranîna devoka Torê de carinan diguherin. Weke mînak cînavên kesê yekem ê yekjimar *mi* ye. Ango tîpa dawîya peyvê dikeve gelek caran. Heman tişt ji bo kesê sêyem ê pirjimar jî li kar e, *wa* weke forma xurt tê bikaranîn (Güneri 2018: 59).

2.3.2. Ergatîfî

Ergatîfî têkiliya di navbera biker, berkar û pêveberê de tayin dike. Di zimanên ku ne ergatîf in de pêveber dikeve bin bandora bikerê ye. Lê, di zimanên ku ergatîf in de pêveber dikeve bin bandora berkarê jî. Ango di zimanê ergatîf de pêveber li gorî berkarê qertafan distîne. Kurmancî jî zimanekî ergatîf e. Ango pêveber dikeve bin bandora berkarê. Biker xwerû ye lê berkar tewandî ye û pêveber li gorî berkarê qertafan distîne. Ergatîfiya kurmancî niv-ergatîfî ye, yanî tenê di demên borî de dertê holê. *Ez te dibînim* ev riste di dema niha de ye. Biker *ez* e û xwerû ye; berkar *te* ye û tewandî ye. Pêveber *dibînim* e û li gorî bikerê qertaf girtiye. Lewma ev riste ne risteyeke ergatîf e. Lê gava ku em dema vê risteyê biguherînin ew ê forma risteya ergatîf biafire: *Min tu dîtî*. Biker *min* e û tewandî ye. Berkar *tu* ye û xwerû ye. Pêveber *dîtî* ye û li gorî berkarê qertaf girtiye (Matras 1997: 617). Ango sisê qanûnên ergatîfiya kurmancî hene (Güneri 2018: 107):

1. Bikera di dema borî de tewandî ye.
2. Berkara di dema borî de xwerû ye.
3. Lêker li gorî berkarê tê kişandin.

2.3.3. Lêkerên Dariştî

Lêker li gorî binyadê dibin sê beş: lêkerên xwerû, lêkerên dariştî û lêkerên lêkdayî. Lêkerên xwerû qertafên çêker nikarin bigirin. Lêkerên lêkdayî ji du peyvan pêk tên. Lêkerên dariştî qertafên çêker digirin. Ango qertafa çêker tê koka peyvê û peyveke nû çêdike, lewma ev peyv dariştî ne. Mînak; *ve-xwarin*, *da-ketin*, *hil-anîn*, *der-ketin*, *ve-xwarin* (Yıldırım 2012: 87).

2.3.4. Lêkerên Têper û Netêper

Lêkerên ku dikarin berkarê bistînin têper in, lê yên ku nikarin bistînin netêper in (Haig 2004: 17). *Min nan kirîbû* di vê risteyê de biker *min* e, berkar *nan* e û lêker *kirîn* e. Ji ber ku berkar sitendiye ev lêker têper e. Lêkerên têper di dema borî de dibin ergatîf û dikevin bin tesîr û kontrola berkarê. *Ez çûm* di vê risteyê de biker *ez* e, lêker *çûn* e. Ji ber ku berkar di risteyê de nîne ev lêker netêper e (Yıldırım 2012: 97).

2.3.5. Rolên Rêzimanî (Grammatical Roles)

Di risteyan de ji aliyê rêzimanî ve her hêmanekê roleke wê heye. Ango ji aliyê rêzimanî ve peywira her hêmanekê heye. Em ji van rolan re dibêjin rolên gramatîk. Hêmanên herî girîng bo risteyekê pêveber, biker û berkar in. Ev hêman ji bo risteyê hêmanên pêwîstî ne.

2.3.5.1. Pêveber

Pêveber hêmana risteyê ya herî girîng e. Kar an rewşekê diyar dike. Bêyî pêveberê riste tamam nabe. Lewma pêwîstiya risteyê bi pêveberê heye. Mînak; *Min nan kirî* di vê

mînakê de karê ku hatiye kirin *kirîn* e, lewma pêvebera vê risteyê *kirî* ye (Yıldırım 2012: 303).

2.3.5.2. Biker

Kesê ku kar dike an xwediyê rewşa di risteyê de hatiye diyarkirin biker e. Ango yê ku kar dike û yê ku xwediyê rewşekê ye biker (subject, özne) e. Biker jî weke pêveberê ji bo pêkanîna risteyê pêwîst e. Mînak; *Min nan kirî* di vê risteyê de yê ku karê *kirînê* dike *min* e, lewma bikera risteyê *min* e (Yıldırım 2012: 302).

2.3.5.3. Berkar

Tişt an kesê ku dikeve bin bandora karê risteyê berkar e. Ango tişt an kesê ku tesîr lê dibe berkar e. Berkar di risteyên ku pêvebera wan ji lêkereke têper pêk tê de pêwîst e. Mînak; *Min nan kirî* di vê risteyê de tiştê ku tê *kirîn nan* e, anga *nan* di bin bandora bikerê (*min*) de ye. Lewma *nan* berkar e (Yıldırım 2012: 325).

2.3.6. Rolên Wateyî (Semantic Roles)

Rolên wateyî yên risteyê weke ku ji nav jî diyar e wateyê eleqeder dike. Ango kîjan hêmana risteyê çi wateyê dide risteyê? Bersivên vê pirsê rolên wateyî pêk tîne. Hin hêman karê di risteyê de dikin. Hin ji wan dikevin bin bandora yê ku kar dike. Hin ji wan emraza pêkanîna kar diyar dikin. Ango gelek hêman di risteyê de hene û her yek ji wan xwedî roleke wateyî ne. Lê ji bo me sisê ji wan girîng in û ew e girîng ev in: *kara*, *bandorgir* û *datîf*.

2.3.6.1. Kara (Agent)

Kara, karê di risteyê de pêk tîne. Bi piranî giyandar e û bizanebûn tevdigere (Haig 2004: 18). Lewma xwedî kontrol, vîn û berpirsiyariyê ye. Mînak; *Ehmed li Rojînê da* di vê risteyê de kesê ku *lêdanê* dike *Ehmed* e. *Ehmed* bi vîn û zanebûnê vî tiştî dike, lewma *Ehmed* karayê (agent, eden) vê risteyê ye (Givon 2001a: 107).

2.3.6.2. Bandorgir (Patient)

Kesê ku karê di risteyê de pêk tîne. Lê li gorî kara vîn, kontrol, xweserî û berpirsiyariya bandorgirê kêmtir e (Haig 2004: 19). Ango di risteyê de vîna guherîne ranagihîne. Mînak; *Ehmed Rojînê dibîne* di vê risteyê de kesa ku tê dîtîn *Rojîn* e. *Rojîn* berkarek e ku guhertin tê de çênebûye. Ji berkarên wilo re bandorgir (patient) tê gotin (Givon 2001a: 107).

2.3.6.3. Datîf (Dative)

Kesê ku tevî karê risteyê dibe. Datîf bi tevgera kara diguhere. Bêhemd tevî kar dibe û kara tesîrê lê dike. Mînak; *Ehmed Rojînê tirsand* di vê risteyê de kesa ku di bin bandora kara de ye *Rojîn* e. *Rojîn* ji tevgera *Ehmed* tesîr digire. Lewma *Rojîn* datîf e (Givon 2001a: 107).

BEŞA YEKÊ

Di vê beşa yekem de em ê li ser cureyên lêkerên ku hevokên temamker ên berkarî distînin bisekinin. Sisê cureyên lêkeran hene ku dikarin hevokên temamker ên berkarî bistînin: lêkerên modal, lêkerên pêzanîn-pêhisîn-vegotinê (PPV), lêkerên manîpûlatîf. Lêkerên weke *kirin*, *xwestin*, *gomankirin*, *destpêkirin*, *xelaskirin*, *neytkirin*, *hêvîkirin* mînak in bo lêkerên modal. Lêkerên pêzanîn-pêhisîn-vegotinê weke ku xwuya dike sisê beş in. Lêkerên weke *zanîn*, *fêmkirin*, *ferqkirin*, *têgihîştin*, ji bo lêkerên pêzanînê; *dîtin*, *hiskirin*, *meyizandin*, *nihêrtin*, *eyşandin*, ji bo lêkerên pêhisînê; *gotin* ji bo lêkerên vegotinê mînak in.

1. CUREYÊN LÊKERÊN KU HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ DISTÎNIN

Di vê binbeşê de em ê li ser lêkeran bisekinin. Lêker ji aliyê têkîliya bi berkarê ve dibin du beş: lêkerên têper û yên netêper. Lêkerên têper berkarekê distînin. Lê lêkerên netêper berkarê nastînin. Lêkerên ku ji me re lazim in lêkerên têper in. Weke ku ji sernavê diyar e mijara me li ser lêkerên têper û hevokên temamker ên berkarî ye. Lêkerên têper hemû nikarin hevokên temamker ên berkarî bistînin. Hin ji wan tenê dikarin bistînin. Mesela lêkera *vexwarinê* ji têper e lê nikare hevokeke temamker a berkarî bistîne. Lê lêkereke weke *kirinê* dikare piştî xwe hevokeke temamker a berkarî weke berkara xwe bistîne. Ango hevokên temamker ên berkarî bi hin lêkerên têper re tînin bikaranîn û dibin berkarên van lêkeran. Lêkerên ku dikarin hevokên temamker ên berkarî bistînin sisê cure ne: lêkerên modal, lêkerên PPVyê û lêkerên manîpûlatîf. Em ê pêşi bi lêkerên modal dest pê bikin.

1.1. Lêkerên Modal (Modal Verbs)

Pênaseya lêkerên modal divê him ji aliyê wateyî (semantics) ve him jî ji aliyê hevoksaziyê (syntax) ve bê eşkerekirin. Pênaseya lêkerên modal ya wateyî ev e: 1. Hevoka temamker a berkarî ya lêkerên modal ji hevokekê pêk tê û rewş an jî bûyereke îfade dike. 2. Kirdeya hevoka bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî hev-referant e (co-referant). 3. Lêkera hevoka bingehîn destpêkirin, xelasbûn, domdarî, serkeftin, sernekeftin, teşebûs, niyet, divêti an jî şîyanê îfade dike. Weke ku xwuya dike sê taybetiyên lêkerên modal ên wateyî

hene. Herwiha sê taybetiyên hevoksazî yên lêkerên modal hene: 1. Kirdeya hev-referant ji hevoka tamamker a berkarî dikeve. 2. Hevokên tamamker ên lêkerên modal pirtir bi raweya daxwazî ne. 3. Hevoka tamamker weke berkara hevoka bingehîn tevdi gere (Givon 2001a: 149-150). Gava ku lêkerên modal hevokên tamamker ên berkarî distînin hevokên aloz pêk tên (Bilbil 2017: 113). Risteyên ku lêkerên modal di wan de hene, ji du hêmanan pêk tên: hevoka bingehîn û hevoka tamamker a berkarî. Weke mînak gava ku em dibêjin: *Ez dikarim erebeyê biajonim* em dikarin bibêjin ku du hevok di vê risteyê de hene: *Ez dikarim* hevoka bingehîn e û *ez erebeyê biajonim* jî hevoka tamamker a berkarî ye. Di risteyeke wilo de hevoka tamamker a berkarî ji aliyê wateyê ve di rola berkarê de ye. Yanî dema em dibêjin *ez dikarim* em dizanin ku *karin* lêkerê têper e û berkarekê dikare bistîne. Di risteyeke weke ya jorê de jî *ez erebeyê biajonim* teqabûlî berkarê ye. Ji ber ku ez tiştekî karim û ew jî *ajotina erebeyê* ye. Loma risteyên bi vî awayî ji du hevokan pêk tên. Ango pevrebûna hevoka bingehîn û hevoka tamamker a berkarî li kar e. Ji bo ku baştir bê fêmkirin em ê çend mînakên bidin:

(12)

- a. *Diyar dikare.* (Hevoka bingehîn e.)
- b. *Diyar diçe (tere) malê.* (Hevoka tamamker a berkarî ye.)
- c. *Diyar dikare biçe malê.* (Pevrebûna her du hevokan e.)

(13)

- a. *Min goman kir.* (Hevoka bigehîn e.)
- b. *Ti nayê.* (Hevoka tamamker a berkarî e.)
- c. *Min goman kir go ti nayê.* (Pevrebûna her du hevokan e.)

Em dikarin lêkerên modal ji du aliyan ve pênase bikin: semantîk û sîntaktîk (Givon 2001a: 149-151). Taybetmendiyên wateyî (semantics) ên lêkerên modal ev in:

- a. Hevokên tamamker ên modal ji aliyê wateyê rewş an bûyerekê tînin ziman.

(14) *Ez dixwazim biçim malê.*

Di vê mînakê de *biçim malê* hevoka tamamker a berkarî ye, anga lêkera *xwestinê* tamam dike. Ji ber ku lêkera hevoka tamamker (*biçim malê*) kêşayî ye, *xwedî daraz e*, ew daraz jî *çûna malê* ye.

- b. Bikera hevoka bingehîn bi bikera hevoka tamamker re carinan hev-referant (co-referent) e.

(15) *Ez (di)karim bixwînim.*

Di vê mînakê de bikera hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî *ez* e. Ango *ez* di her du hevokan de jî biker e û hev-referant e. Bikera hev-referant di hevoka bingehîn de hatiye bikaranîn, lê di hevoka tamamker a berkarî de nehatiye bikaranîn.

c. Lêkera bingehîn destpêkirin, qedandin, israr, biserketin, biserneketin, teşebûs, niyet, divêtî û şîyanê îfade dike. Bikera hevoka bingehîn ji bo pêkanîna rewş û karê ku di risteyê de tê gotin li kar e.

(16) *Min neyt kir go rojê bigirim.*

Di vê risteyê de niyet tê îfadekirin. Bikera hevoka bingehîn (*min*) bi neyt e ji bo karê ku di hevoka tamamker a berkarî de hatiye diyarkirin (*rojêgirtin*) pêk bîne.

Taybetmendiyên hevoksazî (syntactic) ên lêkerên modal ev in:

a. Ku bikera hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî hev-referant bin, biker di hevoka tamamker a berkarî de nayê bikaranîn.

(17) *Ti (di)karî çayê vexwî.*

Di vê risteyê de *ti* hem bikera hevoka bingehîn (*dikarî*) e hem jî ya hevoka tamamker a berkarî (*çayê vexwî*) ye. Ji ber ku biker di her du hevokan de hev-referant e, di hevoka bingehîn de hatiye bikaranîn lê di hevoka tamamker a berkarî de nehatiye bikaranîn.

b. Lêkerên hevokên tamamker pirtir kêşayî ne (Haig 2007: 180). Lê çend mînakên nekêşayî jî hene.

(18) *Ez hêvî dikim go tê ê cem min.*

Di vê mînakê de hevoka tamamker *tê ê cem min* e. Lêkera hevoka tamamker *hatin* e. Lêker (*ê*) di rewşa dema bê de ye û li gorî kesê duyem hatiye kişandin. Hevokên tamamker ên kurmancî bêtir kêşayî ne. Lê weke me li jorê jî got hin mînakên vajî jî hene.

(19) *Mi dest bi xwendinê kir.*

Di vê risteyê de lêkera hevoka bingehîn *destpêkirin* e, lêkera hevoka tamamker jî *xwendin* e. Weke ku li jorê jî xwuya ye *destpêkirin* ji aliyê kes û demê ve kêşayî ye. Lê berkar yanî *xwendin* nekêşayî ye, lê di rewşa navdêran de ye ku paşgira tewangê sitendiye.

c. Hevokên tamamker di rola berkarê de ne.

(20) *Min xwest go bi ser kevîm.*

Di vê risteyê de lêkera hevoka bingehîn *xwestin* e, lêkera hevoka tamamker jî *biserketin* e. *Xwestin* lêkereke têper e, ango dikare berkarê bistîne. Em dikarin risteyê wilo jî îfade bikin: *Min tişteke xwest*. Di vê mînakê de *min* biker e, *xwestin* pêveber e û *tişteke* jî berkar e. Ji dêvla *tişteke* ve em dikarin *bi ser kevîm* bi kar bînin. Lewma hevoka tamamker weke berkarê tevdigere. Herwiha gava ku em li pêvebera me binêrin em dibînin ku ji lêkereke têper pêk tê. Li gor distûra ergatîfiya kurmancî lêkerên têper di dema borî de bi bikerên tewandî re tên bikaranîn. Ku em vegerin mînaka me, *min* weke bikerê hatiye bikaranîn. Lewma lêkera *xwestinê* têper e û hevoka tamamker a wê jî weke berkarê hatiye bikaranîn.

Lêkerên modal mirov dikare bike du beş: helwesta modal û xuyang.

1.1.1. Helwesta Modal (Modal Attitude)

Di helwesta modal de rastbûna hevoka bingehîn bi awayeke pêwîst rastbûna hevoka tamamker a berkarî pêk nayêne. Ango hevoka bingehîn pêk hatibe hevoka tamamker a berkarî ne pêwîst e ku pêk were. Risteyeke weke *Min xwest biçim* em dikarin wilo şîrove bikin: Hevoka bingehîn *min xwest* e, *xwestin* lêkereke modal e û di vê hevokê de pêk hatiye. *Biçim* hevoka tamamker e, lê em nizanin ku lêkera *çûnê* pêk hatiye an nehatiye. Lewma di vê risteyê de helwesta modal heye (Givon 2001a: 151). Helwesta modal wateyên weke viyan, niyet, teşebûs, karîn û îhtîmalê dide risteyê. Li wateya lêkeran helwesta modal dibe du beş:

1.1.1.1. Helwesta Modal a Erênî

Lêkerên ku xwedî wateya erênî ne û mînakên modal in dibin mînakên helwesta modal a erênî. Lêkerên mînak ev in: *xwestin*, *niyetkirin*, *hêvîkirin*, *biryardan*, *pejirandin*, *hewldan*, *karin*, *divêtin*.

1.1.1.2. Helwesta Modal a Neyînî

Lêkerên ku xwedî wateya neyînî ne û mînakên modalî dibin mînakên helwesta modal a neyînî. Lêkerên mînak ev in: *redkirin*, *nexwestin*, *nikarin*.

1.1.2. Xuyang (Aspectuality)

Lêkerên ku wateyên weke *destpêkirin* (inception), *bidawîbûn* (termination), *domdarî* (continuation), *serkeftin* (success) û *biserneketinê* (failure) îfade dikin raweya xuyangê pêk

tînin. Di kurmancî de hin lêker hene ku her çiqas di eslê xwe de ne lêkerên xuyangê (aspective) û modal bin jî di hinek bikaranînan de dikarin ji bo rolên xuyangî (aspectual) û modal bînin bikaranîn (Bilbil 2017: 116). Talmy Givon (2001b: 55) dema ku behsa tîpolojîya wateyî (semantics) ya lêkerên modal dike, *destpêkirin* (inception), *bidawîbûn* (termination), *domdarî* (continuation), *serkeftin* (success) û *biserneketinê* (failure) weke rawetîya xuyangê qebûl dike. Lêkerên weke *rabûn*, *lêxistin*, *çûn*, *destpêkirin*, *dewamkirin*, *qedandin* wateyên espektîf (xuyangî) ava dikin. Yanî dema ku lêkereke espektîf û hevokeke tamamker di heman risteyê de bînin bikaranîn risteyeke aloz dertê meydanê. Lêkerên *kirin*, *rabûn*, *lêxistin* û *çûnê* di hinek rewşan de ne di wateya xwe ya ferhengî de ne. Ji dêvla wê, bi lêkereke din re tînin bikaranîn û wateya espektîf didin risteyê. Ji bo ku mijar baştir bê fêmkirin em ê çend mînakên espektîf bidin.

(21) *Min rabû got.*

Di vê risteyê de *min rabû* hevoka bingehîn e. *Min got* jî hevoka tamamker e. Gava ku pevrebûna wan pêk tê *min rabû got* dertê holê. Di vê risteyê de du lêkerên kişandî hene: *rabûn* û *gotin*. Lewma riste, aloz e. Herwiha lêkera *rabûnê* ne di wateya xwe ya ferhengî de hatiye bikaranîn. *Rabûn* di wateya teşebûsê de hatiye bikaranîn. Lewma jî lêkera *rabûnê* weke modalîteya espektîf hatiye bikaranîn.

(22) *Min çû lê da.*

Di vê risteyê de lêkera *çûnê* weke modalîteya espektîf hatiye bikaranîn. Li gorî axaftina du însanan em dikarin wateya wê eşkeretir bikin. Du insan diştexilin:

-*Te çi kir?*

-*Min çû lê da.* (Ez poşman jî bûm lê edî lêdan bi dawî bû.)

Di wateya lêkera *çûnê* de *bidawîbûn* heye. Lewma em dikarin bibêjin ku ev lêker di vê risteyê de weke modalîteya espektîf hatiye bikaranîn.

(23) *Wê lê da çû mala bavê xwe.*

Lêkera *lêdanê* di vê risteyê de teşebûseke xurt û zû îfade dike. Lewma jî lêkereke modalîteya espektîf e.

Xuyang (aspectuality) ji pênc binbeşan pêk tê: *destpêkirin*, *domdarî*, *serkeftin*, *qedandin*, *biserneketin*.

1.1.2.1 Destpêkirin

Destpêkirina karekî îfade dike. Lêkera mînak bo destpêkirinê ev e: *destpêkirin*.

(24) *Min dest bi xwendinê kir.*

Destpêkirin lêkereke espektîf e. Ev lêker, destpêkirina tiştêkî an karekî îfade dike. Gava ku em li mînaka jorê binêrin em dibînin ku riste ji du hêmanan pêk tê: *Min dest pê kir* hevoka bingehîn e, *xwendin* hevoka tamamker e. *Xwendin* weke hevoka tamamker hatiye bikaranîn û di rola berkarê de ye. *Dest pê kir* jî lêkereke espektîf e ku dikare hevokên tamamker bistîne. Lê hevokên tamamker ên lêkera *destpêkirinê* ji hevokên tamamker ên din cûda ne. Ango hevoka tamamker (*xwendin*) ji aliyê dem û kes ve nehatiye kişandin.

1.1.2.2. Domdarî

Domkirina karekî diyar dike. Lêkerên mînak bo domdariyê ev in: *israrkirin*, *dewamkirin*.

(25)

a. *Wê israrkir go xwarinê bixwim.*

b. *Wê dewamî xwendina xwe kir.*

Israrkirin û *dewamkirin* lêkerên espektîf in. Domdariya karekî îfade dikin. Risteyên jorê mînakên aloz in ku ji lêkerên modalîteya espektîf (xuyang) pêk tên. Hevokên tamamker ên berkarî yê mînaka pêşî (*xwarinê bixwim*) kêşayî ye lê mînaka xwarê (*xwendin-a xwe*) nekêşayî ne.

1.1.2.3. Biserketin

Biserketin, pêkanîna karekî îfade dike. Lêkerên mînak bo biserketinê ev in: *serkeftin*, *pêkanîn*, *bibîranîn*.

(26) *Hat bîra wî go çaya xwe vexwe.*

Bibîranîn/Hatin bîra yekî/ê lêkereke modal a espektîf e. Serkeftina/hatina bîra yekî/ê ya tiştêkî/karekî tarîf dike. Risteya jorê aloz e ku ji lêkereke modal a espektîf pêk tê. Hevoka tamamker a berkarî *çaya xwe vexwe* lêkereke kêşayî dihewîne.

1.1.2.4. Qedandin

Xelaskirin an qedandina karekî diyar dike. Lêkerên bo qedandinê tên bikaranîn ev in: *qedandin, xelaskirin*.

(27) *We nivîsandin xelas kir.*

Xelaskirin lêkereke modal a espektîf e. Qedandin û bidawîbûna tişteki/kareki îfade dike. Mînak jorê risteya aloz e ku ji lêkera modal a espektîf pêk tê. Hevoka temamkera berkarî *nivîsandin* e û lêkereke nekêşayî ye.

1.1.2.5. Biserneketin

Biserneketin, pêkneanîna kareki îfade dike. Lêkerên mînak bo biserneketinê ev in: *biserneketin, jibîrkin, pêkneanîn*.

(28) *Min ji bîr kir go telefûnê te bikim.*

Jibîrkin lêkereke modal a espektîf e. Biserneketina kareki diyar dike. Risteya jorê risteyeke aloz e ku ji lêkera modal a espektîf pêk tê. Hevoka temamker a berkarî *telefûnê te bikim* ji lêkereke kêşayî pêk tê.

Mînakên risteyên aloz ên ku ji hevokên temamker ên modal pêk tînin metnên sahayî

(29)

- a. “*Nikarê eda bikê, va pera bidê.*” (Güneş 2013: 19)
- b. “*Rabû herdû keçê xwe kirne ber dewêr de.*” (Güneş 2013: 9)
- c. “*Piştî go keçê şexaliya xwe xilas kir.*” (Kaya 2013: 15)
- d. “*Dirist dixwazê pê ra biştexilê.*” (Arslan 2013: 17)
- e. “*Nikarim jêkim.*” (Arslan 2013: 9)
- f. “*Go rabû gotîyê da.*” (Arslan 2013: 8)
- g. “*Ez nikarim we herdoka bibim.*” (Derin 2013: 4)
- h. “*Go rabû mêrik çû hecê.*” (Derin 2013: 3)
- j. “*Go em karin ji te re bikelimînin.*” (Akıncı 2014: 8)

- k. “*Lê da baz da çû.*” (Altunışık 2013: 10)
- l. “*Rabû, meyîzand kete ber piştîyê xwe de.*” (Altunışık 2013: 10)
- m. “*Ti ji min çî dixwazê bixwaze.*” (Bulgan 2013: 20)
- n. “*Ma karin tişteki bikin?*” (Bulgan 2013: 20)
- p. “*Ew nikarin pê vedin.*” (Bulgan 2013: 20)
- r. “*De vêca qabûl neke vêca wê çilo çêbi.*” (Bulgan 2013: 10)
- s. “*Yanî ewî goman nedikir go dido bê.*” (Bulgan 2013: 11)
- t. “*Ew lêdan hatna walate Kurmanca.*” (Bulgan 2013: 11)
- v. “*Lêda çû Mekehê.*” (Bulgan 2013: 10)
- y. “*Rabû heme rahişte kurikê xwe...*” (Bulgan 2013: 11)
- z. “*Dibê serê sibehê rabûn çûne miqabilî wana...*” (Bulgan 2013: 14)

1.2. Lêkerên Pêhisîn-Pêzanîn-Vegotinê (Lêkerên “PPV”yê, PCU Verbs)

Lêkerên PPVyê em dikarin ji du aliyên ve pênasê bikin: pênasêya wateyî (semantical) û ya hevoksazî (syntactic). Taybetmendiyên Wateyî (Semantic) ên Lêkerên PPVyê (Givon 2001a: 153):

- a. Lêkera hevoka bingehîn rewşeke hizrî, bûyerekê an jî karekî îfade dike.
- b. Biker an kara (agent) ye an jî datîf (dative) e.
- c. Rewşa/bûyera hevoka temamker berkara rewşa/bûyera hevoka bingehîn e.

Taybetmendiyên Hevoksazî (Syntactic) ên Lêkerên PPVyê

- a. Ti astengiyên hev-referantiya bikera hevoka bingehîn û bikera hevoka temamker a berkarî nîn in.
- b. Hevoka temamker a berkarî bêtir di rewşa kêşayî de ne.
- c. Bikaranîna bingihanekê (ku/go) ne pêwîst e.

Lêkerên pêhisîn, pêzanîn û vegotinê dikarin hevokên temamker weke berkara xwe bistînin. Gava ku hevokên temamker ên berkarî distînin risteyên aloz der tene pêşberî me. Bikera lêkerên pêhisîn, pêzanîn an jî vegotinê karekî pêk tîne. Karê ku tê hisîn, zanîn an jî vegotin di hevoka temamker de diyar dibe. Ji ber vê yekê ye ku hevokên temamker ên lêkerên PPVyê weke berkarê tevdigerin. Ji bo baştir bê fêmkirin em ê taybetmendiyên lêkerên PPVyê bêjin û çend mînakên bidin. Lêkerên PPVyê dibin sê beş: lêkerên pêhisînê, lêkerên pêzanînê, lêkerên vegotinê.

1.2.1. Lêkerên Pêhisînê (Perception Verbs)

Lêkerên weke *dîtin*, *bihîstin* û *hiskirin* bi hesta hisînê ve têkildar in û ji van lêkeran re *lêkerên pêhisînê* tê gotin. Lêkerên pêhisînê dema ku piştî xwe hevokeke temamker distînin risteyên aloz pêk tînin (Bilbil 2017: 109). Ev hevokên temamker bi awayekî nerasterast di rola berkarê de ne. Bikaranîna bingihaneka *goyê* ne mecbûrî ye:

(30) *Ez dibînim go Serhed ça(yê) divexwa.*

Di vê risteya jorê de *Serhed ça(yê) divexwe* hevoka temamker e û bi awayekî nerasterast di rola berkarê de ye. Yanî ez tiştekî *dibînim* û ew tişt jî *vexwarina çayê ya Serhed* e. Herwiha gava ku em vê risteyê bikin dema borî em ê bibînin ku biker dikeve rewşa tewandî. Loma em fêm dikin ku lêker têper e, hevoka temamker jî berkara wê ye. Eger em hinek mînakên din bidin dê zelaltir bibe:

(31)

a. *Mi his kir go ew di sinifê de maya.*

b. *Zilam dît go ew çû.*

c. *Wê bihîstiya go ew xort hij jê dika.*

Dema di hevoka temamker a berkarî de peyvên pirsîyarîyê yên weke *kî*, *kîjan*, *çawa*, *çima* hebin, li dewsa bingihaneka *goyê* bi piranî peyva *bêyê* tê bikaranîn. Eger em heman hevokên temamker bi awayê pirsîyarî binivîsin ew ê wilo bin:

(32)

a. *Mi his kir bê, kîjan di sinifê de maya.*

b. *Zilam dît bê, çawa ew çû.*

c. *Wê bihîstiya bê, kîjan xort hij jê dika.*

Em dikarin pêhisînê bikin du beş (Givon 2001a: 155):

1.2.1.1. Pêhisîna Rasterast

Pêhisîna rasterast şahîdbûnê îfade dike. Ango gava ku karek an tiştek di pêkhatina xwe de bê dîtin an hiskirin di wir de pêhisîna rasterast li kar e.

(33) *Wê dît go ew ji malê derket.*

Bikera/datîfa vê risteyê (*wê*) *derketina wî ya ji malê* dibîne. Ango di wê hînê de dibe şahîde *derketinê*. Loma ev pêhisîn, pêhisîneke rasterast e.

1.2.1.2. Pêhisîna Nerasterast

Pêhisîna nerasterast şahîdbûnê îfade nake, ji dêvla wê ve deranîn û ferqkirinê diyar dike. Ango gava ku karek an tiştek di pêkhatina xwe de neyê dîtin lê paşî bê ferqkirin di wir de pêhisîna nerasterast li kar e (Güneri 2018: 111).

(34) *Wê dît go ew ji malê derketiya.*

Bikera/datîfa vê risteyê (*wê*) *derketina wî ya ji malê* nabîne. Ango di wê hînê de nabe şahîde *derketinê*. Bikera vê risteyê paşî ferq dike ku *derketin* pêk hatiye. Li gor rewşê û deranînan, karê ku di hevoka temamker a berkarî de diqewime ferq dike.

Di xebatên meydanî de jî lêkerên *dîtin* û *bihîstinê* weke du lêkerên pêhisînê bi bikaranîna xwe ya zêde balê dikişînin. Di devoka Torê de ji devla lêkera dîtinê ve lêkera *meyizandinê* tê bikaranîn. Bikaranîna lêkera *meyizandinê* di metnên sahayî de balê dikişîne:
(35)

a. “*Go çû meziya go şimikkî tê de, şewq jê diçe.*” (Güneş 2013: 11)

b. “*Dimeyzênê gava gustîlka Zeynikê ye.*” (Kaya 2013: 19)

c. “*Meyîzand go yekî ixtiyar pişta soba hunduru runiştîya.*” (Arslan 2013: 19)

- d. “*Kurê axa dibîne ne bi dilekî bi heft dila dil kevîyê da.*” (Arslan 2013: 10)
- e. “*Diçe dimeyzêne li keviya bejekê sîngê gemiya xwe diçikênê.*” (Derin 2013: 4)
- f. “*Go mêzand di pişt jinbava xwe de ye.*” (Akıncı 2014: 15)
- g. “*Te dîtiye ev kurik ketiye berê te de?*” (Akıncı 2014: 15)
- h. “*Belqiya meyîzand mêşke hingiv dikevî qulekê.*” (Bulgan 2013: 19)
- i. “*His kir go wê jinbava wê çêleka zer gurênî...*” (Bulgan 2013: 16)
- î. “*Min dît go ew ne-l wir e.*” (Güneri 2018:40)

1.2.2. Lêkerên Pêzanîne (Cognition Verbs)

Lêkerên weke *zanîn*, *fêmkirin*, *texmînkirin*, *bawerkirin*, *jîbîrkirin*, *ferqkirin*, *gomankirin* ku têkildarî mekanîzmayên zanîna mirovan in, lêkerên pêzanîne ne. Lêkerên pêzanîne dema ku piştî xwe hevokeke tamamker a berkarî distînin risteyên aloz pêk tînin. Weke berê jî hat gotin, ew hevokên tamamker di rola berkarê de ne. Bikaranîna bingihaneka *goyê* ne pêwîst e. Di nava lêkerên PPVyê da kategorîya herî berfireh a van cure lêkeran e û mînakên wê zehf in (Bilbil 2017: 110):

(36)

- a. *Ez zanim go Hesên xêni xira kiriya.*
- b. *Ew bahwer dikin rokê ew ê jî azad bin.*
- c. *Mi texmîn kir go te wilo kiriya.*
- d. *Ehmed fêmkirin kir go êdî tiştên çûyî bes divegerin.*
- e. *Mke ji bîr kir go ti hatiya.*
- f. *Zava ferq kir go zêr zahf biha bûya.*

Dema em li xebatên meydanî dinêrin em dibînin ku li devera Torê lêkerên pêzanîne gelekî tînin bikaranîn. Bi taybetî lêkerên *zanîn* û *fêmkirinê* zehf tînin bikaranîn:

(37)

- a. “*Hakim zanê go xedrê me lê bê.*” (Güneş 2013: 20)
- b. “*Go mi zanîbû ew dims e.*” (Kaya 2013: 12)
- c. “*Fêm dike go hêka neamaya.*” (Arslan 2013: 10)
- d. “*Ti dizanî go çi ya?*” (Arslan 2013: 21)
- e. “*Axa zanê kîjan herbê dikê.*” (Derin 2013: 13)
- f. “*Hûn nizanin çirokeke me bêjin?*” (Akıncı 2014: 8)
- g. “*Heso bawer kiriye bi rastî jî yê li pişta wî Şêxşêban e.*” (Altunışık 2013: 9)
- j. “*Jinik fêhm dikî û diberdî dik.*” (Bulgan 2013: 18)
- k. “*Nizanî şer bikî.*” (Bulgan 2013: 14)
- l. “*Nizanim çawa kir.*” (Bulgan 2013: 13)
- m. “*Ber kes nizanibî strihe mi heye.*” (Bulgan 2013: 10)
- n. “*Zanibe rojkê ew heyf li ardê namênî.*” (Bulgan 2013: 21)

Lêkerên *meyizandin* û *eyşandinê* her çend weke lêkerên pêhisînê xwuya dikin jî gelek caran di rola lêkerên pêzanînê de jî tên bikaranîn. Lêkerên *meyizandin* û *eyşandinê* jî weke risteyên jorê dikarin piştî xwe hevokeke temamker a berkarî bistînin. Lêkerên *meyizandin* û *eyşandinê* di rola pêzanînê de weke lêkerên *fêmkirin* û *dîtînê* tên bikaranîn. Lêkera *eyşandinê* di wateya ferqkirin û pêhisînê de tê bikaranîn. Bi piranî Çiyayiyên Torê vê peyvê bi kar tînin k(Güneri 2018: 111). Tiştê balkêş ew e ku di rewşeke normal de lêkera *meyizandinê* her çend têper e jî nikare berkareke rasterast bistîne. Lê dema ku di wateya *fêmkirinê* de tê bikaranîn, çawa ku lêkera *fêmkirinê* dikare berkareka rasterast di forma hevoka temamker de bistîne, lêkera *meyizandinê* jî dema ne di wateya xwe ya eslî de be, ew jî dikare hevokeke temamker ku teqabulî berkarê ye, bistîne:

(38)

- a. *Mi meyizand go rewş xirab a.* (Min fêm kir ku rewş xirab e.)
- b. *Rojîn meyizand go xisareke mezin kiriya.* (Keçik fêm kir ku wê xisareke mezin kiriye.)
- c. *Mi eyşand go ew çû.* (Min dît ku ew çû.)

Çend mînak ji metnên meydani:

(39)

a. “*Meyizandin va ye di nav bê de dengik tê...*” (Bulgan 2013: 22)

b. “*Meyizandin go heqeten mehîne wî avêtiye.*” (Bulgan 2013: 11)

1.2.3. Lêkerên Vegotinê (Utterance Verbs)

Lêkerên vegotinê axaftinê neqil dikin. Ango yek axaftina yekî/a din bi awayên cûda dikare veguhezîne. Dema ku di risteyekê de axaftina hin kesan cih bigire û ew axaftin di forma risteyê de be, ew riste jî dibe risteyeke aloz. Kesê veguhêz yanî axêver dikare wan axaftinên ku ne yên wî ne, bi du awayan veguhêzîne; veguhastina rasterast û veguhastina nerasterast (Givon 2001a: 155). Di her du rewşan de jî hevokên temamker ku hatine veguhastin, ji aliyê rola rêzimanî ve berkarên rasterast in. Weke mînak dema em bibêjin: *Hedil got, ez mirim* hevoka temamker *ez mirim* berkara rasterast e. Ji ber ku em dizanin lêkera *gotinê* têper e û mirov tiştêkî dibêje û risteyeke weke ya jorê de *ez mirim* teqabulî wî tiştê ku hatiye gotin e (Bilbil 2017: 112). Weke me got veguhastinên kesên din dikarin bi du awayan bînin gotin:

1.2.3.1. Vegotina Rasterast

Di vegotina rasterast de dema ku gotina kesên din tên veguhastin kesên din ew gotin bi çî awayî gotibin kesê veguhêz wê gotinê bi heman awayî dibêje û guhartinê tê de çênake:

(40)

a. *Ehmed gote min “Ez siba nayêm.”*

b. *Me got “Çima hûn nehatina?”*

c. *Wê got “Min zahf hij te dikir.”*

Di van mînakên de hevoka temamker a berkarî di navbera dunikê de hatiye bikaranîn. Hevok çawa ji devê *Ehmed* (axêver) derketibe wilo hatiye neqilkirin. Ango ti guhertin çênebûye.

1.2.3.2. Vegotina Nerasterast

Dema ku gotin û axaftin ji alîyê veguhêz ve bi awayekî nerasterast bê veguhastin, êdî veguhêz wê guhastinê bi peyvên xwe dike û hin guhertin di wan axaftinan de çêdibe ku bi awayekî nerasterast tên guhastin (Bilbil 2017: 113). Herwiha bingihaneka *ku/goyê* ji bo van bikaranînên nerasterast tê bikaranîn (Aydoğan 2013: 144). Eger axaftina ku tê veguhastin pirsîyarî be, ji dêvla *goyê bê* tê bikaranîn. Eger em wan mînakên jorê bi awayê veguhastina nerasterast bibêjin dê wilo bin:

(41)

a. *Ehmed gote min “Ez siba nayê.”*

b. *Ehmed gote min go ew siba nayê.*

(42)

a. *Me got “Çima hûn nehatina?”*

b. *Me got bê çima hûn nehatina.*

(43)

a. *Wê got “Ez zahf hij te dikim.”*

b. *Wê got ew zahf hij te dika.*

Gava ku em li mînakên jorê dinêrin em dibînin ku risteyên (41,42,43.a)yê mînakên veguhastina rasterast in. Ji ber ku veguhêz tu guhertin di axaftin, peyv û hevoka axêver de nekiriye. Gava ku veguhêz di axaftin, peyv û hevokên axêver de guhertinan dike hînga weke mînakên (41,42,43b)yê vaguhastina nerasterast pêk tê. Ji bo baştir bê fêmkirin em ê bi hûrgilî li ser mînakekê bisekinin û ferqa her du cureyên veguhastinê eşkere bikin:

(44)

a. *Wê got: “Ez bawer im.”*

b. *Wê got ez bawer im.*

Risteya (44.a)yê mînaka veguhastina rasterast e. Hevok weke ku hatiye hiskirin hatiye veguhastin. Axêver (yê ku gotiye) û kirde (yê ku bawer e) heman kes in. Beravajiyê vê, risteya (44.b)yê mînaka veguhastina nerasterast e. Hevok ne weke forma eslî hatiye veguhastin, veguhêz guhertin di hevokê de kiriye. Axêver (yê ku gotiye) û kirde (yê ku bawer e) ne heman kes in. Axêver û veguhêz du kesên cihê ne.

Çend mînak ji metnên meydani:

(45)

- a. “Go birayê mi gotibû ez ê hingulîska xwe dime te.” (Güneş 2013: 16)
- b. “Go: Hermet çêleka me ya devê me ye.” (Güneş 2013: 9)
- c. “Go: Heyra bi xwedê ez hatim.” (Kaya 2013: 12)
- d. “Xerat dibê wala heyra deng ji vê darê tê.” (Arslan 2013: 9)
- e. “Hate cem min û got ez birçî me.” (Derin 2013: 8)
- f. “Keçikê got: “Birayên min bisekinin.” (Akıncı 2014: 8)
- g. “Ewa gotnê: go heyra wilo meke.” (Bulgan 2013: 22)
- h. “Siltan Hesên got: evd benî evd.” (Bulgan 2013: 11)
- j. “Rizg got go ji mi mêrtir hin hene ecêba.” (Bulgan 2013: 22)
- k. “Jê re got go here mehîna Şerîfê Mekehê ji min re werêne.” (Bulgan 2013: 10)

Li gorî Talmy Givon (2001a: 154) lêkerên PPVyê dikarin bibin gelek binbeş. Em bi mînakan hinekî li ser binbeşên lêkerên PPVyê rawestîna dê qencîr be.

1.2.4. Lêkerên Faktîf

Lêkerên faktîf ew lêker in ku dema hevoka wan a temamker a berkarî rast e, hevoka bingehîn rast an çewt be jî. Ango hevoka temamker a berkarî li gorî hevoka bingehîn tevnagere. Rastiya xwe diparêze. Herwiha lêkerên faktîf ew lêkerên ku hevoka wan a temamker çewt e hevoka bingehîn rast an çewt be jî. Ango çewtbûna wê ji hevoka bingehîn bandora nagire (Givon 2001a: 154). Lêkerên faktîf dibin du beş: lêkerên faktîf ên erênî, lêkerên faktîf ên neyînî.

1.2.4.1. Lêkerên Faktîf ên Erênî

Gava ku hevoka bingehîn rast an çewt be hevoka temamker a berkarî jî rast e. Lêkerên weke *zanîn*, *fêmkirin*, *‘elimîn*, *dîtin*, *jibîrkirin* mînakên lêkerên faktîf ên erênî ne.

(46)

a. *Wê zanîbû Ehmed hij jê dika.* (Ehmed hij jê dike.)

b. *Wê nizanîbû Ehmed hij jê dika.* (Ehmed hij jê dike.)

Di mînaka (46.a)yê de hevoka bingehîn *wê zanîbû* rast e (pêk hatiye), hevoka temamker a berkarî *Ehmed hij jê dika* jî rast e (pêk hatiye). Di mînaka (46.b)yê de hevoka bingehîn *wê nizanîbû* çewt e (pêk nehatiye), hevoka temamker a berkarî *Ehmed hij jê dika* dîsa rast e. Ango di lêkerên faktîf ên erênî de hevoka bingehîn tu divê rast an çewt be lê hevoka temamker a berkarî bi her awayî rast e, ango pêk hatiye.

1.2.4.2. Lêkerên Faktîf ên Neyînî

Gava ku hevoka bingehîn çewt an rast be lê hevoka temamker a berkarî çewt be ev dibe mînaka lêkerên faktîf ên neyînî. Lêkerên weke *ferz kirin*, *derewkirin* mînakên lêkerên faktîf ên neyînî ne.

(47)

a. *Wî ferz kir go ez wî nas dikim.* (Ez wî nas nakim.)

b. *Wî ferz nedikir go ez wî nas dikim.* (Ez wî nas nakim.)

Di mînaka (47.a)yê de hevoka bingehîn *wî ferz kir* rast e (pêk hatiye), hevoka temamker a berkarî *ez wî nas dikim* çewt e (pêk nehatiye). Di mînaka (47.b)yê de hevoka bingehîn *wî ferz nedikir* çewt e (pêk nehatiye), hevoka temamker a berkarî *ez wî nas dikim* dîsa çewt e (pêk nehatiye). Ango di lêkerên faktîf ên neyînî de hevoka bingehîn çewt be bila be lê hevoka temamker a berkarî çewt e, pêk nayê.

1.2.5. Lêkerên Nefaktîf

Lêkerên modal ên ku nabin faktîf, nefaktîf in. Di bikaranîna lêkerên nefaktîf de tiştekî weke yên faktîf ne mewcûd e. Ango rastbûn û çewtbûna hevoka temamker a berkarî dikeve bin bandora hevoka bingehîn (Givon 2001a: 154). Lêkerên faktîf li gorî wateya xwe dibin bu beş: lêkerên nefaktîf ên erênî, lêkerên nefaktîf ên neyînî.

1.2.5.1. Lêkerên Nefaktîf ên Erênî

Lêkerên nefaktîf ên erênî pirtir wate û texmînên erênî ku dibe ku pêk hatibin an pêk werin îfade dikin. Lêkerên mînakên lêkerên nefaktîf ên erênî ev in: *fikirîn, bawerkirin, texmînkirin, gomankirin, zenkîrîn, hêvîkîrîn, bîryardan, xwestin, pejirandin, bihîstin, hiskîrîn, hîskîrîn, îddiakîrîn, pîrsîn*. Weke mînak; *Ez bawer dikim go ew hatiya*. Lêkera bîngêhîn *bawerkirin* e, lêkereke nefaktîf e. Di mînakê de *bawerkirin* pêk hatiye, lê em nizanin go *hatin* pêk hatiye an nehatiye. Neyîniya vê hevokê ev e: *Ez bawer nakim go ew hatiya*. Di mînakê *bawerkirin* pêk nehatiye. Weke mînaka pêşî, em nizanin ku *hatin* pêk hatiye an nehatiye. Weke ku ji her du mînakan xwuya ye, pêkhatina hevoka temamker a berkarî ne girêdayî hevoka bîngêhîn e.

1.2.5.2. Lêkerên Nefaktîf ên Neyîni

Lêkerên nefaktîf ên neyîni pirtir wate û texmînên neyîni ku dibe ku pêk hatibin an pêk werin diyar dikin. Lêkerên mînakên lêkerên nefaktîf ên neyîni ev in: *meraqkîrîn, redkîrîn, înkarkîrîn*. Weke mînak; *Ez merak dikim go ew çûya*. Di mînakê de lêkera bîngêhîn *meraqkîrîn* e, lêkereke nefaktîf e. Lêkera *meraqkîrînê* pêk hatiye. Lê em nizanin ku *çûn* pêk hatiye an nehatiye. Neyîniya vê hevokê ev e: *Ez merak nakim go ew çûye*. Di vê mînakê de *meraqkîrîn* pêk nehatiye. Weke mînaka pêşî, em nizanin ku *çûn* pêk hatiye an nehatiye. Weke ku ji van mînakan diyar e, pêkhatina hevoka temamker a berkarî ne girêdayî hevoka bîngêhîn e.

Herwiha li gorî Givon (2001a: 155) em dikarin lêkerên PPVyê wilo jî dabeş bikin:

1.2.6. Lêkerên Epîstemîk (Epistemic Verbs)

Lêkerên epîstemîk behsa hin aliyên rastî, zanyarî, bawerî û teqeziyê dikin. Lêkerên weke *fikirîn, bawerkirin, texmînkirin, bîryardan, bihîstin, hiskîrîn, hîskîrîn, gotin, îddiakîrîn, pejirandin, meraqkîrîn, redkîrîn* mînakên lêkerên epîstemîk in. Weke mînak; *Mi texmîn kir go ew e*. Di vê mînakê de lêkera bîngêhîn *texmînkirin* e. *Texmînkirin* zanyarî û baweriya axêver îfade dike. Lewma lêkereke epîstemîk e.

1.2.7. Lêkerên Deontîk (Deontic Verbs)

Lêkerên deontîk bêtir behsa viyan û tercîhan dikin. Lêkerên weke *xwestin* û *hêvîkirinê* mînakên lêkerên deontîk in. Weke mînak; *Mi hêvî dikir go ew neçe*. Di vê mînakê de lêkera bingehîn *hêvîkirin* e. *Hêvîkirin* viyan û tercîha axêver tîne ziman. Lewma, ev lêker, lêkereke deontîk e.

1.3. Lêkerên Manîpûlatîf (Manipulative Verbs)

Lêkerên ku wateya manîpûlekirinê dihewînin lêkerên manîpûlatîf in. Weke minak; *kirin, hiştin, gotin, xwestin, fermankirin* û hwd. wateyên manîpûlekirinê dihewînin. Manîpûlasyon (manipulation) awayek ji awayên çêkirina kausatîfîyê (causativity) ye (Bilbil 2017: 120). Di kurmancî de kausatîf teqabûlî peyva dançêker/dankirinê (ettirgen) ye. Ango di dançêkirinê de yek dike ku yekî/a din karekî bike. Bandora mirovekî/ê li ser miroveke din heye (Yıldırım 2012: 106). Lêkerên weke *kirin, hiştin/hêlan/hêliştin, xwestin* û hwd. mînakên lêkerên manîpûlatîf in. Lêkerên manîpûlatîf piştî xwe dikarin hevokên tamamker ên berkarî bistînin. Hevoka bingehîn lêkera manîpûlatîf dihewîne, hevoka tamamker a berkarî jî hevoka bingehîn ji aliyê binyad û wateyê ve tamam dike. Lewma em hevokên tamamker ên lêkerên manîpûlatîf weke berkarê qebûl dikin. Weke mînak; *Min kir ku xwişka min biçe malê* lêkera *kirinê* di fonksiyona manîpûlatîf de ye û hevoka *xwişka min biçe malê* jî hevoka tamamker e ku teqabulî rola berkarê ye. Yanî *min tişteke kir* û ew *tişt* jî *çûna xwişka min a malê* ye. Loma lêkerên manîpûlatîf piştî xwe dema ku hevokeke tamamker distînin ew hevok di peywira berkarê de ye. Niha, em ê çend mînakên manîpûlatîf bidin da ku mijar zelaltir bibe:

(48)

a. *Axe kir go gundî ji gund bar kin.*

b. *Ehmed kir go Cîhan baz de.*

Di van risteyan de lêkera *kirinê* bi peywira manîpûlatîfîyê hatiye bikaranîn, du pêkhênên sereke hene di van mînakên de: Yek jê manîpûleker (manipulator) e ya din jî manîpûleber (manipulee) e û manîpûleker tevgera manîpûleber manîpûle dike (Bilbil 2017: 121). Li gorî mînaka jorê *Ehmed kir go Cîhan baz de*, manîpûleker *Ehmed* e, *Cîhan* jî manîpuleber e. Ango *Ehmed* karê ku *Cîhan* pêk tîne manîpûle dike. Bi gotineke din, bandora

Ehmed li ser karê *Cîhan* heye. Lêkera *kirinê* ne tenê di zimanê kurdî de lê di gelek zimanên dinyayê de jî, di dançêkirinê (causativity) de tê bikaranîn. Di zimanên weke romanî, îngilîzî, koreyî, tamîlî, teleguyî, îndonezî, jakalteyî, yûnanîya nû, tayî û gelekên din de jî lêkera *kirinê* vê fonksiyonê dibîne (Moreno 1993: 155). Givon lêkerên manîpûlatîf gava ku dinasîne behsa du cur taybetmendiyan dike: taybetmendiya sîmantîk û sîntaktîk (2001b: 41).

Taybetmendiya Sîmantîk ên Lêkerên Manîpûlatîf

a. Hevoka bingehîn xwediyê karayeke mirovî ye ku tevgera mirovekî/ê din manîpûle dike.

(49) *Bavê min kir go pale rûnên.*

Di vê mînakê de *bavê min* karaya hevoka bingehîn e û karayeke mirovî ye. Ev kara tevgera *paley* manîpûle dike.

b. Manîpûlebera hevoka bingehîn bi bikera hevoka temamker a berkarî re *hev-referant* e.

(50) *Min hişt go Rojîn biştxle.*

Di vê risteyê de manîpûleker *min* e, manîpûleber jî *Rojîn* e. Manîpûlebera hevoka bingehîn *Rojîn* û bikera hevoka temamker a berkarî *Rojîn* heman kes in. Ji ber ku hev-referant in berkara lêkera hevoka bingehîn ketiye lê bikera lêkera hevoka temamker a berkarî neketiye.

c. Hevoka temamker a berkarî armanckê diyar dike ku divê manîpûleber pêk bîne.

(51) *Serokkomar kir go gel bisekine.*

Di vê mînakê de *gel bisekine* hevoka temamker a berkarî ye. *Sekinîna gel* armanca manîpûleker (*serokkomar*) e ku manîpûleber (*gel*) pêk tîne.

Em bi mînakeke din binyad û wateya lêkerên manîpûlatîf rave bikin dê baştir be:

(52) *Mamoste kir go ez kopya nekişênim.*

Mamoste: manîpûleker e û bikera hevoka bingehîn e.

kir: lêkera hevoka bingehîn e.

ez: manîpûleber e û bikera hevoka temamker a berkarî ye.

nekişênim: lêkera hevoka temamker a berkarî ye.

Taybetmendiye Sîntaktîk ên Lêkerên Manîpûlatîf

a. Karaya hevoka bingehîn bikera bingehîn e.

(53) *Min hêlişt go birayê min çayê vexwe.*

Di vê mînakê de karaya hevoka bingehîn *min*, di heman demê de bikera hevoka bingehîn e.

b. Manîpûlebera hevoka bingehîn an berkara rasterast e an jî berkara nerasterast e.

(54) *Mela kir go orencî hiş bin.*

Di vê risteyê de *orencî* manîpûlebera hevoka bingehîn e û berkara rasterast a hevoka bingehîn e.

c. Manîpûleber hem berkara hevoka bingehîn e hem jî bikera hevoka tamamker a berkarî ye. Ango hev-referant e.

(55) *Diya min kir go xwişka min karê xwe zû biqedîne.*

Xwişka min manîpûleber e. Di heman demê de hem berkara hevoka bingehîn e hem jî bikera hevoka tamamker a berkarî ye. Di her du hevokan de hev-referant e.

d. Lêkera hevoka tamamker a berkarî ji aliyê kes û demkê ve kêşayî ye.

(56) *Mamoste qedexe kir go em biştexilin.*

Biştexilin lêkera hevoka tamamker a berkarî ye. Li gorî kesê yekem ê pirjimar û dema bê hatiye kişandin.

Li gorî Givon (2001a:151) çar cureyên manîpûlasyonê hene:

1.3.1. Manîpûlasyona Serkeftî

Lêkerên manîpûlasyona serkeftî bi navê împlîkatîf (implicative) jî tên zanîn. Di manîpûlasyona serkeftî de gava hevoka bingehîn pêk were divê hevoka tamamker a berkarî jî pêk were (Givon 2001a: 153). Lêkerên mînak: *kirin*, *alîkirin*, *hiştin/hêlan/hêliştin*, *qanihkirin*, *han dan*, *pêkanîn*, *xapandin*.

(57) *Bavê min alî kalikê min kir go xwe tiraş bike.*

Ji ber ku *alîkirin* lêkereke manîpûlasyonê serkeftî ye karê hevoka temamker a berkarî pêk tê. Ango bi *alîkirinê tiraşkirin* pêk hatiye.

1.3.2. Astengkirina Serkeftî

Di astengkirina serkeftî de gava hevoka bingehîn pêk were divê hevoka temamker a berkarî pêk newe. Ango pêkhatina hevoka bingehîn rê li ber pêkhatina hevoka temamker a berkarî digire. Lêkerên mînak: *pêşî birîn, sekinandin, texilandin, tirsandin.*

(58) *Min ew tirsand go sond bixwe.*

Tirsandin lêkereke serkeftî ya astengkirinê ye lewma karê hevoka temamker a berkarî *sondxwarin* pêk nehate. Ango karê hevoka temamker a berkarî hatiye astengkirin.

1.3.3. Manîpûlasyonê Teşebûsî

Lêkerên manîpûlasyonê teşebûsî bi navê neîmplîkatîf (non-implicative) jî tên zanîn. Di manîpûlasyonê teşebûsî de pêkhatina hevoka bingehîn pêwîstiyê li pêkhatina hevoka temamker a berkarî nake. Lêkerên mînak; *gotin, destûr dan, hiştin/hêlan/hêliştin, pirsîn, pêşniyarkirin, lavakirin, xwestin, hêvikirin, fermankirin.*

(59) *Wê lava kiribû go ew zû biçin cem wê.*

Di manîpûlasyonê teşebûsî de pêkhatina hevoka bingehîn pêkhatina hevoka temamker a berkarî mecbûr nake. Ango di mînaka jorê de *lavakirin* pêk hatiye. Lê em nizanin ku *çûn* pêk hatiye an nehate.

1.3.4. Astengkirina Teşebûsî

Di astengkirina teşebûsî de pêkhatina hevoka bingehîn rê li ber pêkhatina hevoka temamker a berkarî nagire. Lêkerên mînak: *qedexekirin, menihkirin.*

(60) *Hikûmeta nû qedexe kir go gel biçe mitîngan.*

Di astengkirina teşebûsî de pêkhatina hevoka bingehîn pêkhatina hevoka temamker a berkarî diyar nake. Ango di mînaka jorê de *qedexekirin* pêk hatiye. Lê em nizanin ku *çûna mîtîngan* pêk hatiye an nehatiye.

Li gel ku çar cureyên manîpûlasyonê hene jî bikaranîna lêkerên manîpûlatîf û têkiliya di navbera wan de ne bi heman awayî ye. Bandora manîpûleker di hemû hevok û lêkeran de ne bi heman rengî ye. Ango bandora manîpûleker ku li manîpûleber dike li gorî lêker û risteyê diguhere. Em ê di beşên din de bêtir li ser vê mijarê rawestin. Lê dîsa jî ji bo ku li ber çavan be em ê çend risteyên manîpûlatîf li jêr rêz bikin:

(61)

- a. *Diya wê nahêle go keçik bi yê dilê xwe re bizewice.*
- b. *Ehmed misade kir go zarok derbasî hundir bin.*
- c. *Bavê mi izin da go ez bi ya dilê xwe re bizewicim.*
- d. *Pêxember yesaq kir go em şerabê vexwin.*
- e. *Muxtar rica kir go keçika wî derî asê bike.*
- f. *Min hêvî kir go Elî nameyê binivîsîne.*

Dema em li xebatên sahayî dinêrin kem dibînin ku gelek mînakên lêkerên manîpûlatîf hatine bikaranîn û bi taybetî zêdebûna bikaranîna lêkera hiştin/hêlanê pir balê dikişîne:

(62)

- a. *“Ez nahêlim go bigihê vî kurkî.”* (Kaya 2013: 21)
- b. *“Wala ez nahêlim ti herê.”* (Derin 2013: 5)
- c. *“Ez dixwazim go ti mi ra werê.”* (Derin 2013k: 3)
- d. *“Povzêrîna destê xwe kire qirqa cêlîka wê de nehişt kuzîn jê werê.”* (Akıncı 2014: 25)
- e. *“Rabe lave dikim tu herî ciya xwe j imin re bênê.”* (Akıncı 2014: 16)
- f. *“Ji wan re tembih kir ku tu zerarê nedin mala Biro.”* (Altunışık 2013: 9)
- g. *“Tu çi bêje ez e bi cih bênim.”* (Altunışık 2013: 9)

h. “*Nahêlî go bê.*” (Bulgan 2013: 17)

j. “*E nahêlim go bigihê vî kurkî.*” (Kaya 2013: 21)



BEŞA DIDUYAN

2. BIYEKBÛNA BINYADÎ DI HEVOKÊN TEMAMKER ÊN BERKARÎ DE

Di vê beşê de em ê bêtir bala xwe bidin binyada (morphology) hevokên tamamker ên berkarî. Hevokên tamamker ên berkarî heman qertafan nagirin. Ango ji aliyê binyadî (morphologic) ve hevokên tamamker ên berkarî cihê ne. Hevokên tamamker ên berkarî ji aliyê morfolojîk ve dibin sê beş: hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî (subjunctive), hevokên tamamker ên berkarî yên raweyên pêşkerî (indicative) û hevokên tamamker ên berkarî yên navdêrandî (nominalized). Hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî qertafa *bi*-yê digirin. Ango bi qertafa dema bê re tîk bikaranîn. Lêkerên modal û yên manîpûlatîf pirtir bi hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî re tîk bikaranîn. Hevokên tamamker ên berkarî yên bi raweyên pêşkerî (dema niha, dema borî û hwd.) û lêkerên PPVyê re tîk bikaranîn. Lêkerên PPVyê dikarin hevokên tamamker ên berkarî yên raweyên pêşkerî bistînin. Ya sisêyan, hevokên tamamker ên berkarî yên navdêrandî weke ku ji peyvê diyar e navdêr in. Ango peyv bi eslê xwe ve lêker be jî, qertafên navdêran distîne û weke navdêran tê bikaranîn. Em ê pêşî li ser hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî rawestin û derbasî yên din bibin.

2.1. Hêvokên Temamker ên Berkarî yên Raweya Daxwazî (Subjunctive)

Lêkerên modal û manîpûlatîf hevokên tamamker ên berkarî yên ku bi raweya daxwazî re distînin. Hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî bi piranî bi koka dema niha (Haig&Opengin 2015: 27) re tîk bikaranîn. Berî koka lêkerê, qertafa *bi*-yê tê bikaranîn (Noorlander 2014: 209). Bikera hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî xwerû ne, anga ne tewandî ne (Matras 1997: 628). Em ê çend mînakên bidin û bikaranîna hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî bi lêkerên ku hevokên tamamker ên berkarî distînin rave bikin. Çend mînakên ku hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî li jêrê hatine rêzkirin. Gava ku yek bi baldarî li mînakên jêrê binêre ew ê ferq bike ku lêkerên hevokên tamamker ên berkarî bi qertafa *bi*-yê re hatine pêvgirêdan. Hevokên tamamker ên berkarî yên

raweya daxwazî di mînakên (63.a) û (63.b)yê de bi lêkerên modal re û di (63.c) û (63.d)yê de bi lêkerên manîpûlatîf re hatine bikaranîn.

(63)

a. *Min dixwest bi-ştexlim.*

b. *Ez dikarim nameyekê bi-nîvisînim.*

c. *Min kir go makîne bi-şuxila.*

d. *Min hêlişt go ew kitêbê bi-xwîna.*

Di mînakên (a. û b.) jorê de lêkerên *xwestin* û *karin* lêkerên bingehîn in. Her du jî lêkerên modal in. Hevokên temamker ên berkarî yên van her du mînakên (*bi-ştexlim*, *bi-nivîsim*) jî qertafa *bi-yê* girtine. Di mînakên (c. û d.) de lêkerên kirin û hêliştin lêkerên bingehîn in. Her du jî lêkerên manîpûlatîf in. Hevokên temamker ên berkarî di van mînakên (*bi-şuxila*, *bi-xwîna*) de dîsa qertafa *bi-yê* girtine.

2.1.1. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Subjunctive û Lêkerên Modal

Weke ku me berî niha jî got, lêkerên modal hevokên temamker ên berkarî yên raweya daxwazî distînin. Em ê li jêrê li ser çend mînakên rawestînin (Güneri 2018: 114-115).

(64)

a. *Ez pênc sala nikarim bimênim.*

b. *Mi dixwest ez biçim malê.*

c. *Mi dixwest ez biçikê qelew (bi)bim.*

d. *Mi xwest ez mektebê xelas (bi)kim.*

e. *Wî dixwest biçu malê.*

f. *Mi dixwest go çayê birijînim.*

Ev mînak hemû ji hevokên temamker ên berkarî yên raweya daxwazî pêk tên. Bikera hevoka bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî hev-referant in. Herwiha lêkerên bingehîn *karin* û *xwestin* in û lêkerên *karin* û *xwestinê* modal in. Lê hemû mînak ne bi heman rengî ne. Di (64.a)yê de lêkera bingehîn *karin* e, *karin* lêkerekê modal û têper e. Bikera bingehîn *ez* e. Lêkera hevoka temamker a berkarî *mayîn* e, *mayîn* lêkerekê netêper e. Bikerên her du lêkeran hev-referant in. Bikera bingehîn hatiye bikaranîn lê ya hevoka temamker a berkarî nehatiye bikaranîn, ango ketiye. Herwiha bingehaneke *goyê* di vê hevokê de nehatiye bikaranîn. Di

(64.b)yê de lêkera bingehîn *xwestin* e, *xwestin* lêkereke modal û têper e. Bikera bingehîn *min* e. Lêkera hevoka tamamker a berkarî *çûn* e, *çûn* lêkereke netêper e. Bikera bingehîn û hevoka tamamker a berkarî hev-referant in. Her du biker jî hatine bikaranîn. Lê bingihaneka *goyê* nehatiye bikaranîn. Di (64.c)yê de biker *mi(n)* ye. Lêkera bingehîn *-xwestin-* têper e û ya hevoka tamamker a berkarî *-qelewbûn-* netêper e. Bikerên her du lêkeran jî eynî ne, ango hev-referant in. Bikera her du hevokan hatiye bikaranîn, yanî ji hevokê neketiye. Herwiha bingihanek jî nehatiye bikaranîn. Di (64.d)yê de bikera bingehîn *mi(n)* ye. Lêkera bingehîn têper e û ya hevoka tamamker a berkarî netêper e. Bikerên her du lêkeran hev-referant in. Bikera her du hevokan jî hatiye bikaranîn. Encama ravekirina vê mînakê ev e: Gava ku lêkera bingehîn modal be û hevoka tamamker a berkarî bi raweya daxwazî be ketina bikeran rû dide. Pirtir gava ku lêkera bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî nêzîkî hev bin ketin xurttir e. Bikerên lêkerên netêper ên hevokên tamamker ên berkarî carinan dikevin. Gava ku lêkera hevoka tamamker a berkarî netêper be bikera kesê yekem dimîne lê kesê sêyem dîsa dikeve (binêre: minaka 64.e). Gava ku kesê yekem bi lêkerên têper ên hevokên tamamker ên berkarî re tê bikaranîn bikera hevoka tamamker a berkarî dikeve lê bingihaneka *goyê* tê bikaranîn (minaka 64.f). Ango biyekbûna (integration) risteyên ku bikerên wan kesê sêyem in û hevokên tamamker ên berkarî têper in, bêtir e (Matras 1997: 629).

Li gorî qanûna ketina bikerên hevpar (Common Subject Deletion), gava ku lêkerên dikarin hevokên tamamker ên berkarî bistînin xwedî bikerên hevpar bin, bikerek dikeve. Bi gotineke din, gava ku bikera hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî heman kes be, bikera hevoka tamamker a berkarî ji hevokê dikeve (Güneri 2018: 136). Lê gava ku em li mînakên jorê binêrin em dibînin ku ev qayde pêpes bûye. Dema em li mînakên 64.b, 64.c û 64.d yê binêrin em ê bibînin ku bikerên hevpar neketine.

2.1.2. Hevokên Temamker ên Berkarî yê Subjunctive û Lêkerên Manîpûlatîf

Gava ku lêkera bingehîn manîpûlatîf be hev-referantî pêk nayê. Lewma ketina bikeran gelekî kêmtir e. Lê dîsa jî di hin mînakên de bikera hevoka tamamker a berkarî dikeve.

(65)

a. *Wî dixwest go ez jê ra avê bînim.*

b. *Mi dixwest go ew ji min ra avê bîne.*

c. *Wi dixwest go ez biçim malê.*

d. *Mi dixwest go ew biçê malê.*

Lêkera *xwestinê* di risteyên banî de weke lêkera manîpûlatîf hatiye bikaranîn. Ji ber ku bandora bikera bingehîn li ser bikera hevoka tamamker a berkarî heye risteyên jorê mînakên manîpûlatîf in. Wexta ku em li mînakên jor dimeyîzînin em dibînin ku biker ne hev-referant in. Lewma tu ketin pêk nehatiye. Lê di hin mînakên manîpûlatîf de ketina bikeran pêk tê.

(66)

a. *Mi ji wî rica kir go derî veke.*

b. *Wî ji min rica kir go ez derî vekim.*

Di mînakên jorê de lêkera bingehîn *ricakirin* e, lêkereke manîpûlatîf e. Bikerên mînakên jorê ne heman in, ango ne hev-referant in. Di (66.a)yê de bikera hevoka tamamker a berkarî *ew* e, lê ketiye ji risteyê. Di (66.b)yê de bikera hevoka tamamker a berkarî *ez* e, lê neketiye. Tiştê balkêş ev e: Gava ku di hevoka bingehîn de pêşenga (antecedent) bikera kesê sêyem a hevoka tamamker a berkarî tê bikaranîn biker dikeve (mînaka 66.a). Lê gava ku kesê yekem be û pêşeng jî hebe bikera hevoka tamamker a berkarî nakeve (mînaka 66.b). Weke encam em dîsa dikarin bêjin ku biyekbûna (integration) bikerên kesê sêyem bihêztir e lewma ketina bikerê pêk tê (Matras 1997: 634).

2.1.3. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Subjunctive û Ketina Qertafa *bi-yê*

Lêkerên modal û manîpûlatîf hevokên tamamker ên berkarî yên ku bi raweya daxwazî ne distînin. Hevokên tamamker ên berkarî yên raweya daxwazî bi piranî bi koka dema niha (Haig&Opengin 2015: 27) re tên bikaranîn. Berî koka lêkerê qertafa *bi-yê* tê bikaranîn (Noorlander 2014: 209). Lê ev qayde her car pêk nayê. Li jêrê em ê çend mînakan rêz bikin û ji wan encaman derxin:

(67)

a. *Ez dixwazim biçim malê.*

b. *Min hişt go ew biçe malê.*

c. *Min dît go ew ê biçe malê.*

d. *Ez dixwazim dîwarekî xera kim.*

e. *Min hişt go ew dîwarekî xera ka.*

f. *Min dît go ew ê dîwarekî xera ka.*

Gava em bi baldarî li mînakên binêrin em ê bibînin ku di bikaranîna qertafa *bi-yê* de cûdahî heye. Qertafa *bi-yê* bi lêkerên modal û manîpûlatîf re tê bikaranîn. Ev qayde di mînakên jorê de bi tevahî nehatiye cih. Di mînakên (67.a), (67.b) û (67.c)yê de di lêkerên hevokên temamker ên berkarî de (bi-çim, bi-çe, bi-çe) qertafa *bi-yê* hatiye bikaranîn. Lê di mînakên (67.d), (67.e) û (67.f) de di lêkerên hevokên temamker ên berkarî de qertafa *bi-yê* nehatiye bikaranîn. Lêkera mînakên (a,b,c)yê ji aliyê binyadê ve lêkereke xwerû (*çûn*) ye. Lewma qertafa *bi-yê* hatiye bikaranîn. Lêkera mînakên (d,e,f)yê ji aliyê binyadê ve lêkereke hevedudanî (*xerakirin*) ye. Ango bikaranîna qertafa *bi-yê* dikeve bin bandora binyada lêkerê.

2.2. Hevokên Temamker ên Berkarî yên Raweyên Pêşkerî (Indicative)

Hevokên temamker ên berkarî yên raweyên pêşkerî (indicative) weke risteyên serbixwe dikarin tevbigerin. Ango bûyereke xweser bilêv dikin. Pêvebera hevoka temamker a berkarî bi raweyeke pêşkerî hatiye kişandin. Ango lêker qertafên kes, dem û xuyangê sitendiye (Noorlander 2014: 209). Lewma hevokên temamker ên berkarî yên raweyên pêşkerî li gorî yên raweya daxwazî serbesttir hereket dikin. Lêkerên PPVyê dikarin bi hevokên temamker ên berkarî yên raweyên pêşkerî re bî bikaranîn (Noonan 2007: 9).

(68)

a. *Mi zanîbû go ew hatiya.* (Pêveber, qertafa dema borî û kesê sêyem girtiye.)

b. *Ez dibînim go ti çayê divexwî.* (Pêveber, qertafa dema niha û kesê duyem girtiye.)

c. *Mi got em naçin.* (Pêveber, qertafa dema niha û kesê yekem girtiye.)

Weke ku ji risteyên jorê xwuya dike lêkerên PPVyê dikarin hevokên temamker ên berkarî yên bi raweyên pêşkerî kêşayî bigirin. Di (68.a)yê de lêkera *zanîbû* lêkereke pêzanîne ye û bi hevoka temamker a berkarî ya dema borî re hatiye bikaranîn. Di (68.b)yê de lêkera *dibînim* lêkereke pêhisîne ye û bi hevoka temamker a berkarî ya dema niha re hatiye bikaranîn. Di (68.c)yê de lêkera *gotin* ye û bi hevoka temamker a berkarî ya dema niha re hatiye bikaranîn.

2.2.1. Hevokên Temamker ên Berkarî yê Indicative û Hev-Referantî

Hev-referantî, ketina bikeran û cureyên hevokên tamamker ên berkarî radeya biyekbûna (integration) hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker ên berkarî diyar dike. Hevokên tamamker ên berkarî yê raweya daxwazî gava ku hev-referant bûn bikera hevoka tamamker a berkarî bi piranî diket. Em ê li vir li mînakên hevokên tamamker ên berkarî yê raweyên pêşkerî binêrin.

(69)

a. *Wî zanîbû go ew nexweş a.*

b. *Mi zanîbû go ez nexweş im.*

c. *Wî zanîbû go carekê ez dîtima.*

d. *Mi zanîbû go min carekê ew dîtîya.*

Di (69.a)yê de bikera hevoka bingehîn *wî* ye, û hevoka tamamker a berkarî *-ew nexweş a-* ye. Biker hev-referant in, bikera hevoka tamamker a berkarî *ew* e û hatiye bikaranîn. Pêvebera bingehîn *zanî* e û têper e, lê ya hevoka tamamker a berkarî *nexweş* e û netêper e. Di (69.b)yê de bikera hevoka bingehîn *mi* e, û hevoka tamamker a berkarî *-ez nexweş im-* e. Biker hev-referant in, bikera hevoka tamamker a berkarî *ez* hatiye bikaranîn. Pêvebera bingehîn *zanî* e û pêvebera hevoka tamamker a berkarî *nexweş im* e. Pêvebera bingehîn *têper* e lê ya hevoka tamamker a berkarî netêper e. Di (69.c)yê de bikera bingehîn *wî* hatiye bikaranîn lê ya hevoka tamamker a berkarî *wî* nehatiye bikaranîn. Her du pêveber jî têper in. Di (69.d)yê de him bikera bingehîn û him a hevoka tamamker a berkarî *mi* ye û her du jî hatine bikaranîn. Her du pêveber jî têper in. Weke encam em dikarin wilo îfade bikin: Gava ku pêvebera hevoka tamamker a berkarî *têper* be û bikera *wê* kesê sêyem (*wî/wê*) be biker dikeve. Lê wekî din tu ketin pêk nayên (Matras 1997: 635). Ango biyekbûna (integration) bûyerî ya hevokên tamamker ên berkarî yê raweya daxwazî li gorî hevokên tamamker ên berkarî yê raweya pêşkerî xurttir û bihêztir e.

2.3. Hevokên Temamker ên Berkarî yê Navdêrandî (Nominalized)

Hevokên tamamker ên berkarî yê navdêrandî ne sînordar in. Ango sînorê wan nîn e. Lêker gava ku qertafên kes, dem, jimar û xuyangê distînin têne sînorkirin. Lê hevokên tamamker ên berkarî yê navdêrandî qertafên kes, dem, jimar û xuyangê nastînin (Noonan 2007: 19). Hevokên tamamker ên berkarî yê navdêrandî ji ber ku xwediyê hin

taybetmendiye navederan in wilo hatine binavkirin. Hevokên temamker ên berkarî yê navederandî dikarin qertafên navdêrî yê weke ravek û jimarê bistînin.

(70)

a. *Mi xwendina kitêbê xelas kir.*

b. *Mi dest bi xwendinê kir.*

Di (70.a)yê de lêkera bingehîn *xelaskirin* e. *Xelaskirin* lêkereke modal e. Qedandina tiştêkî îfade dike. Hevoka temamker a berkarî *-xwendina kitêbê-* ye. *Xwendina kitêbê* ravekek e û hêmanên ravekê qertaf girtine. Herwiha bikera *xwendinê* û ya *xelaskirinê* heman kes e. Pêvebera hevoka temamker a berkarî *xwendin* e û weke hevokerê asayî biker *mi* û berkar *kitêb* sitendiye. Yanî her ku weke navederan xwuya be jî pêveber eslê xwe winda nekiriye û weke lêkereke têper biker û berkar sitendiye. Di (70.b)yê de lêkera bingehîn *destpêkirin* e. *Destpêkirin* lêkereke modal e. *Destpêkirina* tiştêkî îfade dike. Hevoka temamker a berkarî *-xwendinê-* ye. *Xwendin* qertafa tewangê sitendiye. Ango qertafeke navdêrî sitendiye. Ji mînakên jorê em dikarin van encaman derxînin: Hevokên temamker ên berkarî yê navederandî qertafên navdêran digirin. Tu qertafên lêkerî weke dem, kes û xuyangê nastînin. Herwiha pozîsyona hevokên temamker ên navederandî ne weke hevokên temamker ên berkarî yê raweya daxwazî û raweya pêşkerî ye. Ango hevokên temamker ên berkarî yê raweya daxwazî û yê raweya pêşkerî piştî lêkera bingehîn tên. Lê hevokên temamker ên berkarî yê navederandî berî lêkera bingehîn tên (Noonan 2007: 44).

BEŞA SISÊYAN

3. BIYEKBÛNA WATEYÎ YA HEVOKÊN TEMAMKER ÊN

BERKARÎ

Weke ku me di beşa yekem de got sê cureyên lêkerên ku dikarin hevokên tamamker ên berkarî bistînin hene: lêkerên modal, lêkerên PPVyê û lêkerên manîpûlatîf. Me di beşa pêşî de taybetmendiyên van cureyên lêkeran nîşan dan, pişt re jî me çend mînak dan û mînakên hevokên tamamker ên berkarî rave kirin. Di vê beşa sêyem de pirtir em ê li ser biyebûna wateyî (semantic integration) a hevokên tamamker ên berkarî rawestînin. Biyebûna wateyî, tîkîliya navbera hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî eleqeder dike. Çiqas bandora hevoka bingehîn li ser hevoka tamamker a berkarî hebe, biyebûna wateyî ewqasî bihêz e. Bandora hevoka bingehîn li ser hevoka tamamker a berkarî kêmtir be, biyebûna wateyî ewqasî qels e. Ango, biyebûna wateyî, pevgerîdayîbûna hevoka bingehîn û ya tamamker nîşan dide. Armanca vê beşê eşkerekirina ferqê û cûdahiyên bikaranîna hevokên tamamker ên berkarî ye. Li gorî sê binbeşan em ê li cûdahiyên binêrin û sedemên van cûdahiyên şîrove bikin. Em ê pêşî li ser hevokên tamamker ên berkarî yên manîpûlatîf bisekinin.

3.1. Biyebûna Wateyî ya Hevokên Temamker ên Berkarî yên Manîpûlatîf

Li gorî Givon (2001a: 39) du nîşaneyên tamamkirinê (complementation) hene: biyebûna wateyî û ya hevoksazî (semantic and syntactic integration). Tîkîliya van her du nîşaneyan wilo ye: Biyebûna wateyî (semantic integration) çiqas xurt û bihêz be biyebûna hevoksazî (syntactic integration) wilo xurt û bihêz e. Biyebûn (integration) pevgerîdayîbûna hevokê û wateyî îfade dike. Biyebûna wateyî (Entegrasyona sîmantîkî), hêza tîkîliya di navbera hevoka bingehîn û ya tamamker a berkarî diyar dike. Gava ku em behsa entegrasyona sîmantîkî dikin divê em balê bidin aliyê wateyî ya hevokê û bûyeran. Ji aliyê entegrasyona sîmantîkî ve lêkerên modal û manîpûlatîf pirtir dişîbin hev. Lêkerên PPVyê piçkî cûdatir in (Givon 2001a: 40). Li jêrê em ê li ser hêmanên ku bandorê li ser entegrasyona sîmantîk a hevokên tamamker ên berkarî yên manîpûlatîf dikin bisekinin.

3.1.1. Manîpûlasyona Serkeftî û ya Neytkirî

Givon (2001b: 44) manîpûlasyonê dike du beş: manîpûlasyona serkeftî û ya neytkirî. Li gorî taybetmendiyên em ê sedema vê dabeşkirinê eşkere bikin. Gava ku lêker, lêkereke manîpûlatîf a serkeftî be divê vê qaydeyê pêk bîne: Hevoka bingehîn rast be divê hevoka temamker a berkarî jî rast be (Givon 2001b: 44). Ango gava lêkera hevoka bingehîn pêk hatibe divê lêkera hevoka temamker a berkarî jî pêk were.

(71) *Mi kir go ew biçe malê.*

Hevoka bingehîn *mi kir* rast e, hevoka temamker a berkarî *-ew here malê-* jî rast e. Ango hevoka bingehîn *mi kir* pêk hatiye û herwiha hevoka temamker a berkarî jî pêk hatiye û *ew çûye malê.*

Li dijî vê gava ku lêker, lêkereke manîpûlatîf a neytkirî be ev qayde ne pêwîst e ku pêk were. Ango hevoka bingehîn rast be jî hevoka temamker a berkarî ne pêwîst e ku rast be.

(72) *Mi hêvî dikir go ew biçe malê.*

Hevoka bingehîn *mi hêvî dikir* rast e, hevoka temamker a berkarî *ew biçe malê* dibe ku rast be jî dibe ku çewt be jî. Ango *çûna malê* dibe ku pêk hatibe û dibe ku pêk nehatibe. Ji ber vê yekê, hin lêkerên manîpûlatîf serkeftî ne û hin ji wan neytkirî ne.

3.1.2. Hev-Demî û Serkeftin

Dema ku lêkera bingehîn serkeftî be, bûyera bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî ji aliyê demê vê pirtir girêdayî hev in. Çiqasî bûyer ji aliyê demê ve nêzîkî hev bin, xweseriya wan ew qasî kêmtir e (Givon 2001b: 45).

(73)

a. *Doh wê kir go ew îro biçe malê.*

b. *Doh wê hêvî kir go ew îro biçe malê.*

Mînaka (73.a)yê li gorî rêbazên kurmancî ne birekûpêk e. Lêkera bingehîn *kirin* lêkereke manîpûlatîf a serkeftî ye. Lewma divê hevoka wê ya temamker a berkarî pirtir girêdayî wê be. Ji ber vê, divê dema her du hevokan yek be. Lê belê dema hevoka bingehîn *doh* e û dema hevoka temamker a berkarî *îro* ye. Demên her du hevokan ne yek in. Ango hev-demî di navbera her du hevokan de pêk nehatiye. Lewma jî ev mînak ne gramatîk e. Lê mînaka (73.b)yê li gorî rêbaz û qaydeyên kurmancî gramatîk e. Lêkera bingehîn *hêvîkirin* lêkereke manîpûlatîf a neytkirî ye. Lewma ne pêwîst e ku hevoka wê ya temamker a berkarî

pir girêdayi wê be. Ji ber vê ne lazim e ku dema her du hevokan yek be. Dema hevoka bingehîn *doh* e dema hevoka tamamker a berkarî *îro* ye. Demên her du hevokan ne yek in. Ango ne pêwîst e ku hev-demî di navbera her du hevokan de pêk were û pêk nehatiye jixwe. Ji ber ku lêker, lêkera neytkirî ye ev qayde ne pêwîst e ku pêk were. Pêkneanîna vê jî, zerarê nade gramatîkbûna vê risteyê.

3.1.3. Serkeftin û Kontrola Karayî

Di manîpûlasyona serkeftî de manîpûleker tevgera manîpûleber pirtir tesîr dike. Lewma kontrol û vîna manîpûleber di manîpûlasyona serkeftî de kêmtir e. Manîpûleberê bi vî krenge bêtir weke bandorgir (patient) in. Beravajiyê vê di manîpûlasyona neytkirî de manîpûleber pirtir xwediyê kontrol û vînê ye. Lewma manîpûleberê bi vî awayî bêtir weke kara ne. Bi kurtasî em dikarin rêbaza serkeftin û kontrola karayî wilo nîşan bidin: Manîpûlasyon çiqasî serkeftî be, kontrola manîpûleber ewqasî kêmtir e û manîpûleber bêtir weke bandorgir (patient) e (Givon 2001b: 45). Em ê vê rêbazê bi du mînakên rave bikin.

(74)

a. *Wê kir go ew biçe malê, lê ew neçû.*

b. *Wê xwest go ew biçe malê, lê ew neçû.*

Di risteya (74.a)yê de lêkera bingehîn *kirin* e. *Kirin* lêkereke manîpûlasyona serkeftî ye. Li gorî rêbaza jorê, di manîpûlasyona serkeftî de kontrol û vîna manîpûleber kêmtir e. Ango di manîpûlasyona serkeftî de kontrol û viyan bêtir di destê manîpûleker de ye. Ji ber vê yekê jî manîpûleber bandor û kontrola manîpûleker nikare qebûl neke. Lewma di risteya (74.a)yê de bikaranîneke ne-rêzimanî derketiye pêşberî me. Ango li gorî rêbaza me, karê ji aliyê manîpûleker manîpûle dibe, divê pêk bê. Lê di vê mînakê de (*çûna malê*) pêk nehatiye, lewma riste ne birêkûpêk e. Beravajiyê vê di risteya (74.b)yê de lêkera *xwestinê* hatiye bikaranîn. *Xwestin* lêkereke manîpûlasyona neytkirî ye. Li gorî qaydeya me, di manîpûlasyona neytkirî de kontrol û vîna manîpûleber bêtir e. Ango manîpûleber, di manîpûlasyona neytkirî de, karê ku ji aliyê manîpûleker manîpûle dibe dikare pêk newêne. Ango kontrola manîpûleber pirtir e û tiştê ku manîpûle dibe, dibe ku pêk newe. Ev bikaranîn, gramatîkbûna risteyê xera nake.

3.1.4. Niyet û Kontrola Karayî

Dibe ku cûdahî di navbera bikaranîna du lêkerên manîpûlatîf ên serkeftî de jî hebe. Li gorî wateyê, *kirin* û *sedembûn* du lêkerên manîpûlatîf ên serkeftî ne. Em li mînakên jêrê binêrin û cûdahiyê şîrove bikin:

(75)

- a. *Ehmed kir go Rojîn dev ji karê xwe berde.*
- b. *Ehmed bû sedem go Rojîn dev ji karê xwe berde.*

Di van risteyan de bikaranîna her du lêkeran dişibe hev. Lê gava ku em hokerên niyetê li risteyê zêde bikin dê cûdahî rû bide:

(76)

- a. *Ehmed bi qestî kir go Rojîn dev ji karê xwe berde.*
- b*. *Ehmed bê hemdê xwe kir go Rojîn dev ji karê xwe berde.*
- c*. *Ehmed bi qestî bû sedem go Rojîn dev ji karê xwe berde.*
- d. *Ehmed bê hemdê xwe bû sedem go Rojîn dev ji karê xwe berde.*

Gava ku em li ferqa (76.a) û (76.b)yê dinêrin em dibînin ku (76.a) gramatîk e, lê (76.b) negramatîk e. Di her du mînakên de jî lêkera bingehîn *kirin* e, lê hokerên ku hatine bikaranîn cûda ne. Di (76.a)yê de hokera *bi qestî* hatiye bikaranîn. Ev hoker viyan û kontrolê îfade dike. Ango manîpûlekerê lêkera *kirinê* xwedî kontrol û viyanê ye. Lewma gava ku hokera kontrol û niyetê tê bikaranîn gramatîkbûna risteyê didome. Beravajî vê di (76.b)yê de lêkera *kirinê* bi hokera *bê hemd* hatiye bikaranîn. Ev hoker niyet û kontrolê îfade nake. Ango manîpûlekerê lêkera *kirinê* ne xwedî vîn, niyet û kontrolê ye. Lewma riste ne-gramatîk e. Ji bo (76.c) û (76.d)yê em dikarin tiştên beravajiyê vê bêjin. Di (76.c)yê de lêkera *sedembûnê* hatiye bikaranîn û di risteyê de hokera *bi qestî* ango hokera niyet û kontrolê hatiye bikaranîn. Li gorî mantiqa me ya rêzimanîyê ev riste negramatîk e. Ji ber ku lêkera *sedembûnê* niyet û vînê di xwe de nahewîne, hokerên vîn, niyet û kontrolê nikarin pê re bîn bikaranîn. Di (76.d)yê de heman lêker hatiye bikaranîn û di risteyê de hokera *bê hemd* ango hokera bêyî niyet û kontrolê hatiye bikaranîn. Lewma ev riste gramatîk e. Weke encam em dikarin bêjin ku ji bo manîpûlekerên lêkera *kirinê* vîn, niyet û kontrol pêwîst e. Beravîyê vê ji bo

manîpûlekerên lekera *sedembûnê* vîn, niyet û kontrolê kêmtir e. Ji bo ku baştir bê fêmkirin em ê du risteyên din bi kar bînin:

(77)

a. *Ehmed kir go Rojîn bi zanebûn dev ji karê xwe berde.*

b. *Ehmed bû sedem go Rojîn bi zanêbûn dev ji karê xwe berde.*

Di van her du risteyan de me cihê hokeran guherand, hoker êdî di hevokên temamker ên berkarî de ne û ji bo vîn, niyet û kontrola manîpûleber (*Rojîn*) hatine bikaranîn. Di (77.a)yê de lêkera *kirinê* lêkera bingehîn e. Me got ku ji bo lêkera *kirinê* vîn, niyet û kontrol pêwîst e. Ango manîpûlekerê (*Ehmed*) lêkera *kirinê* xwedî niyet, vîn û kontrol e. Ev tê wê maneyê ku manîpûlebera lêkera *kirinê* (*Rojîn*) ne xwedî vîn, niyet û kontrolê ye. Ji ber vê ye ku di (77.a)yê de bikaranîna hokera *bi zanebûnê* hevokê ne-gramatîk dike. Di (77.b)yê de lêkera *sedembûnê*, lêkera bingehîn e. Me got ku ji bo lêkera *sedembûnê* vîn, niyet û kontrol ne pêwîst e. Ango manîpûlekerê lêkera *sedembûnê* (*Ehmed*) ne xwedî niyet, vîn û kontrolê ye. Ev tê wê wateyê ku manîpûlebera lêkera *sedembûnê* (*Rojîn*) bêtir xwedî vîn, niyet û kontrolê ye. Ji ber vê yekê ye ku di (77.b)yê de bikaranîna hokera *bi zanebûnê* gramatîkbûna risteyê xera nake (Givon 2001b: 45).

3.1.5. Kontrola Karayî û Entegrasyona Demkî

Têkilî di navbera kontrola karayî û demên hevoka bingehîn û hevoka temamker a berkarî de heye. Ango kontrola karayî çiqasî pir be, demên hevokan ewqasî girêdayî hev in. Beravajiyê vê kontrola karayî çiqasî hindik be, dema hevokan ewqasî serbest e. Ango gava ku kontrola manîpûlekeran zêde be serbestbûna tevgera manîpûleberan a demkî kêmtir e (Givon 2001b: 47).

(78)

a. *Ehmed berî du salan kir go Rojîn doh dev ji karê xwe berde.*

b. *Ehmed berî du salan hêvî kir go Rojîn doh dev ji karê xwe berde.*

Di (78.a)yê de lêkera bingehîn *kirin* e û manîpûlekerê (*Ehmed*) lêkera *kirinê* xwedî kontrol e. Ango kontrola manîpûleber (*Rojîn*) kêmtir e ji ber vê jî nikare serbest be ji aliyê demê

ve. Lewma (78.a) ne-gramatîk e. Di (78.b)yê de lêkera bingehîn *hêvîkirin* e û kontrola manîpûlekerê (*Ehmed*) lêkera *hêvîkirinê* kêmtir e. Ango kontrola manîpûlebera (*Rojîn*) lêkera *hêvîkirinê* zêdetir e lewma jî dikare serbest be ji aliyê demê ve. Ji ber wê, (78.b) gramatîk e.

3.1.6. Temasa Rasterast û Entegrasyona Mekanî-Demkî

Li gorî temasa mekanî-demkî ya manîpûleker û manîpûleber bikaranîna lêkerên manîpûlatîf diguhere. Gava ku temasa rasterast di navbera manîpûleker û manîpûleber de hebe lêkerên ku radeya serkeftîbûnê zêde ne tîn bikaranîn. Lê dema ku temas ne rasterast be bêtir lêkerên ku radeya serkeftîbûnê kêmtir e tîn bikaranîn. Lê belê, bikaranîna her du bijarteyan jî gramatîkbûna risteyê xera nake. Ango yek ji ya din bêtir tê tercîhkirin (Givon 2001b: 47).

(79)

Pêwendî: *Ev saetek e em nîqaş dikin,*

a. *Min xwest ew raweste, lê wê got ew ê neraweste.*

b. *Min hêvî kir go ew raweste, lê wê got ew ê neraweste. (?)*

Di (79.a)yê de lêkera bingehîn *xwestin* e, temasa di navbera manîpûleker (*min*) û manîpûleber (*wê*) de temaseke rasterast e. Di (79.b)yê de lêkera bingehîn *hêvîkirin* e, lêkera *hêvîkirinê* bêtir temasa nerasterast dixwaze. Lê di mînakê jorê de temasa di navbera manîpûleker û manîpûleber de temaseke rasterast e. Lewma, bi ya me, bikaranîna lêkera *xwestinê* maqûltir e.

3.1.7. Temasa Rasterast û Serkeftin

Têkilî di navbera temasa manîpûlatîf a rasterast û serkeftinê de heye. Temas çiqas rasterast be serkeftina pêkanîna karê ku di hevoka temamker a berkarî de tê diyarkirin muhtemeltir e. Gava ku îhtîmala temasa rasterast a di navbera manîpûleker û manîpûleber de zêde be pêkanîna bûyera hevoka temamker a berkarî muhtemeltir e. Lê gava ku temas nerasterast be îhtîmala pêkanîna karê hevoka temamker a berkarî kêmtir û hindiktir e (Givon 2001b: 48).

(80)

a. *Wê hişt go ew biçe.*

b. *Wê qebûl kir go wî karîbû biçe.*

kc. *Wê qebûl kir go wî karîbû çûbana.*

đ. *Wê hişt go ew karîbû biçe.*

Di (80.a)yê de lêkera bingehîn *hiştin* e, lêkera *hiştinê* temasa rasterast a di navbera manîpûleker û manîpûleber de dixwaze. Di vê risteyê de temasa rasterast heye û lewma pêkhatina karê hevoka temamker a berkarî muhtemeltir e. Lêkera hevoka temamker a berkarî *çûn* pêk hatiye. Riste gramatîk e. Di (80.b)yê de lêkera bingehîn *qebûlkirin* e, lêkera *qebûlkirinê* temasa nerasterast dixwaze. Di risteyê de temasa nerasterast heye û lewma îhtîmala pêkhatina karê hevoka temamker a berkarî hindiktir e. Ji ber vê bikaranîna lêkera *qebûlkirinê* rast e. Di (80.c)yê de lêkera bingehîn *dîsa qebûlkirin* e. Ji ber ku îhtîmala pêkhatina karê hevoka temamker a berkarî hindik lêkera *qebûlkirinê* hatiye bikaranîn. Riste gramatîk e. Di (80.d)yê de lêkera bingehîn *hiştin* e. Lêkera *hiştinê* temasa rasterast dixwaze. Di vê risteyê de temasa nerasterast heye. Lewma îhtîmala pêkhatina karê hevoka temamker a berkarî hindik e. Ji ber vê lêkera *hiştinê* nikare bê bikaranîn. Lewma bikaranîna vê lêkerê risteyê negramatîk dike.

3.1.8. Tirûş, Çewisandin û Serkeftin

Gava ku manîpûleber xwedî hêz û viyana tirûşê be divê manîpûleker zorê bi kar bîne da ku manîpûleber biçewisîne. Ji ber vê jî, îhtîmala serkeftina manîpûlasyonê kêm e. Lê dema ku manîpûleber ne xwedî hêz û viyana tirûşê be manîpûleker ne mecbûr e ku zorê bi kar bîne û manîpûleber biçewisîne. Lewma îhtîmala serkeftina manîpûlasyonê pirtir e (Givon 2001b: 48-49).

(81)

Pêwend: *Wî li ber xwe nedida,*

a. *Wan kir go ew li ber xwe bida.*

b. *Wan da zorê go ew li ber xwe bida. (?)*

Di (81.a)yê de lêkera bingehîn *kirin* e. Ji bo lêkera *kirinê*, hêz û viyana manîpûleber kêmtir e. Ango kontrol û vîn di destê manîpûleker de ye. Lewma manîpûleker ne mecbûr e ku zor û çewisandinê bi kar bîne. Herwiha îhtîmala serkeftina manîpûlasyona vê risteyê pirtir e. Di (81.b)yê de lêkera bingehîn *danzorê* ye. Jo vê lêkerê hêz û viyana manîpûleber zêdetir e. Ango kontrol û vîna manîpûleker kêmtir e. Lê ji bo lêkera *berxwedanê* hêz, vîn û domdarî pêwîst e. Gava ku li hamberî vê hêz, vîn û domdariyê zor û çewisandin bê bikaranîn risteyeke ne birêkûpêk der tê holê. Lewma risteya (81.a)yê ji ya (81.b)yê xweştir û gramafiktir e bi ya me.

3.1.9. Axaftina Manîpûlatîf

Axaftina ku radeya manîpûlasyonê zêde ye pirtir ji axaftina rasterast, otorîter û çewisandî pêk tê. Beravajiyê vê axaftina ku radeya manîpûlasyonê kêmtir e pirtir ji axaftina nerasterast, nerm û nediyar pêk tê (Givon 2001b: 50-51). Em ê li mînaka jêrê binêrin:

(82)

a. *Ez dixwazim go ti bes wê aciz bikî.*

(i)*derhal!*

(ii).....*Ev ne pêwîst e! (?)*

b. *Ez hêvî dikim go ti bes wê aciz bikî.*

(i).....*derhal! (?)*

(ii).....*Ev ne pêwîst e!*

Di (82.a)yê de lêkera *xwestinê* hatiye bikaranîn. Di (82.b)yê de jî *hêvîkirin* hatiye bikaranîn. Ji bo lêkera *xwestinê*, manîpûlasyona rasterast divê. Lê ji bo *hêvîkirinê*, manîpûlasyona nerasterast li kar e. Di (82.a)yê de ji ber ku manîpûlasyona rasterast li kar e, axaftin bêtir rasterast, otorîter û çewisandî ye. Lewma risteya (82.a(i))yê xweştir û rasttir e li gorî ya (82.a(ii))yê. Di (82.b)yê de ji ber ku manîpûlasyona nerasterast li kar e, axaftin pirtir nerasterast, nerm û nediyar e. Lewma risteya (82.b(ii))yê ji ya (82.b(i))yê xweştir û rasttir e.

3.2. Biyekbûna Wateyî ya Hevokên Temamker ên Berkarî yên “PPV”yê

Li gorî Givon (2001a: 39) du nîşaneyên tamamkirinê (complementation) hene: biyekbûna wateyî û ya hevoksazî. Têkiliya van her du nîşaneyan wilo ye: Biyekbûna wateyî (entegrasyona sîmantîk, semantic integration) çiqas xurt û bihêz be biyekbûna hevoksazî (entegrasyona sîntaktîk, syntactic integration) wilo xurt û bihêz e. Entegrasyon, pêvgirêdayîbûna hevokî û ya wateyî îfade dike. Entegrasyona sîmantîkî, hêza têkiliya di navbera hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî diyar dike. Gava ku em behsa entegrasyona sîmantîkî dikin divê aliyê wateyî ya hevok û bûyeran li ber çavan be. Ji aliyê entegrasyona sîmantîkî ve lêkerên modal û manîpûlatîf pirtir dişîbin hev. Lêkerên PPVyê piçkî cûdatir in (Givon 2001a: 40). Li jêrê em ê li ser hêmanên ku bandorê li ser entegrasyona sîmantîk a hevokên tamamker ên berkarî yên PPVyê dikin bisekinin.

3.2.1. Tercîhkirin û Rasteqînî

Lêkerên ku hevokên tamamker ên berkarî distînin li gorî hin şert û mercan tèn bikaranîn. Ango hin ji wan di derinan de tèn bikaranîn û hin nayên bikaranîn. Di vê beşê de em ê li gorî bikaranîna raweyan lêkerên ku hevokên tamamker ên berkarî distînin mûqayese bikin. Bi gotina tercîhkirinê em raweyên dawxazî (bilanî, fermanî, divêtî û hwd.) qest dikin. Bi peyva *rasteqînî* jî em raweyên ragihandî (raweyên pêşkerî: dema niha, dema borî û hwd.) qest dikin. Lêkerên ku hevokên tamamker ên berkarî distînin sê cure ne: lêkerên manîpûlatîf, lêkerên modal û lêkerên PPVyê (Givon 2001b: 51-52). Em ê bi mînakên bikaranîna raweyan bi van lêkeran re rave bikin.

(83)

a. *Wî karîbû biçe.*

b.* *Ew karîbû çû.*

c. *Wê kir go ew biçe.*

d.* *Wê kir go ew çû.*

e. *Wê zanîbû ew ê biçe.*

f. *Wê zanîbû ew çû.*

Di (83.a)yê de raweya hevoka tamamker a berkarî raweya daxwazî ye. Lêkera bingehîn jî *karin* e. *Karin* lêkereke modal e. Lêkerên modal dikarin bi raweya daxwazî re bête bikaranîn. Lewma riste gramatîk e. Di (83.b)yê de lêkera bingehîn dîsa *karin* e, raweya hevoka tamamker a berkarî jî raweya ragihandî ye. Ji ber ku lêkerên modal bi raweya ragihandî re hatiye bikaranîn riste ne gramatîk e. Di (83.c)yê de lêkera bingehîn *kirin* e, *kirin* lêkereke manîpûlatîf e. Raweya hevoka tamamker a berkarî raweya daxwazî ye. Lêkerên manîpûlatîf bi hevokên tamamker ên berkarî yê raweya daxwazî re tên bikaranîn. Lewma riste gramatîk e. Di (83.d)yê de lêkera bingehîn dîsa *kirin* e, *kirin* lêkereke manîpûlatîf e. Raweya hevoka tamamker a berkarî, raweya ragihandî ye. Riste ne gramatîk e. Di (83.e)yê de lêkera bingehîn *zanîn* e, *zanîn* lêkereke PPVyê ye. Raweya hevoka tamamker a berkarî, raweya daxwazî ye. Riste gramatîk e. Di (83.f)yê de lêkera bingehîn dîsa *zanîn* e. Raweya hevoka tamamker a berkarî, raweya ragihandî (dema borî) ye. Riste dîsa gramatîk e. Weke encam em dikarin wilo bêjin: Lêkerên manîpûlatîf û modal bêtir bi raweyên daxwazî re tên bikaranîn. Ango di manîpûlasyon û modalitiyê de tercihekirin li kar e. Lê, ev lêker pir bi raweyên ragihandî re nayên bikaranîn. Beravajiyê vê lêkerên PPVyê him bi raweyên daxwazî him bi yê ragihandî re tên bikaranîn.

3.2.2. Pêzanîn û Vegotin

Hevokên tamamker ên berkarî yê lêkerên pêzanînê bêtir teqez û diyar in. Ango di hevoka tamamker a berkarî de çî hatibe gotin, di dewama wê de neyîniya wê bi lêkerên pêzanînê re nikare bê bikaranîn. Lê, hevokên tamamker ên berkarî yê lêkerên vegotinê radeya teqezbûna wan hindiktir e. Lewma di dewama hevoka tamamker a berkarî de neyîniya hevoka bingehîn dikare bê bikaranîn (Givon 2001b: 53).

(84)

a. *Min zanîbû ew çû, lê min zanîbû ew neçû.*

b. *Min got ew çû, lê min zanîbû ew neçû.*

Di (84.a)yê de lêkera bingehîn *zanîn* e, *zanîn* lêkereke pêzanînê ye. Hevoka tamamker a berkarî ya vê mînakê *ew çû* ye. Di dewama risteyê de neyîniya hevoka tamamker a berkarî *ew neçû* hatiye bikaranîn. Lewma riste ne gramatîk e. Ango hevokên tamamker ên berkarî yê lêkerên pêzanînê teqez in. Lewma bikaranîna jorê ne rast û dirust e. Di (84.b)yê de lêkera

bingehîn *gotin* e, *gotin* lêkereke vegotinê ye. Hevoka tamamker a berkarî *ew çû* ye. Di dewama risteyê de neyîniya hevoka tamamker a berkarî *ew neçû* hatiye bikaranîn. Ligel ku erênî û neyîniya hevoka tamamker a berkarî bi hev re hatibin bikaranîn jî riste gramatîk e.

3.2.3. Vegotina Rasterast û ya Nerasterast

Entegrasyona bûyerên lêkerên vegotinê li gorî cureyên veguhastinê digûherin. Weke ku me di beşa yekem de got du cureyên vegotinê hene: veguhastina rasterast û ya nerasterast. Di vegotina rasterast de bûyera/rewşa bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî bêtir nêzikî hev in. Ango di veguhastina rasterast de sînorên her du bûyeran nêzîktirî hev in (Givon 2001b: 53-54). Herwiha bikera bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî heman kes in. Ango hev-referant in. Lê di veguhastina nerasterast de bûyera/rewşa bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî dûrtirî hev in. Ango di veguhastina nerasterast de sînorên her du bûyeran dûrtirî hev in. Herwiha bikerên hevoka bingehîn û hevoka tamamker a berkarî ne heman kes in. Ango hev-referantî nîne.

(85)

a. *Wê got go ez xwendekarek im.* (ez= ê ku vê hevokê vedibêje.)

b. *Wê got: “ Ez xwendekarek im.”* (ez= wê, ya ku vê hevokê vedibêje.)

Di (85.a)yê de bingihanek (*go*) hatiye bikaranîn. Herwiha bikerên hevoka bingehîn û hevoka tamamker a berkarî du kesên cihê ne. Ango ne hev-referant in. Ji ber ku hevoka neqîlkirî hatiye guhertin ev cure veguhastin, veguhastina nerasterast e. Di (85.b)yê de bingihanek tuneye. Bikera hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî heman kes in. Ango biker hev-referant in. Ji ber ku hevoka neqîlkirî nehatiye guhertin ev cure veguhastin, veguhastina rasterast e. Bikaranîna bingihanekê û nehev-referantbûna bikeran, sînorên bûyerên hevoka bingehîn û ya tamamker a berkarî dûrtir dike. Beravajiyê vê bikarneanîna bingihanekê û hev-referantbûna bikeran, sînorên bûyerên hevoka bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî nêzîktir dike.

3.2.4. Sedemiya Serkeftî û Hev-Demî

Ji bo lêkerên pêhisînê hev-demî pêwîst e. Ango lêkera bingehîn a pêhisînê û lêkera hevoka temamker a berkarî divê hev-dem bin. Gava ku ne hev-dem bin riste ne gramatîk e. Lê, ji bo lêkerên pêzanînê hev-demî ne pêwîst e. Yanî, lêkera bingehîn a pêzanînê û lêkera hevoka temamker a berkarî ne hev-dem bin jî riste gramatîk e (Givon 2001b: 49).

(86)

a. *Wê dît go ew hatiya.*

b. *Wê dît go ew nayê.*

ç. *Doh wê dît go ew îro nayê.*

đ. *Îro wê dît go ew doh hat.*

Di (86.a)yê de lêkera bingehîn *dîtin* e. Di wateya *ferqkirinê* de hatiye bikaranîn lewma lêkereke pêzanînê ye. Dema lêkera *dîtinê* dema borî ye. Lêkera hevoka temamker a berkarî *hatin* e. Dema *hatinê* jî dema borî ye. Hev-demî heye, riste gramatîk e. Di (86.b)yê de lêkera bingehîn *dîsa dîtin* e. *Dîtin* di wateya *ferqkirinê* de hatiye bikaranîn lewma lêkereke pêzanînê ye. Dema hevoka temamker a berkarî dema niha ye. Her ku hev-demî tunebe jî ji ber ku lêkera bingehîn a pêzanînê ye riste gramatîk e. Di (86.c)yê de lêkera bingehîn *dîtin* e. *Dîtin* di wateya pêhisînê de hatiye bikaranîn. Dema *dîtinê* dema borî ye. Lêkera hevoka temamker a berkarî *hatin* e. Dema lêkera hevoka temamker a berkarî dema niha ye. Ji ber ku lêkera pêhisînê hev-demîyê divê û hev-demî nîne, riste ne gramatîk e. Di (86.d)yê de jî heman tişt li kar e, lewma riste ne gramatîk e.

3.2.5. Entegrasyona Referantî

Di kurmancî de lêkera *dîtinê* him weke lêkera pêhisînê him jî weke lêkera pêzanînê tê bikaranîn. Gava ku lêkera *dîtinê* weke lêkera pêhisînê tê bikaranîn, divê bikera hevoka bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî ne hev-referant bin. Lê berkara lêkera bingehîn û bikera hevoka temamker a berkarî divê hev-referant bin. Beravajiyê vê gava ku lêkera *dîtinê* weke lêkera pêzanînê tê bikaranîn, hev-referantî ne pêwîst e. Weke encam em dikarin bêjin ku ji bo lêkerên pêhisînê hev-referantî pêwîst e, lewma di hevokên pêhisînê de entegrasyona

referantî bêtir pêk tê. Li dijî vê ji bo lêkerên pêzanînê hev-referantî ne pêwîst e, lewma di hevokên pêzanînê de entegrasyona referantî ne xurt e (Givon 2001b: 50).

(87)

a. *Wê dît ew hat.* (Ya/ê ku tê dîtî û ya/ê ku tê heman kes in.)

b. *Wê dît go ew ji vê mijarê fêr dîke.* (Ya ku dibîne û ya/ê ku fêr dîke dibe ku heman kes bin û dibe ku kesên cuda bin.)

Di (87.a)yê de berkara *dîtî ew* e û bikera hevoka temamker a berkarî jî *ew* e. Ango berkara bingehîn û bikera hevoka temamker a berkarî hev-referant in. Berkar di risteyê de nehatiye bikaranîn lê biker tê de ye. Lêkera *dîtî* weke lêkera pêhisînê hatiye bikaranîn. Di (87.b)yê de bikera bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî ne pêwîst e hev-referant bin. Lêkera *dîtî* di mînakê (87.b)yê de lêkera pêzanînê ye.

3.3. Biyekbûna Wateyî ya Hevokên Temamker ên Berkarî yên Modal

Li gorî Givon (2001a: 39) du nîşaneyên temamkirinê (complementation) hene: biyekbûna wateyî û ya hevoksazî. Têkiliya van her du nîşaneyan wilo ye: Biyekbûna wateyî (entegrasyona sîmantîk, semantic integration) çiqas xurt û bihêz be biyekbûna hevoksazî (entegrasyona sîntaktîk, syntactic integration) wilo xurt û bihêz e. Entegrasyon, pêvgirêdayîbûna hevokî û ya wateyî îfade dîke. Entegrasyona sîmantîkî, hêza têkiliya di navbera hevoka bingehîn û ya hevoka temamker diyar dîke. Gava ku em behsa entegrasyona sîmantîkî dikin divê aliyê wateyî ya hevok û bûyeran li ber çavan be. Ji aliyê entegrasyona sîmantîkî ve lêkerên modal û manîpûlatîf pirtir dişîbin hev. Lêkerên PPVê piçkî cûdatir in (Givon 2001a: 40). Li jêrê em ê li ser hêmanên ku bandorê li ser entegrasyona sîmantîk a hevokên temamker ên bekarî yên modal dikin bisekinin.

3.3.1 Lihevkirina Referantî û Entegrasyona Bûyerê

Lêkerên modal ji aliyê referantan ve lihevkirinê divên. Ango bikera hevoka bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî divê hev-referant bin. Lewma ji bo lêkerên modal entegrasyon pirtir pêk tê (Givon 2001b: 56).

(88)

a. *Min karîbû biçim.*

b. *Ez dixwazim biçim.*

c. *Min rabû got.*

Gava ku em li mînakên jorê binêrin em ê bibînin ku bikerên hevokên bingehîn û yên hevokên tamamker ên berkarî hev-referant in. Di (88.a)yê de bikera bingehîn (*min*) û ya hevoka tamamker a berkarî (*ez*) ku nehatiye bikaranîn heman kes in. Ji bo mînakên din jî heman tişt li kar e. Ji bo ku zelaltir bibe mijar em ê behsa lêkera *xwestinê* bikin. *Xwestin* him weke modalîtiyê him jî weke manîpûlasyonê dikare bê bikaranîn. Di hevoka (88.b)yê de weke modalîtiyê hatiye bikaranîn lewma bikera bingehîn (*ez*) û ya hevoka tamamker a berkarî (*ez*) ku nehatiye bikaranîn hev-referant in. Lê gava ku weke lêkera manîpûlatîf bê bikaranîn hev-referantî betal dibe, pêk nayê.

(89) *Min xwest ew biçê malê.*

Di vê risteyê de *xwestin* weke lêkera manîpûlasyonê hatiye bikaranîn ji ber ku bikera bingehîn, bikera hevoka tamamker a berkarî manîpûle kiriye. Bikera bingehîn *min* e û ya hevoka tamamker a berkarî *ew* e. Ango her du biker ne hev-referant in.

3.3.2. Serkeftin û Sernekeftin

Hin lêkerên modal serkeftî ne û hin jî wan sernekeftî ne. Lêkerên weke *qedandin*, *xelaskirin*, *destpêkirin*, *dewamkirin*, *biserketin*, *biserneketin* mînakên lêkerên serkeftî ne. Lêkerên weke *xwestin*, *hewldan*, *karin*, *mecbûrkirin* lêkerên sernekeftî ne.

Lêkerên serkeftî yên modal weke serkeftina erênî û ya neyînî dibin du beş. Di serkeftiya erênî de gava ku lêkera bingehîn pêk tê lêkera hevoka tamamker a berkarî jî pêk tê.

(90) *Min çêkirina siparteka xwe xelas kir.*

Di vê risteyê de lêkera bingehîn *xelaskirin* e, *xelaskirin* lêkereke modal a serkeftî ye. Lêkera hevoka tamamker a berkarî *çêkirin* e, di risteya jor de nehatiye kişandin lewma em li gorî şertên asayî nizanin pêk hatiye an nehatiye. Lê, em rêbaza *xwe bi bîr bînin*, lêkerên serkeftî gava ku pêk tên hevokên wan ên tamamker ên berkarî jî pêk tên. Ango karê *çêkirina*

sipartekê xelas bûye. Di serkeftiya neyînî de dema ku lêkera bingehîn pêk tê lêkera hevoka temamker a berkarî pêk nayê. Ango lêkera hevoka temamker a berkarî neyînî ye.

(91) *Ew bi ser ne ket go ezmûnê derbas ka.*

Lêkera bingehîn *biserneketin* e, *biserneketin* lêkereke serkeftî ya neyînî ye. Gava ku lêkerên serkeftiya neyînî di risteyê de pêk newe, hevoka temamker a berkarî jî pêk nayê. Ango lêkera hevoka temamker a berkarî neyînî ye. Di risteya jorê de lêkera bingehîn pêk nehatiye ji ber wê, lêkera hevoka temamker a berkarî jî pêk nehatiye. Ango *ew bi ser neketiye û wî ezmûn derbas nekiriye*.

Lêkerên sernekeftî yên modal weke sernekeftiya erênî û ya neyînî dibin du beş. Di sernekeftiya erênî de pêkhatina lêkera bingehîn nayê wê wateyê ku lêkera hevoka temamker a berkarî jî pêk tê.

(92) *Wî xwest siparteka xwe çêka.*

Di risteya jorê de lêkera bingehîn *xwestin* e, lêkereke sernekeftî ya erênî ye. Lêkera *xwestinê* pêk hatiye. Lêkera hevoka temamker a berkarî *çêkirin* e û em nizanin ku pêk hatiye an nehatiye. Ango *wî xwestiye dibe ku çêkiribe û dibe ku çênekiribe*.

Beravajiyê wê di lêkerên serkeftî yên neyînî de dema ku lêkera bingehîn pêk newe nayê wê wateyê ku lêkera hevoka temamker a berkarî jî pêk naye. Ango lêkera hevoka temamker a berkarî dibe ku pêk were.

(93) *Wî nexwest siparteka xwe çêka.*

Di risteya jorê de lêkera bingehîn *xwestin* e, neyînî hatiye bikaranîn lewma lêkereke sernekeftiya neyînî ye. Lêkera *xwestinê* pêk nehatiye ji ber ku neyînî ye. Lêkera hevoka temamker a berkarî *çêkirin* e. Pêknehatina lêkera bingehîn nayê wê wateyê ku lêkera hevoka temamker a berkarî jî pêk nayê. Ango dibe ku pêk hatibe û *wî sipartek bê dilê xwe çêkiribe*.

3.3.3. Niyet û Serkeftin

Lêkerên modal ên sernekeftî dikarin li gorî radeya niyetê bîn rêzkirin. Ango niyeta bikerê çiqas xurt û bihêz be biserketin ewqas muhtemel e. Yanî di navbera radeya niyetê û serkeftinê de têkiliyêke rast heye (Givon 2001b: 57). Em dikarin li ser sê lêkerên modal ên

sernekeftî bisekinin: *xwestin, niyetkirin û karin*. Niha em di mînakan de van lêkeran bi kar bînin, em ê hingê radeya niyetê û serkeftinê mûqayese bikin.

(94)

a. *Ez dixwazim xênîkî ava kim.*

b. *Ez niyet dikim go xênîkî ava kim.*

c. *Ez dikarim xênîkî ava kim.*

Ku em em bixwazin risteyên jorê li gorî bihêzbûna radeya niyetê rêz bikin ew ê rêza risteyan wilo be: (94.c), (94.b), (94.a). Niyeta herî kêr di (94.a)yê de ye. Lewma serkeftina herî kêr a lêkera hevoka temamker a berkarî ya (94.a)yê ye. Niyeta navîn di (94.b)yê de ye. Lewma serkeftina navîn a lêkera hevoka temamker a berkarî ya (94.b)yê ye. Niyeta herî bihêz di (94.c)yê de ye. Lewma serkeftina herî muhtemel a hevoka temamker a berkarî ya (94.c)yê ye. Weke encam em dikarin bêjin ku niyeta karayî, serkeftina karayî divê. Niyet çiqas bihêz be serkeftin wilo muhtemel e.

3.3.4. Banekî, Zanîn, Çawa û Hev-Referansî

Lêkerên modal ên serkeftî û yên sernekeftî lo gorî banekî, niyet, huner û referantê cûda ne. Em bi mînakan mijarê zelal bikin:

(95) *Min ji bîr kir go derî ase kim.*

Lêkera bingehîn *jibîrkin* e û lêkereke modal a serkeftî ye. Hev-referantî di navbera bikera bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî de heye. Di vê risteyê de serkeftineke neyînî ya şexsî heye.

(96) *Min ji bîr kir bê çawa derî ase kim.*

Lêkera bingehîn *jibîrkin* e û lêkereke modal a serkeftî ye. Hev-referantî di navbera bikera bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî de heye. Di vê risteyê de hunereke neyînî ya şexsî heye.

(97) *Min ji bîr kir bê çawa yek divê derî ase ka.*

Lêkera bingehîn *jibîrkin* e û lêkereke modal a serkeftî ye. Hev-referantî di navbera bikera bingehîn û ya hevokê tamamker a berkarî de nîne. Di vê risteyê de hunereke neyînî ya banekî heye.

(98) *Min xwest derî ase kim.*

Lêkera bingehîn *xwestin* e û *xwestin* lêkereke modal a sernekeftî ye. Di vê risteyê de di navbera bikera bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî de hev-referantî heye. *Xwestin* niyeteke diyar nîşan dike.

(99) *Min xwest zanibim bê çawa derî ase kim.*

Lêkera bingehîn *xwestin* e û *xwestin* lêkereke modal a sernekeftî ye. Di vê risteyê de di navbera bikera bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî de hev-referantî heye. *Xwestin* niyeteke teqez îfade dike û bêyî lêkera *zanînê* riste ne rast e.

(100) *Min xwest zanibim bê çawa divê yek derî ase ka.*

Lêkera bingehîn *xwestin* e û *xwestin* lêkereke modal a sernekeftî ye. Di vê risteyê de di navbera bikera bingehîn û ya hevoka tamamker a berkarî de hev-referantî nîne. *Xwestin* niyeteke banekî nîşan dike.

Weke encam em dikarin bêjin ku di serkeftin û niyetên şexsî de hev-referantî heye him ji bo lêkerên serkeftî him jî lêkerên sernekeftî. Gava ku huner şexsî be û lêker serkeftî be hev-referantî dîsa heye. Lê gava ku niyet şexsî be û lêker sernekeftî be hev-referantî nîne. Lê bi zêdekirina lêkera *zanînê* li risteyê hev-referantî dîsa dikare pêk bê. Dema ku huner û niyeta banekî hebe hev-referantî him ji bo lêkerên serkeftî him jî bo yên sernekeftî nîne (Givon 2001b: 57-58).

3.3.5. Ketina Bikera Hevoka Temamker ên Berkarî

Lêkerên ku hevokên tamamker ên berkarî distînin li gorî hin şert û mercên zimanî û wateyî dikarin hevokên xwe yên tamamker ên berkarî biguherînin. Ango hin lêker bikerên hevokên tamamker ên berkarî diavêjin û hin jî wan bikeran diparêzin. Wilo dixwuye ku lêkerên modal û yên pêzanînê bikerên hevokên tamamker ên berkarî ji risteyê derdixin (Noonan 2007: 24). Ango bikerên hevokên tamamker ên berkarî yên lêkerên modal û yên

pêzanînê ji risteyê dikevin. Lê lêkerên manîpûlatîf, yên vegotinê û yên pêhisînê bikerên hevokên temamker ên berkarî diparêzin. Em bi mînakên mijare zelaltir bikin:

(101) *Min xwest biçim.*

Lêkera bingehîn *xwestin* e, vîn û daxwaz aniyê zimên. Lewma lêkereke modal e. *Min xwest* hevoka bingehîn e, *ez biçim* hevoka temamker a berkarî ye. Bikera hevoka temamker a berkarî (*ez*) ketiye.

(102) *Min xwest ew biçe.*

Lêkera bingehîn *dîsa xwestin* e, ji ber ku bikera bingehîn (*min*) bikera hevoka temamker a berkarî (*ew*) manîpûle dike, lêkereke manîpûlatîf e. *Min xwest* hevoka bingehîn e, *ew biçe* hevoka temamker a berkarî ye. Bikera hevokê (*ew*) neketiye.

(103) *Min got ew çû.*

Lêkera bingehîn *gotin* e, ji ber ku veguhastinê pêk tîne lêkereke vegotinê ye. *Min got* hevoka bingehîn e, *ew çû* hevoka temamker a berkarî ye. Bikera hevoka temamker a berkarî (*ew*) neketiye.

(104) *Min his kir go ti nayê.*

Lêkera bingehîn *hiskirin* e, ji ber ku pêhisînê îfade dike lêkereke pêhisînê ye. *Min his kir* hevoka bingehîn e, *ti nayê* hevoka temamker a berkarî ye. Bikera hevoka temamker a berkarî (*tu*) neketiye.

(105) *Min zanîbû biçim.*

Lêkera bingehîn *zanîn* e, ji ber ku zanyariyê te'rîf dike lêkereke pêzanînê ye. *Min zanîbû* hevoka bingehîn e, *ez biçim* hevoka temamker a berkarî ye. Bikera hevoka temamker a berkarî (*ez*) ketiye.

ENCAM

Di vê xebatê de ku bi zaravê kurmancî ye û li ser devoka Torê disekine li ser hevokên tamamker ên berkarî, cure û entegrasyona wan, risteyên aloz bi mînakên ji xebatên meydanî, bi hûrgulî hatine ravekirin. Di beşa yekem de pêşî li ser bingeha xebatê, devoka hilbijartî û têgihên rêzimanî hatiye rawestin. Pişt re bi taybetî li ser cureyên lêkerên ku dikarin hevokên tamamker ên berkarî bistînin hatiye rawestin. Di beşa duyem de li ser hevokên tamamker ên berkarî û morfolojiya wan analîz hatine kirin û hin encam hatine diyarkirin. Herwiha di beşa sêyem de li ser hevokên tamamker ên berkarî û entegrasyona wan bi hevokên bingehîn re hatiye analîzkirin. Ji mînak, şîrove û analîzên vê xebatê em gihan encamên jêrîn:

Risteyên sade xwedî daraz û lêkereke tenha ne. Risteyên aloz ji du an zêdetir lêker û darazan pêk tên. Ev cure riste ji sê hêmayan pêk tên: hevoka bingehîn, hevoka bend/temamker/serbixwe û bingihaneka *goyê*. Bikaranîna hevoka bend û ya tamamker ne bi heman rengî ye. Hevoka bend hêmaneke risteyê diwesifîne û weke rengdera wê hemanê tê bikaranîn. Lê hevoka tamamker weke hêmaneke risteyê bixwe tê bikaranîn û risteyê ji aliyê wate û binyadê ve tamam dike. Piranî weke berkara hevoka bingehîn tê bikaranîn. Risteyên aloz ku ji hevokeke bingehîn û yeka bend pêk tên her çend hevoka bingehîn pêşî, piştra jî hevoka bend tê, li gor rewşa cextkirinê dikare bi hev biguherin. Hevokên bend ên armançî piştî hevoka bingehîn tên. Hevoka bend weke armanca hevoka bingehîn e. Bi piranî bingihaneka *goyê* tê bikaranîn.

Hevokên mercî pirtir berî hevoka bingehîn tên û weke şerta hevoka bingehîn e. Bi piranî bingihanek tê bikaranîn. Hevokên sedemî piştî hevoka bingehîn tên. Sedema pêkhatina hevoka bingehîn diyar dikin. Bikaranîna bingihanekê opsîyonel e. Hevokên pêwendiyê berî hevoka bingehîn tên bikaranîn. Rengdêra hêmayeke hevokê ye. Bikaranîna wê ne pêwîst e. Ango bêyî wê jî riste birêkûpêk e. Bikaranîna hevokên bend û ya hevokên tamamker ne bi heman rengî ye. Hevokên bend di risteyê de ne pêwîst in ku bînin bikaranîn. Bêyî hevokên bend jî riste gramatîk e. Lê hevokên tamamker ên berkarî ne wilo ne. Hevokên tamamker ên berkarî risteyê ji aliyê wate û binyadê ve tamam dikin û weke hêmayeke risteyê ne. Lewma bikaranîna wan di risteyê de pêwîst e. Bêyî wan riste kêr e. Risteyên aloz ku ji hevokeke bingehîn û yeka tamamker (complement clause) pêk tên xwediyê gelek cureyan in. Hevokên tamamker pêkhênaka risteyê îfade dikin yan jî gelek caran di rola berkarê de ne û dewsa wê digirin. Risteyên aloz hevokên lêkerên PPVê, yê lêkerên modal û yê lêkerên manipulatîf di xwe de dihewîne.

Lêkerên modal piştî xwe hevokên tamamker weke berkarê distînin. Gava ku bikera lêkera modal û ya hevoka tamamker a berkarî hev-referant be, bikera hevoka tamamker a berkarî dikeve. Lêkerên modal *destpêkirin*, *qedandin*, *domdarî*, *biserketin*, *teşebus*, *niyet*, *divêtî* û *şiyane* diyar dikin. Lêkerên ku van wateyan didêrin weke mînakên lêkerên modal dikarin bîn qebûlkirin. Pêvebera hevoka tamamker a berkarî ya lêkerên modal pirtir kêşayî ye. Lê çend mînakên beravajî jî hene. Lêkerên weke *çûn*, *rabûn* û *lêdanê* di eslê xwe de ne lêkerên têper in. Lê gava ku weke lêkerên modal tîn bikaranîn weke lêkerên têper tevdigerin. Di dema borî de bi cînavên tewandî re tîn bikaranîn û hevokên tamamker ku weke berkarê tîn bikaranîn distînin.

Risteyên lêkerên PPVyê hevokên tamamker ên berkarî piştî xwe distînin. Pêvebera hevoka tamamker a berkarî ya lêkerên PPVyê kêşayî ye. Bikaranîn bingihanekê ne pêwîst e. Lêkerên PPVyê dibin sê beş: pêhisîn, pêzanîn û vegotin. Lêkerên pêhisînê ev in: *dîtin*, *hiskirin*, *meyizandin*, û *eşandin*. Bikerên lêkerên pêhisînê datîf in. Bûyerê tecrûbe dikin. Gava ku peyvên pirsîyariyê bîn bikaranîn cihê bingihanekê digirin.

Gava ku yek bibe şahîdê qewama bûyerê di wir de pêhisîna rasterast heye. Lê dema yek nebe şahîdê qewama bûyerê di wir de pêhisîna nerasterast heye. Lêkerên pêzanînê ev in: *zanîn*, *fêmkirin*, *texmînkirin*, *bawerkirin*, *jibîrkirin*, *ferqkirin*. Lêkera *meyizandinê* him weke lêkera pêhisînê him jî weke lêkera pêzanînê tî bikaranîn. *Meyizandin* di wateya *dîtinê* de be wê wextê lêkera pêhisînê ye. Lê dema di wateya *ferqkirinê* de be wê çaxê lêkera zanînê ye. Lêkerên vegotinê axaftina mirovan vediguhezînin. Gava ku axaftin bêyî guhertin bê veguhastin ew veguhastina rasterast e. Dema axaftin bê guhertin ew veguhastina nerasterast e. Di veguhastina rasterast de axêver û kirde heman kes in, hev-referant in. Lê dema veguhastin ne rasterast be axêver û kirde du kesên cihê ne, ne hev-referant in. Mînakên lêkerên manîpûlatîf ev in: *kirin*, *hiştin/hêlan/hêliştin*, *xwestin*...

Di risteyên manîpûlatîf de du pêkhên hene: manîpûleker û manîpûleber. Manîpûleker bikera hevoka bingehîn e û bandorê li karê manîpûlebera ku berkara bingehîn û bikera hevoka tamamker a berkarî ye dike. Risteyên manîpûlatîf ji lêkerên manîpûlatîf pêk tînin û piştî xwe hevoka tamamker a berkarî distînin û cihê hevoka tamamker a berkarî naguhere. Karaya/bikera lêkera manîpûlatîf karayeke/bikereke mirovî ye. Manîpûlasyon dibe du beş: manîpûlasyona serkeftî û ya sernekeftî. Di manîpûlasyona serkeftî de dema lêkera hevoka bingehîn pêk tî lêkera hevoka tamamker a berkarî jî divê pêk were. Lê gava ku manîpûlasyon sernekeftî be lêkera hevoka bingehîn pêk tî, lê ne pêwîst e ku lêkera hevoka tamamker a

berkarî jî pêk were. Hevokên temamker ên berkarî ji aliyê morfolojîk ve dibin sê beş: hevokên temamker ên berkarî yên raweya daxwazî, yên raweya pêşkerî û yên navdêrandî.

Hevokên temamker ên berkarî yên raweya daxwazî bi lêkerên modal û manîpûlatîf re tîk bikaranîn û qertafa *bi-yê* distînin. Ku lêkera bingehîn modal be û hevoka temamker a berkarî daxwazî be bikera hevoka temamker a berkarî dikeve. Entegrasyona risteyên ku bikerên wan kesê sêyem in û lêkera hevoka temamker a berkarî têper in xurttir e. Gava ku bi lêkerên manîpûlatîf re tîk bikaranîn hev-referantî nîn e. Lewma ketin pêk nayê. Ku pêşenga (antecedent) bikera kesê sêyem a hevoka temamker a berkarî di hevoka bingehîn de tîk bikaranîn biker dikeve. Hevokên temamker ên berkarî yên raweyên pêşkerî weke hevokên serbixwe tevdigerin. Lêkera hevoka temamker a berkarî dibe ku bi demên cur bi cur ve kêşayî be. Hevokên temamker ên berkarî yên raweyên pêşkerî bi lêkerên PPVyê re tîk bikaranîn û li gorî yên raweyên daxwazî serbesttir in. Gava ku lêkera hevoka temamker a berkarî têper be û biker kesê sêyem be bikera hevoka temamker a berkarî dikeve. Hevokên temamker ên berkarî yên navdêrandî weke navdêran tevdigerin. Qertafên navdêrî distînin. Bêtir bi lêkerên modal ên weke *destpêkirin*, *xelaskirin* re tîk bikaranîn.

Manîpûlasyonê serkeftî hev-demiyê divê. Ji aliyê demê ve lêkerên manîpûlatîf ên serkeftî û hevokên temamker ên berkarî pirtir girêdayî hev in. Di manîpûlasyonê serkeftî de bandora manîpûleker pirtir li ser manîpûleber heye. Lewma kontrola karayî bihêztir e. Niyeta karayî çiqas kêmtir be kontrol û vîna karayî wilo bêhêz in. Kontrola karayî çiqas xurt be entegrasyona demkî ya hevoka bingehîn û ya hevoka temamker a berkarî ewqas bihêztir e. Temasa bikerên manîpûlatîf çiqas rasterast be serkeftinê ewqas muhtemeltir e. Manîpûleker çiqas hêz, çewisandin û tirûşê bikar bîne serkeftinê wilo hêsantir dibe. Manîpûlasyonê çiqas rasterast û serkeftî be axaftinê wilo otorîter e. Lêkerên modal û manîpûlatîf bi raweya daxwazî re tîk bikaranîn. Lê lêkerên PPVyê bi raweya ragihandî re tîk bikaranîn. Hevoka temamker a berkarî dema ne li gorî vê qaydê tevbigere riste dibe negramatîk. Hevokên temamker ên berkarî yên lêkerên pêzanînê teqeztir û diyartir in. Yek nikare neyîniya wê jî bi wan re bi kar bîne. Lê hevokên temamker ên berkarî yên lêkerên vegotinê hindiktir teqez û diyar in. Yek dikare neyîniya wê jî bi wan re bi kar bîne. Entegrasyona veguhastina rasterast bihêztir e, lê ya nerasterast kêmtir bihêz e.

Ji bo lêkerên pêhisînê hev-demî pêwîst e. Ku ne hev-dem bin riste ne gramatîk e. Herwiha lêkerên pêhisînê hev-referantiyê jî divên. Bikerên hevokên modal û hevokên temamker ên berkarî divê hev-referant bin. Loma entegrasyona wan bihêztir e. Radeya niyetê

ya bikerên lêkerên modal çiqas xurt be serkeftin ewqas muhtemel e. Niyet û huner şexsî be divê biker hev-referant bin. Lê gava ku banekî be hev-referantî ji holê radibe.

Ji ber ku ev xebat tenê bi devoka Torê ve hatiye sînorkirin, hemû cureyên hevokên temamker û risteyên aloz ên kurdî/kurmancî nehatine nirxandin. Li herêmên din varyant û bikaranînên cûda derbareyê vê mijarê de bê guman hene ku dikarin bibin mijara lêkolînên din. Di çarçova vê xebatê de me tenê hewl da ku em balê bikişînin ser xaleke sereke ya derbareyê sîntaksa kurmancî. Em hêvî dikin ku ev xebat rê li ber lêkolînên li vê sehayê veke.



ÇAVKANÎ

Bi Îngilîzî

Bowerman, Melissa. (1979), “The acquisition of complex sentences”. in *Studies in language acquisition*, Cambridge University Press, rr. 285-305.

Chyet, Michael. (1995), Neo-Aramaic and Kurdish, *An Language and culture in the Near East*. Leiden: Brill, rr. 219-252.

Endley, Martin J. (2010), *Linguistics Perspective on English Grammar*, IAP.

Givón, Talmy. (2001), *Syntax, An Introduction, Volume I*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia.

Givón, Talmy. (2001), *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia.

Gundogdu, Songul. (2015), “Noun-Verb Complex Predicates in Kurmanji Kurdish: A Syntactical Account”, *Proceedings of ConSOLE XXIII*, rr. 279-301.

Haig, Geoffrey. (2002), “Noun-plus-verb Complex Predicates In Kurmanjî Kurdish: Argument Sharing, Argument Incorporation, Or What?” *Sprachtypol. Univ. Forsch. (STUF)*. Berlin 551, rr. 15-48.

Haig, Geoffrey. (2004), “Alignment in Kurdish: a diachronic perspective”. Universität zu Kiel.

Haig, Geoffrey. (2007), “Grammatical Borrowing in Kurdish (Northern Group)”. In Y. Matras and J. Sakel (eds.), *Grammatical Borrowing in Cross-linguistic Perspective* rr. 165-184, Berlin: Mouton de Gruyter.

Haig, Geoffrey and Ergin Öpengin. (2014), “Introduction to Special Issue Kurdish: A critical research overview”, *Kurdish Studies*, Cild. 2, Hej. 2, rr. 99-122.

Haig, Geoffrey and Ergin Öpengin. (forthcoming), “Kurmanji Kurdish in Turkey: Structure, Varieties and Status”. In C. Bulut (ed.), *The Minority Languages in Turkey*. Wiesbaden: Harrassowitz.

Haig, Geoffrey and Yaron Matras. (2002), *Kurdish linguistics: a brief overview*, *Sprachtypol. Univ. Forsch.* Berlin, rr. 3-14.

Jügel, Thomas. (2014), “On the linguistic history of kurdisch”, *Kurdish Studies*, Cild 2, Hej. 2, rr. 123-142.

Makas, Hugo. (1979), *Kurdische Texte im Kurmānĵi – Dialekte Aus Der Gegend Von Mārdīn & Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gäwar; Jezidengebete Apa* - Philo Press /Amsterdam.

Matras, Yaron. (2002), “Kurmanji Complementation: Semantic-typological Aspects In An Areal Perspektive”, in *Sprachtypol Univ. Forsch. (STUF)*, Berlin, h. 55, rr. 49-63.

Matras, Yaron. (1997), “Clause combining, ergativity, and coreferent deletion in Kurmanji”. *Studies in Language* 21, rr. 613–653.

Moreno, Carlos Juan. (1993), *Make and the semantic origins of causativity: a typological study*. In *Causatives And Transitivity*, Editor: B. Comrie & Polinsky, Amstersdam, rr. 155-164.

Noonan, Michael. (1985), “Complementation”, in Shopen, Timothy (Ed.), *Language Typology and Syntactic Description, c. 2., Complex Constructions*. Cambridge University Press, rr. 52-150.

Noonan, Michael. (2007), “Complementation”, *Electronic Publications by Michael Noonan*, Volume 16.

Noorlander, Paul. (2014), “Diversity in Convergence: Kurdish and Aramaic Variation Entagled”, *Kurdish Studies*, Cild 2, Hej. 2, rr. 201-224.

Prym, Eugen & Albert Socin. (1886), *Erzählungen Und Lieder im Dialekte Des Tûr Abdin*, St. Petersburg.

Ritter, Helmut. (1968/1969), *Kurmānĵi-Texte aus dem Tûr'abdîn, I. Kārboran Oriens*, Cild. 21/22, rr. 1-135.

Ritter, Helmut. (1976), *Kurmānĵi-texte aus dem Tûr'abdîn, 2. Yeziden*, Oriens, Cild 25/26, rr. 1-37.

Bi Tirkî

İmer, K., Kocaman, A. û Özsoy, S. (2011). *Dilbilim Sözlüğü*, İstanbul: Baġaziçi Üniversitesi Yayınevi.

Malmîsanij. M. (2015), *Kurmancca Île Karşılaştırmalı Kıramncca (Zazaca) Dilbilgisi*, Weşanxaneyê Vateyî/Vate Yayınevi, İstanbul.

Tan, Altan. (2011), *Turabidin'den Berriyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kültürler, Nûbihar* Yayınları, İstanbul.

Yıldırım, Kadri. (2012), *Kürtçe Dil Bilgisi*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin.

Bi Kurdî

Aydoğan, İbrahim Seydo. (2013), *Guman-1, Demnasî, Hevoksazî, Watesazî û Gotar*, Weşanên Lîs, Ankara.

Bibil, Mikail & Baran, Bahoz. (2008), *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul.

Bibil, Mikail. (2017), *Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêziya Wan Di Devoka Jorîn De*, Teza Doktorayê, Zankoya Zaxoyê, Fakulteya Zanistên Mirovayetî, Pişka Zimanê Kurdî, Zaxo.

Omer Ehmed, Baîz. (2012), *Riste Ji Layê Pêkhatinê ve Di Dayalêkta Serî Ya Zimanê Kurdî Da, Govara Behdînê*. Kovara Zankoya Duhok. Perbenda: 15 jim. 1 (Zanistên Mirovayetî û Komelnasî) (r. 40-53).

Tan, Samî. (2005), *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol.

Bi Kurdî- Projeyên Lisansa Bilind Ya Bêtez

Akbaş, Mehmet Şerif. (2013), *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Akıncı, Enes. (2014), *Bikaranîna Rengêran Di devoka Kerboranê De (Weku Mînak Du çîrokên Herêma Kerboranê)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Altunışık, Elif (2015), *Cihêtyên Kişandina Lêkeran Li Herêma Torê*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Arslan Aydın, Gulçin. (2013), *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Herêma Torê de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Bilgiç, Behiye. (2014), *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tor Abîdîn De, (Wek Mînak Şeşe Çîrokên Herêma Tor Abîdîn)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Bulgan, Bilal. (2013), *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran) Di Devoka Herêma Kercewsê De* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Derin, İpek. (2013), *Frekansê Tîpê Kurdî Devoka Nisêbînê da (Mêrdîn)-Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Güneş, Mehmet Bakır. (2013), *Rêjeya Bikartanîna Dengan Di Devoka Tor Abdîn De* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Kartal, Lokman. (2013), *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tûr Abdîn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêna)*. Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

Kaya, Mahsum.(2013), *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tor Abidîn de*.Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn.

PÊVEK:
FERHENGOK

Kurdî	İngilîzî	Tirkî	Kurdî	İngilîzî	Tirkî
astengkirina serkeftî	successful prevention	başarılı engelleme	lêkerên xwerû	simple verbs	basit fiiller
astengkirina teşebûsî	attempted prevention	girişimsel engelleme	manîpûlasyon	manipulation	manipülasyon
axaftina manîpûlatîf	manipulative speech act	manipüle edici konuşma	manîpûlasyonona serkeftî	successful manipulation	başarılı manipülasyon
bandorgir	patient	etkilenen	manîpûlatîf	manipulative	
berkara nerasterast	indirect object	dolaylı tümleç	manîpuleber	manipulee	manipüle edilen
berkara rasterast	direct object	nesne	manîpuleker	manipulator	manipüle eden
bingihanek	subordinate or	bağlaç	navdêr	noun	isim
biker	subject	özne	navdêrandî	nominalized	adlaştırılmış
bidawîbûn	termination	bitiş	nîv-ergatîfî	split ergativity	yarı özegeçişlilik
biserneketin	failure	başarısızlık	peyvîrî	word order	söz dizimi
datîf	dative	yönelme hali	pêhisîna nerasterast	indirect perception	dolaylı algılama
deontîk	deontic	deontik	pêhisîna rasterast	direct perception	doğrudan algılama
destpêkirin	inception	başlama	pêkhên	constituent	bileşen
devok	accent	şive	pêşeng	antecedent	öncül

domdarî	continuatio n	sürerlilik	pêveber	predicate	yüklem
entegrasyon	integration	bütünleşme	pêvgirêdayî	integration	bütünleşmiş
epistemic	epistemic	epistemik	qertaf	affix	ek
ergative	ergative	özegeçişlilik	qertafa çêker	derivational affix	yapım eki
espektîf	aspective	görünüşsel	referantî	referential	gönderimli
faktîf	factive	faktif	rêzimanî	grammar	dilbilgisi
gire	affix	ek	riste	sentence	tümce
gramatîk	grammatic al	dilbilgisel	risteya aloz	complex clause/sentenc e	bileşik tümce
helwesta modal	modal attitude		risteya sade	simple clause/sentenc e	basit tümce
hev-demî	co- temporalit y	eş- zamanlılık	rolên gramatîk	grammatical roles	dil bilgisel roller
hevoka bend	subordinat e clause	yan cümle	rolên sîmantîk	semantical roles	anlamsal roller
hevoka bingehîn	main clause	ana tümce	sedemiya serkeftî	successful causation	başarılı sebepsellik
hevoka pêwendiyê	relative clause	ilgi yan cümleciği	sîmantîk	semantic	anlam bilgisi
hevoka serbixwe	coordinate clause	bağımsız tümce	subjonktîf	subjunctive	istek kipi
hevoka temamker	compleme nt clause	tümleyen yan cümle	temasa nerasterast	indirect contact	dolaylı temas
hev-referans	co- reference	eşgönderim	temasa rasterast	direct contact	doğrudan temas
împlikatîf	implicative	İmalı	temamkiri n	complementati on	tamamlama
îndîkatîf	indicative	bildirme kipi	teşebus	attempt	teşebbüs

kara	agent	eden	veguhastin a nerasterast	indirect speech	dolaylı anlatım
kausatîfî	causativity	ettirgenlik	veguhastin a rasetast	direct speech	doğrudan anlatım
ketina hev- referantî	co-deletion	eşgönderimli nin silinmesi	xuyang	aspectuality	görünüşsellik
kopula	copula	koşaç	devok	subdialect	ağız
lêker	verb	fiil			
lêkera alîkar	light verb	yardımcı fiil			
lêkerên dariştî	derivational verbs	türemiş fiiller			
lêkerên kêşayî	finite verbs	çekimli fiiller			
lêkerên lêkdayî	compound verbs	birleşik fiiller			
lêkerên manîpûlatîf	manipulative verbs	manipüle edici fiiller			
lêkerên nekêşayî	non-finite verbs	çekimli olmayan fiiller			
lêkerên pêhisînê	perception verbs	algılama fiilleri			
lêkerên pêzanînê	cognition verbs	bilişsel fiiller			
lêkerên netêper	intransitive verbs	geçişsiz fiiller			
lêkerên têper	transitive verbs	geçişli fiiller			
lêkerên vegotinê	utterance verbs	aktarımsal fiiller			

